T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Mehmet YILDIRIMÇAKAR

# KÜRT ANONİM HALK EDEBİYATINDA HEYRANOK VAN YÖRESİ ÖRNEĞİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ - 2017

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Mehmet YILDIRIMÇAKAR

# KÜRT ANONİM HALK EDEBİYATINDA HEYRANOK
# VAN YÖRESİ ÖRNEĞİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ
Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

MUŞ – 2017

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTÛYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Mehmet YILDIRIMÇAKAR

# HEYRANOK DI EDEBIYATA KURDÎ YA GELÊRÎ DE MÎNAKA HERÊMA WANÊ

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ
Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

MÛŞ – 2017

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönergesine göre hazırlamış olduğum "Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînaka Herêma Wanê" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☑ Tezimin …3…..yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

01/02/2017

**Mehmet YILDIRIMÇAKAR**

## TEZ KABUL TUTANAĞI

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ danışmanlığında, Mehmet YILDIRIMÇAKAR tarafından hazırlanan bu çalışma 01../02../2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Başkan** | : | Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK | İmza: ........................... |
| **Jüri Üyesi** | : | Yrd. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN | İmza: ........................... |
| **Jüri Üyesi** | : | Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ | İmza: ........................... |

# NAVEROK

**NAVEROK** ........ **I**

**KURTE** ........ **VI**

**ÖZET** ........ **VII**

**ABSTRACT** ........ **VIII**

**PÊŞGOTIN** ........ **IX**

**KURTEBÊJE** ........ **XIV**

**DESTPÊK** ........ **1**

**BEŞA YEKEM**

**HEYRANOK BI AWAYEKÎ GIŞTÎ**

**1.1. LÎTERATÛRA HEYRANOKAN** ........ 12

**1.2. HEYRANOK; WEKE NAV Û TÊGEH** ........ 14

**2.3. ROLA JINA KURD DI RISTIN Û PARASTINA HEYRANOKAN DE** ........ 21

**BEŞA DUYEM**

**VEKOLÎNA HEYRANOKAN**

**2.1. HEYRANOK JI HÊLA ŞIKL Û CUREYÊ VE** ........ 22

2.1.1. Şiklê Nezmê ........ 23

2.1.1.1. Berma (Paşserwa/Redîf) ........ 23

2.1.1.1.1. Bermaya Pêvekî ........ 23

2.1.1.1.2. Bermaya Bêjeyî ........ 23

2.1.1.1.3. Bermaya Pêşrêzî ........ 23

2.1.1.2. Vekêş (Qafiye/Serwa) ........ 24

2.1.1.2.1. Revî ........ 25

2.1.1.2.2. Vekêşa Bingehîn ........ 25

2.1.1.2.3. Vekêşa Yekdengî ........ 26

2.1.1.2.4. Vekêşa Dudengî ........ 26

2.1.1.2.5. Vekêşa Pirrdengî ........ 26

2.1.1.3. Ristina Vekêşê ........ 27

2.1.1.3.1. Vekêşa Tekûz ... 27
2.1.1.3.2. Vekêşa Çeperast ... 28
2.1.1.4. Qeware (Hecm) ... 28
2.1.1.5. Yekeya Nezmê ... 30
2.1.1.5.1. Sêriste ... 30
2.1.1.5.2. Çarriste ... 30
2.1.1.5.3. Pêncriste ... 30
2.1.1.5.4. Şeşriste ... 31
2.1.1.5.5. Heftriste ... 31
2.1.1.5.6. Heştriste ... 31
2.1.1.5.7. Nehriste ... 31
2.1.1.5.8. Sîwyekriste ... 32
2.1.1.6. Kêş ... 33
2.1.2. Cureyê Nezmê ... 35
2.1.2.1. Mijar (Babet) ... 35
2.1.2.2. Newa (Awaz/Melodî) ... 35
2.1.2.3. Fonksiyon (Peywir/Erk) ... 35
**2.2. HEYRANOK JI HÊLA ZIMAN Û ŞÊWAZÊ VE** ... 36
**2.3. HEYRANOK JI HÊLA NAVEROKÊ VE** ... 40
2.3.1. Mezmûnên Evîndariyê ... 40
2.3.1.1. Ramûsan ... 40
2.3.1.2. Gilî û Gazind ... 41
2.3.1.3. Revandin ... 42
2.3.1.4. Zewaca Bêdil ... 42
2.3.1.5 Evîna Bêsînor ... 43
2.3.1.6. Evîna Bêencam ... 43
2.3.1.7. Mêvaniya Heyran ... 44
2.3.1.8. Evîna Veşarî ... 44
2.3.1.9. Soza Evîndaran ... 44
2.3.1.10. Xwerageriya Keçê ... 45
2.3.1.11. Bîranînên Evîndaran ... 46

2.3.1.12. Xatirxwestina Evîndaran ........ 46
2.3.1.13.Evîna Qedexe ........ 47
2.3.1.14. Astengî ........ 47
2.3.1.15. Nexweşiya Yarê ........ 48
2.3.2. Zewac ........ 48
2.3.2.1. Hewî ........ 48
2.3.2.2. Berdêlî ........ 49
2.3.2.3. Qelen ........ 49
2.3.2.4. Şeva Xwazgîniyê ........ 50
2.3.2.5. Çarenûs ........ 50
2.3.3. Tema ........ 50
2.3.3.1. Xerîbî ........ 50
2.3.3.2. Mirin ........ 51
2.3.4. Sembol ........ 52
2.3.4.1. Çûna Leşkeriyê ........ 52
2.3.4.2. Tirên ........ 52
2.3.4.3. Xwesî ........ 53
2.3.4.5. Bekotî ........ 54
2.3.4.6. Çûna ser Kaniyê ........ 54
2.3.5. Motîf ........ 55
2.3.5.1. Cilûbergên Berê ........ 55
2.3.5.2. Xizêm ........ 55
2.3.5.3. Motîfên Kevnare ........ 56
2.2.5.4. Hesp ........ 56
2.3.5.5.Şivan ........ 57
2.3.5.6. Pale ........ 57
2.3.5.7. Qemer ........ 57
2.3.6. Hin Nigaşên Din ........ 58
2.3.6.1. Nifir ........ 58
2.3.6.2. Siruşt ........ 58
2.3.6.3. Bûyerên Dîrokî ........ 59
2.3.6.4. 'Erdnîgarî ........ 59

2.3.6.5. Xwezî ........ 60
2.3.6.6. Erotîzm ........ 60
2.3.6.7. Flora ........ 61
2.3.6.8. Faûna ........ 61
2.3.6.9. Çînên Civakê ........ 62
2.3.6.10. Navên Şexsan ........ 62
2.3.6.11. Dijûn ........ 63
2.3.6.12. Sond ........ 63
2.3.6.13. Pesin ........ 63
2.3.6.14. 'Edetên Xirab ........ 64
**2.4. HEYRANOK JI HÊLA HUNERÊN EDEBÎ VE** ........ 64
2.4.1. Hunerên Edebî ........ 65
2.4.1.1. Manendin (Teşbîh) ........ 65
2.4.1.2. Îstî'are ........ 66
2.4.1.3. Kînaye ........ 67
2.4.1.4. Kesandin û Axivandin (Teşxîs û Întaq) ........ 68
2.4.1.5. Tenasub ........ 69
2.4.1.6. Bibîranîn (Telmîh) ........ 70
2.4.1.7. Leff û Neşr ........ 71
2.4.1.8. Mibalexe ........ 71
2.4.1.9. Dijayetî (Tezat) ........ 72
2.4.1.10. Dubare (Tekrîr) ........ 73
2.4.1.11. Îrsalê Mesel ........ 74
2.4.1.12. Cînas ........ 75
2.4.1.13. Alîterasyon ........ 75
2.4.1.14. Sec' ........ 76
**2.5. HEYRANOK JI HÊLA VARYANTÊ VE** ........ 76
**ENCAM** ........ 80
**ÇAVKANÎ** ........ 85
**PÊVEK 1** ........ 89

**PÊVEK 2** ........ **115**

**FERHENGOK** ........ **116**

**KURTEJIYAN** ........ **120**

**ÖZGEÇMİŞ** ........ **121**

**KURTE**

**TEZA MASTIRÊ**

**HEYRANOK DI EDEBIYATA KURDÎ YA GELÊRÎ DE**

**MÎNAKA HERÊMA WANÊ**

**YILDIRIMÇAKAR, Mehmet**

**Şêwirmend: Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**2017, 121 Rûpel**

Xebata me dê li ser heyranokan hûr bibe. Em ê di destpêkê de bi kurtî qala çand û cureyên çandê; folklor û geşedana folklore; edebiyata gelêrî, helbesta gelêrî bikin û cureyên helbesta gelêrî rêz bikin. Paşê em ê di beşa yekem de pênaseya heyranokê û qala xebatên ku li ser heyranokan hatine kirin bikin. Piştî vê, di ristin û parastina heyranokan de rola jina kurd dê bê niqaş kirin. Di beşa duyem de, di pênc binbeşên berfireh de, heyranok dê di çarçoveyeke zanistî de bêne vekolîn. Li gorî rê û rêbazên zanista çand, folklor û edebiyatê dê ji hêla şikl û cureyê ve; ji hêla naverok, ziman û şêwazê ve; ji hêla hunerên edebî û varyantê ve bê analîzkirin. Di pêvekê de jî em dê cih bidin heyranokên li qadê hatine berhevkirin. Û di dawiyê de jî em dê ferhengokekî pêşkêş bikin.

**Peyvên Sereke:** Folklor, Helbesta Kurdi ya Gelêrî, Heyranok, Şikl û Cure, Evîn.

**ÖZET**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**KÜRT ANONİM HALK EDEBIYATINDA HEYRANOK**

**VAN YÖRESİ ÖRNEĞİ**

**Mehmet YILDIRIMÇAKAR**

**Tez Danışmanı: Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**2017, 121 Sayfa**

Bu çalışmamızda Kürt anonim halk ebebiyatı nazım türlerinden biri olan heyranoklar üzerinde durulacaktır. Girişte kısaca kültür ve çeşitleri, halk bilimi ve halk biliminin tarihi gelişimi; halk edebiyatı, halk şiirinden bahsedilecek ve Kürt anonim halk şiiri türleri sıralanacak. Birinci bölümde heyranokun tanımı yapılıp, heyranoklar üzerine yapılan çalışmalardan bahsedilecek. Sonra, heyranokların icrasında ve günümüze ulaşmasında Kürt kadının rolü değerlendirilecek. İkinci bölümde heyranoklar bilimsel bir çerçevede mercek altına alınacak. Kültür, folklor ve edebiyat bilimlerinin yöntemleriyle tür ve şekil yönünden; içerik, dil ve üslub yönünden; edebi sanatlar ve varyant yönünden incelenip analiz edilecek. Ekte ise sahada toplanan heyranoklara yer verilecek. Ayrıca tezin son kısmında sözlükçe verilecek.

**Anahtar Kelimeler:** Folklor, Kürt Anonim Halk Şiiri, Heyranok, Tür ve Şekil, Aşk.

# ABSTRACT

**MASTER'S THESİS**

**HEYRANOK IN THE KURDISH ANONYM FOLK LITERATURE**

**VAN REGION EXAMPLE**

**Mehmet YILDIRIMÇAKAR**

**Advisor: Asst. Prof. Canser KARDAŞ**

**2017, Pages: 121**

This thesis is concerned with the 'heyranok', a genre of folk literature verse. In the introduction, culture and its variants, folklore, folk literature and folk poetry will be discussed; and following this, examples of Kurdish anonym folk poetry will be sorted. Subsequently, in the first part of the thesis, a definition of a heyranok will be given and other studies on heyranoks will be mentioned. Then, the role of Kurdish women in the creation and the development of heyranoks will be evaluated. In the second part, heyranoks will be analysed from a scientific perspective. Culture, folklore and literature, in their various genres and forms, will be analyzed in terms of content, language and style, and in terms of the literary arts and their variants. In the appendix, the heyranoks collected from the field work can be found. A glossary can also be found here.



**Key Words:** Folklore, Kurdish Anonym Folk Poetry, Heyranoks, Genre and Form, Love.

# PÊŞGOTIN

Folklor, zanista gel e. Edebiyata gelêrî jî binbeşeke folklorê ye. Berhemên edebiyata gelêrî di nava jiyana rojane de, bi awayekî devkî, têne ristin û ji nifşan derbasî nifşan dibin. Ji bo ev berhem ji bab û kalan veguhêzin bo neviyan û wenda nebin, divê bêne berhevkirin, tomarkirin, senifandin û nivîsîn. Pêşveçûna teknolojî û çanda bajarvaniyê hêdî hêdî bûye sedema jiholêrabûna çand, kevneşop, 'urfû 'edetên berê. Nifşên nû ji çanda babûkalên xwe bêpar mane. Bi tenê kesên temenê wan mezin, çand û folklora xwe baş dizanin û bi çand û folklora xwe dijîn. Mixabin bi mirina van kesan re ev zanîna wan, çand û kultura wan jî bi wan re binax dibe, dimire.

Folklora miletekî rasterast nasnameya wî miletî ye. Ziman bi dewlemendiya berhemên folklorî zindî dimîne, dikare xwe ji zimanên serdest diparêze. Mirina keresteyên folklorî di heman demê de mirina zimanî ye jî. Ji bo zimanê kurdî xwe biparêze, rû bide, divê keresteyên folklorîk di bin roniya rê û rêbazên zanista çand, folklor û edebiyatê de,bi awayekî akademîk bêne berhevkirin, tomarkirin, tesnîf kirin, nivîsîn û li ser van keresteyan vekolînên akademîk bêne kirin. Ev yek ne bitenê lazim e, ev yek elzem e.

Li ser helbesta kurdî ya gelêrî kirina xebateke zanistî gelek girîng e. Xebata me bi zaravayê kurmancî ye. Li ser heyranokên Herêma Wanê hatiye rawestin.

Armanca xebata me ya bi navê "Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînaka Herêma Wanê" ev e ku em heyranokan bi gelek hêlan ve veçirin,ferq û hevpariya wê ya ji cureyên helbesta gelêrî diyar bikin. Taybetiyên teşeyî û ruxsarî yên xweser destnîşan bikin. Di çarçoveya rê û rêbazên zanista çand, folklor û edebiyatê de pêşkêş bikin û bidin nasîn.

Ev xebata ku bi awayekî zanistî li ser heyranokan hûr dibe, heyranokên li herêma Wanê,ji cih û kesên curbicur hatiye berhevkirin navxweyî dike, dê heyranokan ji gelek hêlan ve bide nasîn, dê ji hêla şikl û cure, ziman û şêwaz, naverok, hunerên edebî û varyantê ve hûr lê binêre. Dê şilk û cureyê heyranokê diyar bike. Baweriya me ev e ku xebata me dê di vê qadê de bibe xebateke serkeftî, kêmasiyan tekûz bike, ji bo xwendekar û mamosteyên ziman, edebiyat û çanda kurdî bibe arîkar, rêyekê li wan veke. Û hêviya me ev e ku ev xebat nêrîneke nû pêşkêşî cemîeya akademiyê bike. Me hewl daye ku em valahiya di vî warî de tije bikin.

Me dema xebata xwe kir, me serî li metolojiyên şaxê zanistên cuda da. Em li gor rê û rêbazên zanista çand, folklor û edebiyatê tev geriyan. Ji ber ku heyranok berhemên helbesta gelêrî ne û ji dorhêla çanda devkî de dizên û diperisin, me çand, çanda devkî, nivîskî û elektronîk, edebiyata gelêrî û helbesta gelêrî da nasîn, em li ser teoriyên wan sekinîn. Me di binbaşa cureyên helbesta gelêrî de qedera bîst û neh cure destnîşan kirin û rêz kirin.

Wekî tê zanîn meseleya şikl û cure mijareke gelek girîng û zehmet e. Me berê diyarkirina şikl û cureyê heyranokê û taybetiyên wê yên xweser, hemû pênaseyên di derbarê heyranokan de hatine kirin libo libo rêz kirin û nirxandin. Piştî vê me bi hêla şikl û cureyê ve vekola, cudahî û hevpariyên wê yên teşeyî û ruxsarî destnîşan kir.

Heyranok bi tenê di edebiyata kurdî ya gelêrî de heye, mînakên wê di zimanên din de tuneye, dema em xebitîn di destê me de tu xebatên ku em wekî pêşnûma hilgirin tunebûn, me gelek zehmetî kêşan. Heta niha ne bitenê li ser heyranokan, li ser cureyên edebiyata gelêrî nemaze cureyên helbesta gelêrî ji hêla şikl û cure ve zêde xebat nehatiye kirin. Lê me ji xebatên li ser helbesta gelêrî ya tirkî, wergerên ji zimanên biyanî bo tirkî û kurdî hatine kirin û xebatên ingilizî îstîfade kirin. Me li Herêma Wanê, li qadên cuda û ji kesên cuda, rûbirû heyranok berhev kirin, derbasî ser kaxizê kirin. Ji bilî van heyranokên li qadê hatine berhevkirin, me ji gelek pirtûkên li ser heyranokan jî îstîfade kirin. Dîsa me ji tez û gotarên ku mijara heyranokan tê de derbas dibin jî gelek îstîfade kirin. Hema bêje li gorî lêgerîna lîteratûrê çi xebata ku têkiliya wê bi heyranokan re heye, me lê nêrî.

Li gorî xalên me li jor diyarkirî, çarçoveya giştî ya teza me wuha ye:

1. Me lêgerîneke lîteratûrî li ser heyranokan kir û pirraniya xebatên li ser heyranokan hatine kirin dest nîşan kirin û dane nasîn.

2. Me heyranok bi gelek hêlan ve da nasîn, pênaseyeke nû ya heyranokê kir.

3. Me rola jina kurd a di ristin û parastina heyranokan de diyar kir.

4. Me heyranok ji hêla teşeyî û ruxsarî ve vekola, unsûrên heyranokan yên derveyî û navxweyîdestnîşan kirin.

5. Me ji hêla naverok, ziman û şêwazê ve heyranok bi gelek hêlan ve analîz kirin.

6. Mi hunerên edebî yên di nav ristên heyranokan de derbas dibin libo libo diyar kirin.

7. Me gelek varyantên heyranokan tespît kirin û libo libo nirxandin.

8. Me, heyranokên ku li Herêma Wanê me berhevkiribû veke pêvek danî pişt tezê.

9. Me ji bo peyvên herêmî yên di heyranokên me berhevkirî de bêne fêmkirin, ferhengokek amade kir.

Di xebata me ya bi navê "Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînaka Herêma Wanê" de danasîn û vekolîna heyranokan du xîmên bingehîn in. Beşên vê xabatê jî li gorî vê nêrînê hatiye dabeşkirin.

Me di beşa yekem de li ser xebatên heyranokan lêgerîneke lîteratûrî kir. Hema bêje pirraniya xebatên ku li ser heyranokan hatine kirin, yên di nav de mijara heyranokan derbas dibe, destnîşan kirin û bi dest xistin. Me pênasên heta niha li ser heyranokan hatine kirin libo libo rêz kirin û nirxandin. Me navên cuda yên heyranokan pêşkêş kirin û pênaseyeke nû bo heyranokan da. Me di binbeşa dawîn a beşa yekem de qala rola jina kurd a di ristin û parastina heyranokan de kir.

Me navê vekolîna heyranokan ji beşa duyem kir. Mi di pênc binbeşan de bi hûrgilî vekola. Di binbeşa yekem de me ji hêla şilk û cureyê ve heyranok vekolan, ji hêla ristina vekêşê, kêş, qeware û yekeya nezmê; mijar, newa û fonksiyonê ve heyranok bi hûrgilî analîz kirin. Di binbeşa duyem de ji hêla ziman û şêwazê ve heyranok hatine nirxandin. Di binbeşa sêyem de ji hêla naverokê ve heyranok yeko yeko vekolan û bi mînakan piştrast kirin. Me di binbeşa çarem de di heyranokan de hunerên edebî tespît kirin û bi mînakan mijar dewlemend kir. Û di binbeşa dawîn de me cih da varyantên heyranokan.

Di encamê de; li ser nûve û peydên destxistî nirxandinek kir, ji bo keresteyên folklora kurdan bêne berhevkirin û li ser wan analîzên zanistî bêne kirin me pêşniyarên xwe kirin.

Çavkaniyên xebata me du cure ne. Ya yekem ji 121 heb heyranokan pêk tê. Me ev heyranok ji herêma Wanê berhev kirin. Ev çavkaniya me hema bêje heyranokên ji hemû deverên Wanê(Qelqelî, Miks, Bêgirî, Şax, Payîzava, Xoşeb) hatine berhevkirin navxweyî dike. Ya duyem jî sê pirtûkên berhevkariya heyranokan in. Pirtûka yekem ya Rêkêş Amîdî ya bi nave *Heyranokêt Kurdî*, pirtûka duyem ya Abdulkerîm Surûş a bi nave *Gilî û Gazindên Evîndaran* û ya sêyem jî pirtûka Xalid Sadînî ya bi nave

*Heyranokên Kurmancî* ye. Me piraniya mînak ji heyranokên me li qadê berhevirî dan lê cî bi cî me ji van hersê kitêban jî îstifa de kir.

Ji bo xebata me baş bê fêmkirin çend xal hene ku divê li vir bêne gotin:Me çend ciyan de peyva heyranokbêj bi kar aniye. Ji bo xelet neyê fêmkirin divê em mijarê ronî bikin. Me ev peyv bo ew kesê ku heyranok ristiye, honandiye, gotiye 'emiland. Ev peyv ne weke peyva dengbêj xwediyê wateyeke serbixwe ye. Ji bo yên heyranokan dibêjin heyranokbêj nayê gotin. Navê xwe yî xweser tune ye.

Me di xebata xwe de şûna "wezn û qafiyeyê" têgeha "kêş û vekêş" bi kar anî. Ji şûna "qafiye/serwayê" têgeha "vekêş", ji şûna "paşserwa/redîfê" têgeha "berma", ji şûna "misre/rêz/rêzikê",peyva "riste", ji bo yekeyên nezmê yên sêriste, çarriste, pêncriste û pêvetir têgeha "bend" û ji bo yekeyên duriste têgeha "malik" bi kar anî. Dîsa me navê termên hunerên edebî, çiqas li destê me hat, bi kurdiya wan jî da.

Me dema deşîfrasyona/veguhêziya dengan a li ser kaxizê kir, çiqas li destê me hat, me devoka herêmên ku me heyranok jê berhevkiribûn,parast. Me peyv û gotinên herêman çawa hatibine gotin, rasterast, bêyî giherîn nivîsîn. Weke mînak; daçekên "de "û " re" me bi awayê wan yên herêmî weke "da "û " ra"dan. Dîsa peyvên pirjimar yên weke "çavan", "dilan", "gulan" û hwd. ji ber ku "n"ya dawiyê li gorî devoka herêmê dikeve, me weke "çava", "dila", "gula" dan. Dîsa peyva "bila" li herêmê weke "bira" tê bikaranîn me di vê formê de dan. Dîsa li gorî devokê pêvdenk nayêne bikaranîn. Peyvên weke; "xwesî", "xwe", "Xwedê" û hwd.; weke "xasî", "xu", "Xudê" hatin nivîsîn. Dîsa di peyvên weke "çav", "behr", "mar" û "balgî" de "e ya'eynî" heye. Me weke; "çe'v", "be'r", "me'r", "be'lgî" nivîsîn.

Wekî tê zanîn herfa "r" di zimanê kurdî de bi du dengan heye. Me di pêvekê de "r" ya xurt bi du "r"yan weke "rr" dan. Weke mînak; "kurr", "kerr", "birr" û hwd. Dîsa di gelek cihan de peyvên ji zimanê 'erebî derbasî zimanê kurdî bûne de, me 'eyn a erebî weke "'"nîşan dan. Weke mînak: "'ereb", "di'a", "Qur'an", "'ewr" û hwd. Me herfa "î" ya li pêşiya herfa "y" yê tê, ne di forma herfa "i" yê de, rasterast wekî xwe "î" nivîsîn. Weke mînak: "çîya", "dîya", "kanîya" û hwd.

Me li gorî devokê gelek caran "û" ya di navbera du bêjeyên rêzkirî de weke "w" û caran jî weke " I " da. Weke mînak: "dê*û*bav" bû "dê*w*bav" û "gul*û*sosin", "dar*û*ber" bûne "gul*i* sosin" û "dar*I* ber". Û di gelek cihan de herfa " i " ket û me bi "dabirê" nîşan

da. Weke mînak; “li”, “bi”, “ji” bûne“'l”, “'b”, “'j” û hwd. Me nav metnê de hejmara heyranokan li gorî rêza wan a pêvekê, beriya heyranokan da. Me di nav metnê de cihê ku me xwestibe em balê bikêşine ser, me bi awayekî îtalîk û reşkirî dan.

Di vê xebatê de gelek dost û hevalan pişgirî dane min, ji min re bûne arîkar. Ez dixwazim libo libo spasiyên xwe pêşkêşî cenabê wan bikim. Di serî de ez spasî ji malbata xwe, nemaze xwîşka xwe Qibrîsê dikim, min gelek heyranok jê girtin. Di deşîfrasyona heyranokên pirtûka Rêkêş Amîdî de, hevalê min birêz Sabir Ebdollahizad gelek arîkariya min kir. Hevalên min Xweşmêr, Argun Çakır, Yakup Aykaç û Ziyaddin Yıldırımçakar ji hêla moral û motîvasyonê ve gelek arîkariya min kirin. Kekê Zafer Açar di sererastkirina tezê de û hevalê min Ferhat Alkan ji hêla teknîkî ve gelek arîkariya min kirin. Ez spasiyên xwe ji wan dikim. Rêvebirê teza min û şêwirmendê min mamosteyê hêja Canser Kardaş di pêvajoya tezê de gelek ked xerc kir. Ez ji dil û can spasiyên xwe pêşkêşî cenabê wî dikim.

**Mûş – 2017** **Mehmet YILDIRIMÇAKAR**

**KURTEBÊJE**

| | | |
|---|---|---|
| amd. | : | Amadekar |
| b. | : | Berg |
| b.n. | : | Berhema Navborî |
| b.n.r. | : | Binêre |
| C. | : | Cild |
| Ç. | : | Çap |
| d.n. | : | Dîroka Nediyar |
| h.b. | : | Heman Berhem |
| h.g. | : | Heman Gotar |
| hwd. | : | Her Wekî Din |
| j. | : | Jimare |
| k.ç. | : | Kesê Çavkanî |
| n.d. | : | Nediyar |
| nql. | : | Neqil |
| r. | : | Rûpel |
| S. | : | Sal |
| vgz. | : | Veguhêzer |
| wer. | : | Wergêr |
| weş. | : | Weşanxane |
| y.d. | : | Yên Din |

# DESTPÊK

## Çand

Ji ber ku mirov hêmanên biyolojîk û psîkolojîk in; pêdiviyên mirovan bi biyolojîkbûn û psîkolojîkbûna mirovan re têkilîdar in. Ev pêdiviyên mirovan gelek tiştan diafirînin û şêweyekê didine gelek tiştan. Mirov gelek tiştan fêr dibin, berhevokên daring/maddî û arîşen/manewî ava dikin. Nirxên mirovan, arasteyên wan, dinêyên hest û fikrên wan, tevgerên wan ên civakî; teknolojî û hunerên wan hene. Çand van tiştan hemûyan îfade dike. Çand ne irsî ye, mirov di nava kîjan civakê de bêne dinê, di nava wê de dijîn, mezin dibin û çanda wê civakê fêr dibin. Çanda ku kes di nav de mezin dibe, ew kes wê çandê dipejirîne, ew çand dibe çanda wî ya neteweyî. Çand ji hêmanên ku ji nifşan bo nifşan têne veguhêzîn û berhevkirin pêk tê. Ji ber vê yekê ye mirov ji giyandarên din cuda dibe. Loma ye mirov zanyariyên xwe ji hêla zimên fêrî zarokên xwe û kesên din dike (Çobanoğlu, 2012: 3).

Di akademiyê de gelek têgeh hene ku zanyaran li ser pênaseya wan li hev nekirine. Yek ji wan têgehan jî çand e. Di zimanê latînî de "cultura" tê wateya çandina axê encax wateya xwe ya eslî wenda kiriye û bi wateyên cuda derbasî zimanên rojavayî bûye. Ji ber ku hin tişt hene ku ji bo civakekê gelek girîng in û ji bo civakeke din hewqas na, loma her civakê çand li gorî xwe pênase kiriye. Her netewe taybetiyên xwe yên eslî di nav pênaseya çandê de cuda cuda îfade dike û loma çand ji bo her neteweyê xwedî wesfeke neteweyî ye. Dîsa gelek pênaseyên çandê yên îdeolojîk jî hatine kirin (Kardaş, 2013: 1).

Immmanuel Wallerstein çand bi hêleke din daye nasîn. Li gorî Wallerstein çand, qada şer a dinêya nûjen e. Civat ji bo xwe ji civatên din veqetînin, çandê bi kar tînin (1993: 256).

Çanda neteweyekî ji hêmanên weke ol, ziman, wêje, huner, kevneşopî, 'urf, 'edet, tore, perwerdehî, fikr û tevgerê pêk tê. Ev nirx neteweyekî ji neteweyekî din cuda dikin û hesta neteweyî qewî dikin. Ev hêman terza jiyana neteweyekî diyar dikin. Hemû berhevokên daringî û arîşen yên civakê yên ku ji sedan hetta ji hezaran salan pê ve ye çêbûye, weke çanda civakê tê zanîn.

Dursun Yıldırım çandê weke hêmaneke neteweyî pênase dike. Li gorî Yıldırım tevahiya hemû bizavên daringî û arîşen e ku ew nasnameya neteweyî ava dikin (1998: 38).

Dîsa li gorî Bozkurt Güvenç çand, sehîtiyeke girêcan/kompleks e. Ev kompleksa ji hemû tiştên daringî û arîşen pêk tê. Mirov bi kirin û jiyanê hîn dibe, vediguhêze, fêr dike (2012: 15).

Çand di çarçoveya guherîna civakî de xwediyê wateyên curbicur e. Li gorî van wateyan jî pênaseyên çandê yên cuda hene. Wekî ku di pênaseyên jorîn de jî tê xuyan'urf,'edet, ol, exlaq, jiyana rojane û huner nirxên çandê yên hevpar in û di vê yekê de gotina kesên ku pênaseya çandê kirine yek in. Vekolînên li ser çandê pirrdisiplîner in. Çand; dikeve nav qada zanistên civakî yên weke civaknasî, antropolojî, dîroknasî, edebiyat/wêje û folklorê. Ji ber vê yekê jî vekolînên li ser çandê pirralî ne. Nirxên ku civatan ava dikin yekpare ne, ji hevdu nayên cuda kirin. Hêmanên weke bawerî, bîrdozî, biryargirtin, ragihandin, ji çandê cuda nabin û mirov nikare wana ji çandê cuda bifikire (Kardaş, 2013: 2).

Çand, navê hemû tiştan e ku ji destpêkê heta niha ji hêla mirovan ve hatiye afirandin. Bi kurtî, çand ji aliyê civakî û çandî ve xweîfadekirina civakekê ye. Terza jiyana civakê ye ku hemû pêdiviyên xwe yên daringî û arîşen temîn dike. Dibe ku ev îfadekirin ji tevger, tore,'urf û kevneşopiyan, heya tirsên wan, xwediyê şêweyên curbicur bin. Dîsa huner, avahîsazî, fikr û raman, edebiyat û estetîk jî di nav çandê de ne.

**Çanda Devkî**

Mirov cara yekem di serdema elektronîk de pê hisiyane ku di navbera çanda devkî û nivîskî de cudahiyek heye. Piştî destnîşankirina çend cudahiyên di navbera metbe'e û amûrên elektronîk de heyî,têgihîştine ku cudahiyeke bi vî şiklî di navbera gotin û nivîsê de jî heye. Walter J. Ong, ji bo çanda devkî ji çanda elektronîk cuda bike têgehên "yekem çanda devkî" û "duyem çanda devkî" bi kar tîne. Yekem çanda devkî, çanda civakên ku qet nivîs nasnekirine ye. Ev civak bi tenê bi devkî difikirin, diaxivin, bi bîr tînin, û tiştên dizanin encax ji hêla gotinê vediguhêzin. Çanda nivîskî, çanda wan kesan e ku nivîsê nas dikin, nivîsê naxweyî dikin. Hiş û mêjiyê wan bi nivîsê dikare tev bigere û bibîrbîne (2013: 15).

Dorhêla ku her cure agahî bi ceribandinan têne destketin, her cure agahî ji hêla berhemên devkî têne parastin, sazkirin û dîsa ji hêla van berhemên devkî derbasî nivşên nû dibin, bi kurtî dorhêla ku agahî di berhemên devkî de têne arşîvkirin weke dorhêla çanda devkî tê binavkirin. Mirov di dorhêla çanda devkî de mirov bêyî teknolojiyên weke nivîs, metbe'e û elektronîkê, rûbirû û ji hêla dengan ve têkiliyê çêdike (Çobanoğlu, 2003: 56).

Çanda devkî ji hêla vegotinê ji nifşên berê derbasî nifşên nû dibe. Vegotin gerdûnî ye. Vegotin, dem, sînor û bendavan bi awayekî birraz/bisirr derbas dibe û digihêje hemû derên dinê (Uzun, 2009: 26).

Li gorî Gonca Gökalp Alpaslan taybetiyên çanda devkî ev in: Çanda devkî perçeyekî rîtuelê ye, ji wê dizê. Berî çanda nivîskî, çanda devkî derketiyê meydanê. Çanda devkî siruştî ye, bi devkî ye, nivîskarê wê tuneye loma jî gelêrî ye. Di çanda devkî de metn tuneye, bi devkî ji kesan derbasî kesan dibe, pişta xwe daye jiberkirina devkî. Dikare biguhere, ciyawaz be, herdem diherike. Çanda devkî pala xwe daye hişê civakî. Di çanda devkî de du tiştên sereke hene; yê dibêje û yê guhdar dike û di navbera van de ragihandineke zindî û xurt heye. Mîmesîs[1], esas e û ev tişt hezzê diafirîne. Kolektîf e; ne kesane ye. Ji bo rexneyê û an jî armanceke din mirov nikare hilde serî, girêdayî deng e û zimanê bedenê jî bi deng re dibe arîkar. Civakî ye; kesan, kêmtir ji civakê dûr dixe, zêdetir, bi dinêya derve re rûbirû dike. Di çanda devkî de qalib hene, dubare û rîtm/aheng esas in. Girêdayî rewşeke şênber e. Tê de tehlîl û hûrlênêrîn tune ye (2002: 15).

Mirovan bi hezaran salan zanînên xwe sirf bi dengan veguhastine. Zanist, agahî û têgeh bi devkî belav bûne. Di çanda devkî de, ango di çanda ku tê de nivîs tuneye de, pelikên/belgeyên mirovan tune ne. Bi tenê hişê mirovan hene. Ji ber vê yekê ye ku zanîna mirovî bi tiştên ku tê bîra wî, sinorkirî ye. Loma jî di çanda devkî de têkiliya mirovî ya bi peyvan re, ji dîtinê bêtir, bi guhdarkirinê re ye. Di nav hêmanên hîsî de herî zêde guhê xwe bi kar tîne û guh ji yên din girîngtir e.

---

[1] Mîmesîs: Ger kesek berhemeke edebî guhdar bike, pişt re ji hêla hest û hîsê ve bi bûyer û qehreman re xwe bike yek, ev dibe mîmesîs.

**Çanda Nivîskî**

Di navbera çanda devkî û çanda nivîskî de cudahiyên kûr hene. Çanda devkî bandoreke mezin daye ser çanda nivîskî. Ong serdema elektronîk a em tê de dijîn wek "duyem serdema çanda devkî"qebûl dike (2013: 15).

Dorhêla çanda devkî, di domana serdemên dorhêlên çanda devkî de bi îcadkirina nivîsê re derketiye holê. Derbirina keresteyên ragihandinê ji hêla hin sembolên denglêbarkirî û nivîsîna keresteyên ragihandinê yên li ser papirûs, çerm, kevir û kaxizê çêbûye (Koçak, 2005: 277).

Nivîs, nikare şûna ragihandina devkî bigire.Nivîs bitenê, rêyeke cuda ya ragihandinê ye. Bitenê di hin rewşan de, nivîs, şûna ragihandina devkî digire, lê, di vê rewşê de jî rêyên nû keşf dike. Em dikarin vê tiştê ji bo medyaya elektronîkî a nû jî bibêjin.Medyaya elektronîkî bitenê di hinek rewşên diyar de dikare şûna ragihandina devkî û nivîskî bigire. Çawa ku nivîs girêdayî bikaranîna zimanî ya devkî ye, medyaya elektronîk jî her car girêdayî van tiştan e. Bi pêşveçûna berhemên çanda nivîskî dorhêla çanda devkî xilas nebûye, dorhêla çanda devkî û nivîskî bi hev re jiyaye. Çanda nivîskî piştî çanda devkî zaye û çandeke siruştî nîne, çandeke mekanîk e ango çêkirî ye. Nivîs bihîstinê, dîtinê diguherîne û terza têgihiştina kesî vediguhêze têgihiştina metnekê (Ellul, 1998: 65).

Ragihandina devkî ya civakên ku tê de nivîs heye, ji yên ku tê de nivîs qet tune ye cudatir e. Di civakên ku têde qet nivîs tuneye de, kevneşopiya devkî, bêgav e hemû giraniya guhêstinên çandî bar bike. Lê di civakên xwedî nivîs û xwendin de rewş ne wisa ye. Kevneşopiya devkî, bûye perçeyek ji tûneke nivîskî. Ev tûna nivîskî ji şêweyên lêkerên xwedî qalib pêk tê (Goody, 2011: 128).

Berhemên bi nivîsê hatine afirandin girêdayî hişekî tekakesî ne. Metn sabît e û naguhere; xwîner jî her dem diguhêrin. Di bikaranîn û pejirandina çanda nivîskî de pêngavên ciyawaz hene. Ev berê, wekî; destxet, nivîsên ser keviran û metbe'eyê ketine nav jiyana civakê (Kardaş, 2013: 9).

Li gorî Alpaslan taybetiyên çanda nivîskî ev in: Çanda nivîskî piştî çanda devkî zaye. Çêbuwar e ango nivîs teknolojiyek e. Nivîskî ye, nivîskarê berheman diyar e. Girêdayî metnê ye û ji hêla nivîsê tê veguhastin. Xwînerê wê biguhere jî nivîskar naguhere. Pala xwe daye hişekî tekakesî. Di çanda nivîskî de jî du tiştên sereke hene; yê

dinivîse û yê dixwîne.Di navbera van de ragihandineke sazkirî heye. Mîmesîs tune ye. Ne kolektîf/hevpar e, kesane ye. Ji bo rexneyê an jî, ji bo armanceke din mirov kengê bixwaze dikare hilde serî. Dîtin derdikeve pêş. Kesan dixe rewşeke ferdî, ji civakê dûr dixe, navxweyî ye. Berê kesan dide dinêya wan a hundirîn. Qalibên wê tune ne, çiyawaz û sist e. Girêdayî rewşeke razber e. Tê de tehlîl û hûrlênêrîn heye (2002: 17).

### Çanda Elektronîkî

Serdema em tê de dijîn serdema elektronîkîye. Jiyana mirovan li gorî pêşketina vê teknolojiyê didome. Însan li gorî rewşa teknolojiyê terza jiyana xwe kifş dikin. Bivê nevê xwe di nav vê dinyayê de dibînin, nikarin xwe derveyî vê teknolojiyê bihêlin. Çanda mirovî jî bi guherîna dem û teknolojiyê re diguhere. Ragihandin, medya, fêrbûn, rêwîtî, çandinî û hema bêje her tiştê mirovan rojbiroj diguherin. Ji ber elektrîk û alavên bi elektrîkê dixebitin em vê serdemê re dibêjin serdema elektronîkî.

Li Tirkiyê çanda elektronîkî di salên 1900î bi gramafonê dest pê kiriye, piştî sala 1912an bi plakên kevin dewam kiriye û piştî salên 1940î radyo ketiye nava jiyana rojane û rengeke nû daye dorhêla çanda elektronîk. Piştî salên 1960î pîqap, plakên nû û band/qeset belav bûne, di salên 1970yî de bi derketina televîzyonan û zêdebûna kanalên teybet êdî dorhêla çanda elektronîkî ji dorhêlên çandê yên din belavtir bûye. Lê esil tişta ku dorhêla çanda elektronîk herî zêde pêş xistiye û gihandiye asteke bilind, dorhêla înternetê ye (Kardaş, 2013: 9).

Bi saya serê amûrên elektronîkî û alavên ragihandina girseyî berhemên çandî, ji berhemên devkî û nivîskî bileztir û karîgertir belavî qadeke fireh dibin. Dema çanda nivîskî û ya elektronîk ji hêla amûrên têne bikaranîn û newaya tê şixulandin û dengên bi dengê dengbêjan tê tomarkirin, bê muqayese kirin; çanda elektronîk ji çanda nivîskî bêhtir nêzîkî çanda devkî ye (Çobanoğlu, 2000: 156).

Zêde na çil-pêncî sal berê kurdan Radyoya Rewanê[2] guhdar dikirin. Li gorî jiyana wan, teknolojiya herî pêşketî radyo bû. Niha ji hêla înternetê, telefon û televîzyonê dikarin bigihêne her tiştî.

---

[2] Radyoya Rewanê: Di sala 1955an de li Rewana paytextê Ermenistanê, hatiye sazkirin. Di bin banê vê radyoyê de beşeke kurdî hatiye vekirin. Serokê beşa kurdî Cesîmê Celîl, spîkerê 'ewil Eznîva Reşît e.

**Folklor Weke Têgeheke Zanistî**

Cara yekem di 22yê Gelaweja 1846an de arkeologê Ingilîz William J. Thoms têgeha " folklore" bi kar aniye. Thoms, di gotara xwe ya ji kovara bi navê *Atheneum* re şandibû de teklîf dike ku şûna têgeha "antikiteya populer" an jî "edebiyata populer" ku berê di bin navê vê dîsîplînê de xebat dihatin kirin; têgeha folklor bê bikaranîn. Xwe wek pêşengê îcadkirina vê têgehê dibîne û ji ber vê yekê jî dilşad e. Thoms di vê gotara xwe de têgeha folklorê weke berhemên kevnare yên weke tevger,'urf, 'edet û gotinên pêşiyan pênase dike (Darson, 2014: 12).

Di sala 1878an de li ingilîstanê bi navê "Folklore Fociety" ( Komeleya Folklorê) kemeleyek ava dibe û em dikarin bibêjin ev sazîya'ewilîn a folklorê ye. Piştî avabûna vê komeleyê têgeha folklorê weke têgeheke navneteweyî ketiye nava gelek zimanan, navûdeng daye û zanyarên îskandînav, uris, portekîzî û spanyol ev têgeh bi kar anîne. Lê em nikarin bibêjin di hemû zimanan de ev peyv tê bikaranîn. Weke mînak bi zimanî elmanî"volkskunde", bi zimanê tirkî "halkbilimi", bi fransî "tradîtîons populaîres"e. Lê li gorî ku Yuri M. Sokolov ragihandiye peyva volkskunde di kovara bi navê *Der Reisendeyê* de di 10ê Nîsana 1782an de hatiye bikaranîn û pêşengê bikaranîna vê peyvê jî xwedî û gerînendeyê weşanê Friedrick Ekkard e (2009: 11).

Her çiqas têgeha volkskunde berî têgeha folklorê hatibe bikaranîn jî tu carî bi qasî têgeha folklorê berbelavnebûye. Dîsa di demên nêz de di lîteratura navneteweyî de ji ber ku têgeha folklorê bi demê re wateya xwe ya rastîn wenda kiriye û wateyên xelet lê hatine bar kirin; têgeha folklorîstîk derketiye holê û qewet daye wateya peyvê.

**Pênaseya Folklorê**

Folklor jî weke gelek têgehên zanistên civakî gelek pênaseyên xwe hene. Mirov nikare folklorê û naveroka wê hepsî nava çarçoveyeke teng bike. Zanista folklorê li gorî şert û mercên dinyayê yên guherbar, her gav xwe nû dike.Loma jî pênaseyên folklorê yên curbicur hene.

Alan Dundes vê yekê wiha rave dike: Em nikarin bibêjin ku folklornasan li ser pênaseya folklorê li hev kirine. Di cilda ewil a *Standars dictionary of Folkore, Mitoloji*

---

Beşa Kurdî heftê du saeta weşana kurdî dikir. Heta salên dawîn weşana xwe domandiye. Ji bo pêşketina nasnameya kurdî xwediyê cihekî girîng e.

*and Legend* de bîst û yek cure pênaseyên folklorê hene. Ev yek bi tena serê îspata vê gotinê ye û mijara me ronî dike (2014: 16).

Dundes di gotara xwe ya bi navê "What is Folklore?" (Folklor çi ye?) de diyar dike ku piraniya zanyaran bi qismê "lore" ango "zanist" a folklorê re, hinekên wan jî bi qismê "folk" ango "gel" a folklorê re eleqedar bûne. Dundes di vê gotara xwe de li ser têgîna "folk" ango "gel" rawestiyaye. Li gorî Dundes; têgîna gel komeke însanên ku qet nebe xwediyê pêkerên/faktorên hevpar in, îfade dike. Ew pêkerên ku wan bi hev re girêdide ne girîng e ku çi ye. Dibe ku pîşeyek, zimanek, an jî baweriyeke hevpar e. Ya girîng hebûna hinek kevneşopan e. Ev kevneşop li gorî hinek sedeman çêbûne û gel van kevneşopan dipejirîne ku ew kevneşop yên wî ne. Li gorî vê pênaseyê gel bi qasî neteweyekî fireh an jî bi qasî malbatekê teng e (2014: 16). Piştî pênasekirina gel ji hêla Dundes ve têgîna gel bûye xwediyê wateyeke firehtir.

Folkor zanista vekolîna çand û kultura hemû komên civakî ye.Çanda gel a daringî û arişen bi rê û rêbazên xwe yên taybet lêdikole, berhev dike, disenifîne, dinirxîne û encamekê jê dertîne. Bi giştî jî li ser taybetiyên gel yên gelemperî dixebite û bi hêlek din ve jî taybetiyên jiyanê yên ku berî zayîna mirovan heya piştî mirina mirovan vedikole. Çi bûjenî û çi jî arîşen, çi tiştê ku însan û jiyana însên dorpêç kiribe, mijara folklorê ye.

Li gorî Gennep, Folklor bêjeyeke Ingilîzî ye, ji du bêjeyan pêk tê: "folk" gel û "lore" zanist an jî vekolîn. Wê gavê folklor zanista vekolîna li ser gel e. Folklor ew zanist e ku berhemên çandî yên daringî û arîşen yên gelê welatekî an herêmekê ji xwe re weke mijar dibijêre, li gorî rêbazên xwe yên taybet; berhev dike, dabeş dike, lêdikole, vedikole, şîrove dike û di dawiya dawî armanc ew e ku bigihîne pêkhateyekê ( Ji Gennep vgz. Pertev, Yıldırım&Aslan, 2014: 11).

Folklor, 'urf, 'edet, bawerî, tore û merasîmên gel som dike. Folklor çanda gelêrî ya îroyîn jî vedikole û dinirxîne. Guherînên jiyana civakî rengê xwe dide çandê jî. Folklor van çandan dide ber hev, têkiliyên di navbera wan de, guherînên wan, teşeyên wan yên ku îro girtine derdixe meydanê. Bi vê hêlê ve ji bo têkiliya do û îro bê fêmkirin karekî girîng barî stûyê xwe dike.

Di ravekirina terza jiyanê, helwesta li hember rewş û bûyeran, têgihana şîrovekirina dinyayê de roleke folklorê ya girîng heye. Dîsa roleke folklore di

diyarkirina rêzek 'eciban, hunerwerî, afirînek, tore, sazî û sazîbûn ên ku jiyana toreyî saz dikin, li dar dixin, dewlemend dikin, rengdar dikin de gelek girîng e.

Têkilîyeke/zincîreke xurt a 'urf û 'edetan bi raboriyê û roja ku em têde ne re heye. Folkor di destnîşankirina vê zincîrê de; di libolibo diyarkirina xelekên wê yên alîgir û kostek de; di gihiştina zêma çanda gelêrî de çavkaniyên zengîn pêşkêşî eleqedarên xwe dike (Çobanoglu, 2012: 20).

Di zimanê kurdî de ji bo folklorê bi zaravayê kurmancî "zanista gel", "kelepor" û "zargotin", bi soranî, "xelknasî - edeba millî", bi kirmanckî "zanistiya şarî" tê gotin (Rojhilat, 2015: 8).

Peyva kelepor ji mijarên weke; dîrok, tore, rengê hunerî, çîrok, hikayet û fesaneyan pêk tê. Ev ji bab û bapîran bo neviyan û bo miletî maye. Miletên pêşketî girîngî dane karê berhevkirin û komkirina keresteyên keleporê. Çimkî binaxa netewetiyê digihêje raboriya xwe, milet bi kelepora xwe, xwe nas dike. Di avakirina şaristaniyê de kelepora mirovî xwediyê cihekî girîng e (Ji Yusif vgz. Sadinî, 2011: 7).

Mîr Celadet'Elî Bedirxan di *Hawar*ê de, di dawiya hejmara siyî, beşa ferhengokê de bi nave "Ferhengvan" pênaseya folklorê wiha kiriye:Ev bêje di eslê xwe de ingilîzî ye. Lê îro ketiye nava hemî zimanên dinyayê. Lewre me jî ew xistiye zimanê xwe. Jixwe kurdên Qafqasê beriya me ev bêje xistine nava zimanê xwe û pirtûkek bi navê *Folklora Kurmancî*[3] belav kirine. Folklor tevahiya'edet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew'edet, çîrok û stranên ku ji nav xelkê bi der ketine û li dora nifşan de bi ser ve ketine û gihîştine nifşên nû. Jixwe bêjeya folklorê bêjeyeke bihevketî ye û bi wateya zanîn an zanistiya xelkê ye (2012: 514).

Ji bilî *Folklora Kurmancî* ya Heciyê Cindî gelek vekolîner û nivîskarên kurd jî peyva folklorê bi kar anîne. Sadiq Bahaeddîn Amedî bi navê *Folklora Kurdî*, Rohat Alakom bi navê *Di Folklora Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, û Cigerxwîn bi navê *Folkora Kurdan* berhem weşandine. Li gorî van agahiyan em dikarin bibêjin ku peyva folkor di kurdî de cihê xwe girtiye. Folklor ji bo hemû zaravayên kurdî jî peyveke hevpar e û bikaranîna vê têgehê, ji bêjeyên din kêrhatîtir e.

---

[3] Folklora Kurmancî: Navê pirtûka Heciyê Cindî ye.

**Edebiyata Gelêrî (Anonîm)**

Edebiyata gelêrî beşeke folklorê ye. Di nav civaka rojane de bi devkî tê ristin û bi rêya nifşan digihêje roja me. Qismek ji van berhemên devkî bi rêya nivîsê jî digihêjin nifşên nû.

Qada hevpar a ziman û çandê, qada ku berhemên devkî derdikevin holê ye. Hemû çand û şaristanî, gelek bawerî,'urf û'edetan derdixin meydanê. Edebiyata gelêrî ya hemû neteweyan xwedî amûrên dewlemend in. Edebiyata gelêrî, berî dîtina nivîsê hebû, bi gotin û guhdarkirinê, ji hêla hişî ji nifşan bo nifşan hatiye veguhastin. Ji hêla jiberkirinê heta roja me xwe parastiye (Tan û yd., 2010: 38).

Di civakên ku nexwedînivîs de, berhevokên çandî yên ku bi devkî têne veguhestin, edebiyata gelêrî pêk tînin. Gelek civakan, di demên diyar de berhemên bi vî awayî derxistine meydanê. Edebiyata gelêrî ne tenê di civakên nexwedînivîs de, di heman demê de di civakên xwedînivîs de jî hebûna xwe ya bi edebiyata nivîskî re parastiye. Edebiyata gelêrî, ji berhemên weke; mamik, fesane, çîrok, metelok, zûgotinok, biwêj, gotinên pêşiyan û hwd. pêk tê. Ev berhemên edebiyata gelêrî ne û gotyarê/bêjerê wan nediyar in.

Berhemên edebîyata kurdî ya gelêrî bi awayekî sivik û zelal hatine gotin. Ev yek taybetiyeke hevpar a berhemên anonîm e. Piraniya berhemên edebiyata gelêrî bi nezmê hatine gotin. Hejmara kiteyî di hinek cureyan de heye. Taybetiyeke edebiyata gelêrî jî ev e ku nayê zanîn ka kê ev berhem afirandiye, yan jî gotiye. Ango berhemên gelêrî ne. Bi awayekî kolektîf/hevpar hatine çêkirin û loma jî gelek varyantên wan hene.

Ziman û vegotina edebiyata gelêrî sade ye. Berhemên wê bi awayekî sivik û zelal hatine gotin. Zimanê ku tê bikaranîn, zimanê wê herêmê ye ku ew berhem li wê herêmê hatiye afirandin. Ziman, zimanê wê demê ye. Berhemên edebiyata gelêrî di nava gel de hatine afirandin. Ew berhem ji hêla mijar, tema û zîziyê rasterast bi jiyana gel ve girêdayî ne. Yên ev helbest afirandine piranî kesên nexwenda ne. Loma zimanê jiyana rojane tê bikaranîn.

Ji bilî mijarên weke eşq, firaq, bêrîkirin, mirin, dîn, tesewifê; li ser mijarên bi jiyana civakê ve têkilîdar jî hatine sekinîn û rexne lê hatine kirin. Bi gelemperî mijarên şênber hatine şixulandin. Ji teşeyê zêdetir giranî li ser mijarê ye. Helbestê li gorî mijar û formên xwe navên weke heyranok, payîzok, şeşbendî, dûrik û hwd. hildane. Bi awayekî

siruştî, bêpîlan têne ristin. Loma jî di helbestan de ji hêla form û naverokê ve kûrahîyeke mezin tune ye.

Gotinên pêşiyan, biwêj û vegotinên xweşik ên gel, gellekî têne bikaranîn. Ji şibandin û manendinê jî tê îstîfade kirin. Serenavên helbestan tune ye. Li gorî naverok û formên xwe têne binavkirin. Berma û vekêş têne bikaranîn ûbi vî awayî aheng tê sazkirin. Ji hêla mijar, form û zimanî ve ji bandorên derveyî dûr e. Piraniya berhemên edebiyata gelêrî nezm in, nesr kên im. Ji bo di hişê mirovan de mayînde bibe ji pexşanê bêtir, bikaranîna helbestê kêrhatîtir e. Çîrok, fesane, gotinên pêşiyan, biwêj û pêkenok mînakên pexşanê ne. Di edebiyata gelêrî de çavdêrî û zêrevanî hene. Şibandin ji têgehên şênber çêdibin. Tiştên ku çêdibin divê ji jiyana rastîn bêne girtin.

**Helbesta Gelêrî (Anonîm)**

Çanda gelêrî, çavkaniya çanda neteweyî ya herî girîng e. Helbesta gelêrî jî milekî herî çalak, belav û resen ê vê çavkaniyê ye. Berhemên helbesta gelêrî, navê hunermendên wan nediyar in û bi rîtm û şêweyeke taybet derketine meydanê. Qismekî helbesta gelêrî bi pîvana kiteyî hatine honandin. Helbesta gelêrî berhemên gelêrî dihewîne. Ango yên ku ew helbest honandine ne diyar in. Berhemên helbesta gelêrî bi borîna demê re bûne milkê gel.

Heyranok, payîzok, metelok, zûgotinok û hwd. berhemên helbesta gelêrî ne û ristarê wan ne diyar e. Ji bilî dîmenên wan yên estetîkî û hunerî, di nava van berheman de nîşaneyên civakî û derûnî jî hene. Ji ber vê yekê jî xwediyê kargînên girîng in. Li gorî vekêş û bermayên xwe nêzî hev in. Ji ber ku gel rastiya jiyana xwe herî baş bi zimanê xwe yê resen dikare bibêje, zimanê wan ji xemilandinê dûr; sade û tisî ye. Ev berhem peywira neynika jiyana gel barî ser stûyê xwe dikin.

Zimanê helbesta gelêrî sade, tisî û yê gel e. Vekêş û berma hene. Aheng bi van têne sazkirin. Mijarên weke eşq, mirin, gernasî, xerîbî, bêrîkirin û hwd. hatine bikaranîn.

Ji ber ku mijara xebata me danasîn û vekolîna heyranokan e û cureyên helbesta gelêrî ne mijara me ye, em bi hûrgilî li ser cureyên helbesta gelêrî nesekinin. Me tenê nave cureyên helbesta gelêrî destnîşan kirin û li jêr rêz kirin.

**Cureyên Helbesta Gelêrî**

1.Stran (Kilam)

2.Dûrik (Qewlêrk)

3. Lorîk (Hayîn/Laylayê)

4.Dîlok (Stranên Govendê)

5. Lawij (Lawje)

6. Heyranok

7. Payîzok (Pîrêpayizok)

8. Şeşbendî

9. Berîte(Katar)

10. Destan

11. Şînî

12. Medîhe

13. Narînk (Qaydên Xerîbê)

14. Serşo (Serê Zava)

15. Stranên Kar

16. Lawik (Zêmar/Delal/Pêgotin)

17. Stranên Zarok û Leyîzan

18. Xizêmok

19. Biharok

20. Sêxiştî

21. Şer

22. Stranên Bûyerên Siruştî

23. Qewl û Beytên Êzdîtiyê

24. Qesîde

25. Zûgotinok (Lezbare/Şaşmîtî/Zûbêj/Çîvanok)

26. Mamik (Tiştanok)

27. Metelok

28. Nifir

29. Lava (Di'a)

# BEŞA YEKEM
# HEYRANOK BI AWAYEKÎ GIŞTÎ

## 1.1. LÎTERATÛRA HEYRANOKAN

Di salên dawîn de li ser edebiyata kurdî nemaze li ser folklora kurdan xebatên hêja hatine kirin. Li ser heyranokan jî xebatên curbicur têne kirin. Em dê li jêr xebatên ku li ser heyranokan hatine kirin yeko yeko rêz bikin û bidin nasîn.

Beşîr Botanî bi navê *Heyranok Gilî û Gazindên Evînê* berhevkirin û vekolînek kiriye û di sala 1995an de li Swêdê di Weşanxaneya Apecê de weşandiye. Ev berhem bi tîpên latinî ye. Botanî heyranokên vê kitêbê ji hêla Zaxoyê ber hev kiriye.

Dîsa Adîb Abdallah bi navê *Heyranok û Nameyên Evîndaran* xebateke folklorîk kiriye û ev xebat ji Weşanxaneya Êketiya Nivîskarên Kurd di sala 2006an de li Hewlêrê weşiyaye. Ev berhem bi tîpên erebî ye. Xebateke berhevkariyê ye.

Ebdulezîz Xeyat di sala 2002an de xebateke berhevkariyê ya bi nave *Heyranok* kiriye. Ev xebata li Weşanxaneya Spîrezê derçûye. Ev kitêb ji 134 rûpelan pêk tê. Bi tîpên 'erebî ye.

Xalid Sadinî pirtûkek binavê *Heyranokên Kurmancî* çap kiriye. Heyranoken ku di ve pirtûke de kom bûne ji gelek pirtûk, kovar û kesan hatine wergirtin. Lê ji van du jêderk yên sereke ne: Yek jê, xebata Hecî Cefer e ku ev berhem di sala 1989an de bi nave *Heyranok Ji Keleporî Kurdî* li Hewlêrê hatiye çapkirin. Xebata duyem jî ya Ehmed Ebdullah Zero ye. Bi nave *Strana Lirîkî Heyranok* di sala 1987an de li Bexdaye hatiye çapkirin. Pirtûka Sadînî di sala 2011an ji Weşanxaneya Nûbiharê derketiye û bi tîpên latînî ye.

Rêkêş Amîdî bi navê *Heyranokêt Kurdî* kitêbeke bi hecm/qeware çap kiriye. Ev kitêb di sala 2010an li nav Weşanxaneya Spirêzê derketiye. Ev xebat bi tîpên 'erebî hatiye nivîsîn. Tê de sê hezarî zêdetir heyranok hene. Kitêb ji heysed û deh rûpelî pêk tê. Di serê kitêbê de li gorî naveroka heyranokan tesnîfek jî hatiye çêkirin.

Abdulkerîm Surûş kitêbek bi navê *Gilî û Gazindên Evîndaran* weşandiye. Ev berhem di sala 2016an de, li Weşanxaneya Nûbiharê derket. Ji heyranokên kurmancên rojhilatê Kurdistanê pêk tên. Li gorî herêm û dengbêjên ku ew heyranok lê girtiye, dabeş kiriye.

Dîsa di gelek tez û xebatên akademîk de, di kovarên kurdî de, li ser înternetê gelek xebat û berhevokên heyranokan hene. Ji van xebatan yên ku me ji bo vê xebatê sûd jê wergirtin ev in:

Canser Kardaş di teza xwe ya doktorayê ya bi navê "Dengbêjlik Geleneği ve Âşık Edebiyatı ile Karşılaştırılması(Kevneşopiya Dengbêjiyê û Berawirdkirina Wê bi Edebiyata Aşiqan ve)" de, di bin beşa cureyên dengbêjiyê de cih daye danasîna heyranokê û mînakên heyranokan pêşkêş kiriye.

Yaşar Kaplan bi navê *Kaniya Stranan* kitêbek amade kiriye. Di vê kitêbê de di bin banê stranên kurdî yên rûniştî de heyranok daye nasîn û çend mînakên heyranokan daye. Û dîsa gotareke bi navê "Strana Kurdî/Kurmancî: Devera Hekaryan Wekî Nimûne" di *Kovara Zanîngeha Bîngolê* de weşandiye. Di vê gotarê de jî beşeke li ser heyranokan heye.

Tekîn Çiftçi di teza xwe ya masterê ya bi navê "Di Kilamên Evînî yên Dengbêjan de Temaya Jinê" de, di bin beşa formên muzîka kurdî de cih daye danasîna heyranokê.

Wendy Hamelînk di teza xwe ya doktorayê ya bi navê "The Sung Home; Narrative, Morality, and the Kurdish Nation"(Mala Strînê; Vegotin, Exlaq, û Neteweya Kurd) de di bin beşa "Speaking of Songs and Village Life (Axaftinên li ser Stran û Jiyana Gundewar)" de cih daye danasîna heyranokê û mînakeke heyranokan pêşkêş kiriye.

Mîthat Kutlar di *Kovara Qirika Reş* de bi zimanê tirkî, gotarek bi navê "Kadınların Aşkla Ördüğü Dörtlükler ya da Heyranoklar (Çarînên ku Jinan bi Evînê Honandine an jî Heyranok)" li ser heyranokan weşandiye. Heyranok daye nasîn û li ser rola jina kurd a di ristina heyranokan de sekiniye.

Rotînda Yetkiner di xebata bi navê *Dengbêj û Stranên me, Destan û Folklora me* de li ser heyranokê beşek pêşkêş kiriye, heyranok daye nasîn. Ev xebata ji hêla Hasan Akbal ve hatiye amade kirin. Tê de bilî danasîna berhemên muzîka kurdî bi sedan stranên kurdî jî hene.

Gobar Ciyan li ser înternetê, di malpera "tigrishaber.com"ê bi navê "Stranên evîniyê: Heyranok" nivîsek weşandiye, heyranok daye nasîn.

Lokman Turgut di teza xwe ya doktorayê ya bi navê "Mündliche Literatur der Kurden In den Regionen Botan und Hekarî (Edebiyata Devkî ya Kurdan li Herêmên Botan û Hekarî)" de, di bin beşa "Genres (Cure)" de cih daye danasîna heyranokê.

Mehmet Yıldırımçakar, du gotar li ser heyranokan nivîsîne. Yek di *Kovara Nûpeldayê*de bi navê "Çarînên ku bi Evînê Hatine Honandin; Heyranok", yek jî di *Kovara Folklora Kurdan* de bi navê "Heyranok; di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de" weşandiye. Di van xebatan de, danasîna heyranokê hatiye kirin, bi hin hêlan ve heyranok hatiye analîz kirin û çend mînak ji heyranokan hatiye pêşkêşkirin.

## 1.2. HEYRANOK; WEKE NAV Û TÊGEH

Li ser têgeha heyranok gelek pênaseyên curbicur hatine kirin. Di nav van pênaseyan de gelek xalên hevpar hene. Car caran cudahî jî çêdibin. Em ê li jêr wan pênaseyan bi rêzê bidin û binirxînin.

Hinekan ji hêla naverok û şiklê ve heyranok dane nasîn. Xalid Sadinî heyranokê wiha pênase dike. Heyranok, kurtehelbestên lîrik in. Li ser eşqê, evînê, pesnê yaran, delalî û sipehîtiya yaran, keç û kurên kurdan ji bo hevdu çêkirine. Jê re payîzok û panok jî tê gotin (Sadinî, 2011: 9). Her çiqas li gorî Sadinî ji heyranokan re payîzok jî tê gotin, ev agahî ne rast e. Payîzok, jê re pîrepayîzok jî tê gotin, cureyekî cuda ye. Payîzok hem ji hêla naverokî hem jî ji hêla şiklî ve ji heyranokê cuda dibe. Hetta em dikarin bibêjin hestên di heyranok û payîzokan de derdikevine pêş dijberî hev in. Di heyranokan de coş, eşq û evîndarî, di payîzokan de xemgînî û huzn heye, di payîzokan de qala demsala payîzê, kalbûn û pîrbûnê tê kirin. Heyranok di nav koçeran de, dema çûna zozanan, payîzok dema vegera ji zozanan têne gotin.

Ehmed Ebdullah Zero pirtûkek bi navê *Strana Lirîkî Heyranok* nivisiye. Li navê pirtûkê jî diyar e ku Zero heyranokê weke straneke lirîkî îfade dike. Zero di vê pirtûkê de heyranok ji hêla etîmolojiya peyvê pênase kiriye:Peyva heyranokê ji bo xweşkokkirina babetê û kurtiya rêz û beytên wê, bi paşgira "ok" ji peyva heyran hatiye kurtkirin û piçûkkirin. Heyranok beşeke mezin a strana kurdî ye. Li herêma Behdînan û bi taybetî jî di nav civaka zerî/keçik, lawik û jinên kurd degelek belav e. Dema heyranok têne gotin em dibînin ku di navbera du kesan de kul û keser bi hev re didarêjin, gilî û gazind dibine hozan, dibine awaz. Heyranok bi vî awayî destpê dikin: Kurik dibê "keçê dine" destpê dike û heta heyranok bidawî dibe û keçik dibê "kuro

dîno" an"kurko dîno" dest bi heyranokê dike û didomîne û heyranokê diqedîne. Bi çend doran diavêjine ber hevdu. Bi vî awayî bi dilekî pir vîn û soz tê gotin. Bi awayekî sade, rast û dildariyeke paqij keçik û kurik li hember hev dibêjin. Mijara heyranokan evîndariya du kesan e. Strana dildarî û evîndarî, rastgoyî ye û ev yek jî rengê stranên lîrikiyê ne. Ji nava dilê sotî derdikevin û dibin tercimanên evînê. Her çend kul û keser, xem, kovan û gazind li rêya di navbera her du dilan de dibine asteng jî, her wisa ronahiyek jî jê peyda dibe û weke çirayekê rêya evîndaran ronî dike (Ji Zero vgz. Sadinî, 2011: 13).

Heyranok berhemên rojane yên edebî/wêjeyî ne. Kurtehelbestên lîrik in û piraniya wan jî hevdengî ne. Dema ku keç û xortên kurdan civiyane û hatine cem hev, wek dîlan, serîlêdanan de an jî dema karên rojane yên wek; dew û meşk kiyandinê, savar kutanê, hirî şuştinê û hwd. bi piranî jî dema ku ji bo bêrîvaniyê çûne zozanan bo şahiyê ji hevdu re gotine û hestên xwe par ve kirine. Heyranok, stranên evînê ne. Ji aliyê keç û xortan ve carînan li hember hev carînan jî bi tena serê xwe têne gotin. Dema ji aliyê naverok û şêweyê ve bê vekolîn tê dîtin ku berhemên wêjeyî ne û naveroka wan evîna keç û xortan e. Heyranok bi taybetî gava ciwaniya jin û mêran hatine çêkirin. Hinek bi hêstên platonîk, hinek jî bi hestên eşkere hatine gotin. Heyranok bi piranî bi newayekê hatine honandin (Yıldırımçakar, 2015: 39).

Mijara heyranokan eşq, kul û êşa ji ber eşqê, negihêştin e. Di navbera keç û xortekî an jî di navbera çend keçik û çend xortan de li hember hevdu tê gotin. Komek rewşa xwe tîne ziman û koma din jî bersivê dide wan. Bi piranî dema çûyîna zozanan di rê de tê gotin (Kardaş, 2013: 160).

Heyranok rîtm in, ne stran in. Cureyên xweşik hene, yên cidî hene, yên polîtîk hene û yên erotîk hene. Heyranok li ser wan kesên ciwan in ku ji hev hez dikin û eşq û evîna xwe nîşanî hevdu didin. Ango heyranok di derbarê eşqa keç û xortan de ne (Hamelink, 2013: 413).

Heyranok ji aliyê jin û mêran ve li hember hev têne gotin. Di dema lîstikên govendê de aliyek dibêje û yê din lê vedigerîne. Kelecan cihekî girîng digire. Hestên evînê, bextewariyê xurt in. Manendin/teşbîh û pesin zêde ne. Muzîka wan herikbar e. Gotina wan hêsan e. Cureyekî dûrikan e. Erotîzm bi awayekî siruştî di nava kilamê de cih digire. Dema ku li dîwanan têne xwendin, mijarên lehengiyê jî dihewîne. Her çarîn

bi heman risteyê diqede. Rîtm û awaz heta dawiyê wekî hev didome. Her çarîn tê dubarekirin (Çiftçi, 2012: 42).

Ne hemû cureyên heyranokan lê qismek ji wan jin û mêr li hember hevdu dibêjin. Lê heyranok, ne dûrik in, ne stran in û ne jî stranên govendê ne. Heyranok di koşk û dîwanan de bi rûniştkî têne gotin. Newa û awazên heyranokan hene, bi enstrumaneke mizîkê nayêne gotin.

Heyranok, heyranbûnê îfade dike. Ev strana evîndar û dildaran e. Keç û kurên evîndar davêjin ber hevdu. Hemû naveroka heyranokê li dora evînê dizivire. Straneke sivik û xweş e. Ji bendên cuda û serbixwe pêktên. Sernavê heyranokan tune ye. Bi awayekî serbest û bivekêş hatine honandin. Heyranok bi gaziya "kurko dîno", an jî "keçkê dînê", dest pê dikin. Li Kurdistanê heyranok gelek berbelav in (Kaplan, 2015a: 164).

Ji bo heyranokan navên curbicur têne bikaranîn û ev nav li gorî herêman diguherin. Li başûrê Wanê Qelqelî û Serayê jê re dibêjin "qaydê qîzkan". Bi rastî li wê herêmê peyva "qayde" ji qaîde ya'erebî çêbûye ji bo stranê tê bikaranîn. Ji bo stranên govendê jî dibêjin "qaydê dawetan". Li Botan û Behdînan û Miksê peyva heyranok tê'emilandin û li Geverê dibêjinê "miqam".

Li navçeya Urmiyê nava'eşîrên Şikak û Herkiyan, ji van stranan re "lawjê keçik û kurikan" dibêjin, li navçeya Makûyê nava'eşîra Celaliyan jî ji wan re dibêjin "kilamên qîz û xortan" (Surûş, 2016: 13).

Heyranok, çarînên evînê ne, bi piranî ji hêla jinan ve hatine honandin. Derbirina eşq, hezkirin, pejirandin û heyranbûna jinekî an mêrekî, bi piranî di dema ciwaniyê de, ya li hember hevdu ye. Em dema ji hêla naverokî û şiklî ve lê binêrin, em dê bibînin ku berhemên edebî ne. Rêbazeke vegotinê ya lîrik derdikeve pêş. Ev yek jî heyranokê dike berhemeke edebî. Hin mînakên heyranokan yên ku derveyî ristina vekêşê ne, ew jî xwediyê newayeke xurt in. Divê em ji bîr nekin ku heyranok berhemên devkî ne ku ew bi newayekê têne gotin (Kutlar, 2010: 33).

Heyranok, ji hêla keç û xortên kurdan, berî zewacê têne gotin. Heyranok bi gilî û gazindên evînê barkirî ne. Keçik, bi zimanekî bilind, lê sivik ji bo zû bêne jiberkirin, distirînin. Heyranok, piştî zewacê jî nayêne jibîrkirin. Jin, bi reng û formên nû derbasî nifşên nû dikin û di nav gel de belav dibin (Çiyan, 2014).

Li gorî Rotînda Yetkiner du cure heyranok hene. Cureyek yên govendê ne û yek jî yên dîwanan in: Heyranok, ji aliyê jin û mêran ve têne gotin. Dema di govendê de tên gotin mêrek û jinek an du kom li hemberê hev ji devê hev digirin û di nava rîtma govendê de dibêjin. Di van stranan de coşa biharê heye, ji aliyê jin û mêran ve di govend û şahiyan de weke duwet tên gotin. Di naveroka melodî û gotinên van stranan de xweşikbûna siruştê, evîna dilan, dilşadî, heyecan û coş heye. Melodî piranî lîrîk in, her melodî çarînek e û ev melodî naguhere, tenê gotin tên guhertin. Heyranokên ku li diwana têne gotin jî hene, ev heyranok bi naveroka xwe qehremanî, an jî lîrîk in, lê melodiya wan naguhere. Li her herêma ku Kurd lê dijîn heyranok hene û kêm zêde weke hev in. Li Colemêrgê, li herêma Pînyaniş ji ber ku bi gelê Asûrî re tekiliya çandê gelek xurt e, miqamên heyranokan cuda ne. Heyranok weke maniyan in û naveroka wan bi giranî evîna xort û qîzan e. Di dema çûna zozanan de naveroka heyranokan bi coş û şahî ye. Gotinên heyrenokan gelek erotîk in, di rastiya xwe de heyranok tenê di navbera evîndaran de tê gotin, evîndar ji hev re dibêjin û kesên din guhdariya wan nakin (Yetkiner, 2009: 22).

Li gorî vekolînên me yên qadê heyranok di dawetan de nayêne gotin. Heyranok rûniştkî têne gotin. Jin û mêr dîlokan di govendê de, li hember hev, li devê hev digirin û dibêjin.

Heyranok ji peyva heyran çêbûye. Ji bo bi hêsayî bêne jiberkirin, keçik û kurik, bi zimanekî xurt lê xwerû û sivik, distirînin. Heyranok, zimanê evîn û evîndariyê ne, di navbera du dildar, evîndar û aşiqan de hatine gotin. Di demên berê de, evîndaran xem û kovan û gazindên xwe bi rêya heyranokan ji hev re gotine. Em dikarin bibêjin ku heyranok gilî û gazindên evînê ne. Gilî û gazindên keç û kurên evîndar in, ku nikaribûn bigehîne miraza dilê xwe (Surûş, 2016: 11).

Heyranok berhemên anonîm in. Ango di heyranokan de mexlas tune ye û yên ew heyranok ristine ne diyar in. Lê dema min berhevkariya heyranokan dikir, ji min re digotin:Ev heyranoka han dilê filan kesî ketibû qîza/kurê filan kesî ev heyranok ji bo wî çêkiribû (k.ç.1). Lê bi borîna demê re heyranok bi awayekî devkî û siruştî ji nifşên berê derbasî nifşên nû dibin û dibine malê civakê. Loma em dibêjin heyranok berhemên gelêrî ne.

Heyranok di koşk û dîwanan, civatên keç û xortan de têne gotin û bi peyvên wek "kuro dîno", "kuro gede", "keçkê dîne" û hwd. dest pê dikin. Ji bo kes nizanibe ka ev heyranok ji bo kê hatiye gotin, dilê wî ketiye kî, bi vî awayî dest pê dikin.

Ebdulkerîm Surûş, gotinên heyranok pê dest pê dikin wiha rêz kiriye: Delalê, delalo, delalîkê, delalîko, delal heyran, lawik heyran, keçikê dine, kuriko dîno, keçikê cane, kuriko cano, kuro gede, êtîm gede, lolo delal, lêlê delal, heylo delal, heylê delal, keçik dibêje/kurik dibêje, lawiko delal, lawiko dîno, kuro lawiko û hwd. (2016: 13).

Beşîr Botanî dibêje, heyranok, berhemên jinan in û bi pirranî ji aliyê keçikan ve hatine gotin. Ev cure rasterast bi jiyana jinan a civakî re têkilîdar e. Jinik û keçik bi gotina heyranokan hestên xwe, şabûnên xwe, di heman demê de kul û derdên xwe îfade kirine. (Botanî, 1995:12).

Heyranok, di nav keçik û lawikekî deduet e. Têkiliyeke rasterast di navbera heyranok û jiyana koçberiyê de heye,gava koçer diçin zomayênxwe, van stranan distirên (Turgut, 2010: 128).

Heyranokên weke duet keç û xort davêjine ber hev jî hene. Gilî û gazindên xwe bi hêla van heyranokan bi hev re par ve dikin. Em ê li jêr mînakekê ji van heyranokan yên ku me li qadê berhevkiribû pêşkêş bikin.

Keçik:

11 Tu kurapê mîn î kero
Malê heft qirala, danzde dûwala xu da sero
Te ne 'z xastim ne 'z revandim
Te dame yekî xelkê xerîb, li heft bavê me jî dero

Kurik:

12 Tu qîzapa min kotîyê
Berê berda min gotîyê
Te yê digot ez ê nakim xubxutîyê

Stranên lîrik yên kurtir weke stran, meqam, kilam, goranî têne binavkirin ku ev di heman demê de peyvên bi gelemperî ji bo stranê têne bikaranîn in; stranên dirêjtir jî bi navê lawik, qetar an jî heyran têne binavkirin. Livêj/liwêj carînan bigelemperî ji bo lîrikê tê bikaranîn, lê gelek caran straneke dînî nîşan dide. Heyran, heyranok tê wateya

stranên bi taybetî li ser evînê. Ev cudahiya di navbera lîrîk û vegotinê de, li gelek deveran di cî de ye, lê ev girîng e ku divê em ji bîr nekin, ev ne teqez e; gelek rewşên mîsoger nînin hene. Weke mînak; straneke ji hêla dengbêjekî ve tê gotin dikare gelek cure hêmanên vegotinê bihewîne (Allisson, 2010: 44).

Di *Hawar*ê de bi navê "heyran", helbesteke ji çar bendan pêk tê heye. Bi rastî ev ne helbesteke çarbendî ye, ev ji çar heyranokan pêk tê, heyranokên ku kur û keç davêjine berhev. Keçik benda yekem û ya sêyem dibêje û kurik di benda duyem û dawîn de bersiva keçikê dide. Li gorî jêrenotê em dizanin ku ev li herêma Botan hatiye berhevkirin. Keçik bi bêjeya heyran gazî yarê xwe dike.

Heyran[4]

Heyran! Îşev meçe, li hire be,
Wê bê pêşiya heyranê min nijda şemer û 'ereb e,
Wê te bikujin, xelkê bêjin, Eyşmelana reben biye serê loman û sebeba
Li ser serê min hat heyran, mêhvanê pêşmexribê.

Heyran Xwedê xerab bike Keşanê!
Xaniyê Mîr Ehmedê min raserî kolanê
Min ê divê ez ê şeva nîvê şevê herim tewafa xal û nîşanê gerdenê
Devê min şemitî, ketî bi ser lefika kitana Eyşmelanê.

Heyran tu xirab î
Tu li derê mala babê min rûdinî, qet ranabî;
Ti we bikî, ez ê bêjim bab û brayên xwe
Ev sêwiyê heyrana ji min venabî.

Heyran digo keçikê ez xirab im,
Ez li ber derê mala babê te rûdinim, qet ranabim.
Ti nebêjî bab û birayên xwe
Ti bêjî xunkarê dînê îslamê ez ji te venabim (2012: 567).

---

[4] Ev heyraneke Botan e; serekê jêliyan bi xwe ji me re gotiye. (1941: *Hawar*. J. 33 ).

Heyranok cûreyeke stranan e ku tê de mijarên weke evîn, dînbûna di rêya olê de, gilî û gazindên ji ber evînê, xerîbî,'evdalbûn, poşmanbûn, xapandin, xwe gorî kirin û hwd. cî digirin (Farqînî, 2004: 809). Lê em li gorî vê nêrînê nizanin ka ger heyranok stran be, gelo ya gelêrî ye yan na. Rast e ku mijara heyranokan evîn û evîndariye û temaya evînê tê de serdest in lê ev evîn, evîneke beşerî ye û evîna îlahî tê de tuneye. Loma jî em nikarin bibêjin, mijarên oldariyê, an jî mijarên dînbûna di rêya Xwedê de mijarên heyranokan in.

Rêkêş Amîdî heyranok bi gelek hêlan ve daye nasîn. Heyranok beşek ji strana kurdî ya resen, pêkhatî ye. Tê de çend risteyên hozanan, sivik û tamxweş; bi kêş û vekêş hene. Straneke kurt,bi salîqe ye. Hemû bendên wê li ser evînê ne. Ji ber ku kurr û keç davêjne berhev, tama evînê jê difûre û loma tama wê bi salan wekî xwe dimîne. Di vehanîna heyranokê de bêtir para keça kurd heye. Li heyranokan jî diyar e ku keça kurd xwediyê hesteke nazik, dilekî vekirî û evîneke paqij e. Digel vê kurrê kurd jî heyranok gotine, keç û kurran heyranok bi saliqeyên sivik û xweş avêtine berhev, ev heyranok hatine jiberkirin. Ji layê evîndaran ve destbidest gihandine. Lê mixabin gelekên wan wenda bûne. Heyranok, stranên lîrik, her risteyekê hemî dîmen, wêneyên rengîn, nexşên nû û rengîn, hest û sozan bi rengekî berçav dike. Girêdana soz û peyman, dilsozî û rastgoyî derdixe pêş. Heyranok rengekî strana kurdî ya folklorî ye. Pirrsoz û wefadarî, hejêkirineke paqij, digel xem û xweşiyê peyda dibe û xwe bi tîtal û rewşên bilind û paqij ve digel evîneke dijwar û dûr û tamsar girêdide. Selîqê heyranokan gelekî sivik in, ango em dikarin bibêjin bi awazeke taybet têne gotin. Ger hest li ser xemeke pirrêş û azar bin, awaz dê melûl be. Carînan jî evîndar bi awayekî xweşdivê, pesn û methkariyê ji berdilkê xwe re dibêjin. Vêga awaz diguhere, bi awazekî sivik, dilterr tê gotin. Ji ber ku têkiliya kurdan bi neteweyên derdorê re çêbûye, peyvên biyanî jî ketine nava heyranokan. Peyvên'erebî yên weke; qelem, mektûb, mehkeme, qazî, kefîl, esker, mecal û hwd. û peyvên tirkî yên weke; efendî, beg, oldaş û hwd. derdikevine berçavê me. Ji ber ku herêma Badînî cîranê farisan nîne peyvên farisî di heyranokên vê berhemê de berçavê me neketin. Lê birastî ev peyvên biyanî tu xirabiya wan bi zimên re tune ye û astê heyranokê neaniyê jêr. Tu ziman tune ye ku tê de peyvên biyanî tunebin. Heyranok hunereke berz û bilin e ku tu dikarî ji hêla komeleyetî, aborî, ramyarî, dîrok, ziman û hwd. ve miletî tê de bibînî (2010: 9).

Li gorî xebata me li qadê kirî û berhemên li ber destê me; heyranok cureyek ji helbesta gelêrî ye. Kurtehelbestên lîrik in. Vehonanên heyranokan ne diyar in loma heyranok malê gel in. Bi newayekê têne gotin. Aheng bi berma û vekêşan saz dibe. Di dema ciwaniya keç û xortên kurdan de hatine ristin. Mijara heyranokan evîn û evîndarî ye. Temaya bingehîn a heyranokan evîn eû temayên din jî bi evînê re girêdayî ne. Her çiqas navê heyranokê li gorî herêman biguhere jî navê herî belav û tê zanîn dîsa heyranok e. Loma jî ji bo vê cureyê helbesta gelêrî navê heyranok di cih de ye. Heyranok ne stran in lê xwediyê rîtmekê, newayekê ne. Dîsa ne cureyekî dûrikan in. Ji hêla şiklî û naverokî ve cureyekî serbixwe ye. Heyranok ne berhemên edebiyata dengbêjiyê ne, berhemên edebiyata gelêrî ne.

## 2.3. ROLA JINA KURD DI RISTIN Û PARASTINA HEYRANOKAN DE

Piraniya berhemên çandî li ser jinan in. Jin, di nava gelek helbest, çîrok û stranan de temaya bingehîn in û gelek berhemên folklorî ji hêla jinan ve hatine çêkirin. Wekî Alakom jî gotiye: “Jinan di folklora kurdî de ji xwe re textek ava kirine û serdestiyeke wan heye. Di folklora kurdî de gotin gotina jinan e û kilam kilamên keçikan in (2009: 13).”

Bi rastî jî di gêhiştina berhemên folklorî bo roja me de rola jina kurd nikare bê înkar kirin. Lê di nav wan berheman de jinan herî zêde heyranok ristine, û parastine. Ji ber ku mijara heyranokan evîna keç û xortên kurdan e, di jiyana jina kurd de xwediyê cihekî girîng e (Kutlar, 2010: 33).

Heyranok berhemên rojane yên wêjeyî ne. Dema ku jinên kurdan civiyane û hatine cem hev ji hev re gotine. Em dikarin bibêjin ku berhemên devkî yên di derbarê wêjeya kurdî de, di folklor û jiyana kurdan de bi piranî bi saya serê jinên kurd hatine vê rojê û winda nebûne. Lê belê li navbera van de yên ku jinan anîne vê rojê yê herî zêde heyranok in. Jinan ev berhem bi kedeke mezin gihandine vê rojê. Bi wî yekî ji bo edebiyata me destkeftiyên jinan gelek girîng in.

# BEŞA DUYEM
# VEKOLÎNA HEYRANOKAN

## 2.1. HEYRANOK JI HÊLA ŞIKL Û CUREYÊ VE

Nezm navê gotinên bi awayekî bipîvan in ku ew biaheng hatine gotin û nivîsîn. Loma jî nezm û helbest ne heman tişt in. Di navbera herduyan de cudahî heye. Her helbest di heman demê de nezm e lê her nezm ne helbeste e. Ji bo nezmek bibe helbest divê tê de hunerek, di gotinê de spehîtî û resenî hebe. Em bi kurtî dikarin bibêjin helbest, şêweya nezmê ya ji hêla spehîtî û zerafetê ve gihîştî ye. Ji berhemên bi nezmê hatine nivîsîn re menzûm an jî menzûme tê gotin. Berhemên bi nezmê hatine nivîsîn ji hêla şikl û naverokê ve ji hev vediqetin. Di navbera wan de cudahî hene. Şiklên nezmê ji cudahiyên ruxsarî û cureyên nezmê jî ji cudahiyên naverokî derketine meydanê.

Lêkolînerên edebiyat û zimannasiyê demek dûr û dirêj e li ser şikl û cureyê dixebitin. Li gorî van vekolîn û xebatan hema bêje hemûyan li hev kirine ku şikl û cure du xusûsên cuda ne, şikl bêtir taybetiyên derveyî îfade dike, cure jî tevî taybetiyên şiklî, mijarê/babetê jî navxweyî dike û nemaze şêwaz jî di diyarkirina cureyî de gelek girîng e. Dema em behsa nezmê bikin, di diyarkirina cureyê de bi tenê şikl û mijar têrê nakin, di binavkirina berhemên helbesta gelêrî de, newa xusûsa herî girîng e (Oğuz, 2001: 13). Ango di binavkirina berhemên weke heyranok, payîzok, dîlok, şeşbendî û hwd. de tevî şikl û mijarê, newa jî xususekî girîng e.

Di helbesta kurdî ya gelêrî de her şiklên nezmê bi taybetiyên xwe yên xas hene. Ûnsurên derveyî yên helbestê şiklê nezmê pêk tînin. Ev ûnsurên derveyî, taybetiyên helbestê ne ku helbestê dixine sazûmanekê. Bi kurtî; ristina vekêşê, yekeya nezmê, kêş û qewareya helbestê şiklên nezmê diyar dikin. Bi taybetî jî ristina vekêşê û qewareya helbestê ji bo diyarkirina şiklê nezmê gelek kêrhatî ne.

Di gerdîşa helbesta kurdî ya gelêrî de ji dabeşkirin û binavkirina helbestê ya li gorî mijar, newa û fonksiyonê re cureyê nezmê tê gotin. Di vê gerdîşê de dema cureyê nezmê tê diyarkirin li taybetiyên helbestê yên şiklî zêdetir li teybetiyên helbestê yên naverokî û pêşkêşkirinê tê nêrîn. Di helbestên nivîskî yên derveyî helbesta gelêrî dimînin de, mijar bi tena serê xwe têra diyarkirina cureyê nezmê dike. Lêbelê helbesta gelêrî di dorhêlên devkî de çêdibin, têne veguhêstin û bi gelemperî bi newayekê têne

gotin û her cure di nava civakê de xwediyê fonksiyonekê ye. Loma jî tenê naverok ji bo diyarkirina cureyê nezmê bi tena serê xwe têrê nake û newa jî divê bê hesibandin.

Carna naverok û newa jî têrê nakin. Vêga fonksiyon jî ji bo diyarkirina cureyê nezmê cihekî girîng digire. Weke encam em dikarin bibêjin naverok bi tena serê xwe di diyarkirina cureyê nezmê de ne pîvan e. Newa û fonksiyona helbestê jî ji bo destnîşankirina cureyê nezmê lazim e.

### 2.1.1. Şiklê Nezmê

#### 2.1.1.1. Berma (Paşserwa/Redîf)

Ger ew dengên dawiya risteyan ji hêla peywir û wateyê ve yek bin, dibin berma. Ango ji dubarekirina pêvek an jî bêjeyên ku peywir û wateya wan wekhev re, berma tê gotin (Artun, 2012: 67). Berma li pişt vekêşê rêz dibin.

72 Min dil hebû te dil he***bû***
Keskî malê haj me ne***bû***
Kuro gede çi bêbextî he***bû***
Li alyê te ***bû***

##### 2.1.1.1.1. Bermaya Pêvekî

Di vê cure bermayê de, berma bi tenê ji pêvekan/qertafan pêk tê.

16 Em cînarê derbider ***in***
Em di bejnê da berhember ***in***
Heçyê orta me herduka da pîs xeberde
Ew ne ometa pêxember ***in***

##### 2.1.1.1.2. Bermaya Bêjeyî

Di vê cure bermayê de, berma bi tenê ji bêjeyan pêk tê.

7 Gede duh li vir bû îro ‘l vir ***çû***
Bi meşa quling, xema gur ***çû***
Min nizani meraqlî bû ′j derdê dil ***çû***

##### 2.1.1.1.3. Bermaya Pêşrêzî

Ger berma, ne di dawiya risteyan de, di serê risteyan de çêbe, dibe bermaya pêşrêzî. Heman rêbaz ji bo vekêşê jî derbasdar e.

Di vê heyranoka jêr de bermaya pêşrêzî heye. Di pêş hersê risteyan de "ez" û "ê" di bin hev de bermayê saz dikin. Di vir de hem bermaya pêvekî hem jî bermaya bêjeyî heye.

10 ***Ez ê*** reş im biha nakim
***Ez ê*** herim ce qelaçî xu qelakim
***Ez ê*** qelenê çîla, çe'vreşa, bedewa ser xu rakim

Di heyranoka jêr de jî bêjeya "kuro" di hersê risteyên pêş de, bin hev de rêz bûne, peywira wan yek e. Bermaya pêşrêzî heye.

54 ***Kuro*** tu nebêje dayka mi ra metê
***Kuro*** gede dayka ′m dewsa xasya te tê
***Kuro*** ′j mi ra 'eyb e
′J te ra çiqas bêjî gune jê tê

**2.1.1.2. Vekêş (Qafiye/Serwa)**

Ji ber ku peyvên tên dubarekirin aheng û hevdengiyê çêdikin, vekêş di helbestê de aheng û hevdengiyê ava dike. Uğur Soldan vekêşê wiha pênase dike: Di dawiya risteyên helbestê de bikaranîna dengên dubare re vekêş tê gotin (2013: 198). Lê divê peywir û wateya wan dengên ku hatine dubarekirin ji hev cuda bin. Vekêş di reha peyvan de çêdibin.

13 Te qemerê fena ç***ira***
Xazî mêrê te bim***ira***
Min ê helalîka Xudê
Tu ′l vî canî helal k***ira***

22 Min dîwarê pincarç***in***a
Te dîwarê pincarç***in***a
Ev çi qîz e tevî j***in***a?
Xazî ez ê bibama tîreme'rkî
Biketama li ber qolê qolbaz***in***a

#### 2.1.1.2.1. Revî

Ji herfa vekêşê ya eslî re revî tê gotin. Revî di nav herfên ku vekêşê sazdikin de herfa dawîn û bingehîn e. Bi gelemperî herfeke dengdar e (Ji Pala vgz. Artun, 2012: 62). Di vê heyranokê de, hersê herfên dawiya bêjeyên qîçik, niçik û gurçik tên vekêşê saz dikin. Di van hersê herfan de herfa dawiyê, ango herfa k dibe revî.

4 Kuro gede
Laçka serê min qî***çik*** e
Zêrê hustuyê ´m çar ni***çik*** e
Wextê gedelawkê ´m li welatê xerîbyê tê
Tu divê beranekî heft gur***çik*** e

#### 2.1.1.2.2. Vekêşa Bingehîn

Di berhemên edebiyata dengbêjiyê de, çi heyranok û payîzok be, çi şer û kilam be, hema bêje di hemû cureyan de vekêşa bingehîn heye. Di hinek cureyan ne di serê risteyan, dawiya risteyan de, vekêşa bingehîn hatiye bikaranîn. Di hinekan jî hem serî, hem jî dawiyê de bi kar hatiye. Carînan di dawiyê de du riste jî dibin vekêşa bingehîn (Kardaş, 2013: 214).

84 ***Lo lo gede***
Min soz daye wextê yarî û heneka
Em ê çira û fenera daynin ser teneka
Em ê yarê teze bigrin
Bira yarê kevn bibne qerewilê ser kuleka

46 ***Kuro gede***
Sîyar nebe li bergîra
Tu yê peya nebe´l devê bîra
Kuro qîz i bûkê mala bavê min yê
Te ´bxapînin bi bertîla

*Kurko dîno*

Min nedzanî min nedzanî

Reşîşika baranê hat

Şîn kirin mêrg û kanî

Keçkê canê

Bo min man axînik û peşêmanî (Amîdî, 2010: 271)

**2.1.1.2.3. Vekêşa Yekdengî**

Ger vekêş ji yek dengê pêk hatibe, dibe vekêşa yekdengî. Di vê heyranokê de vekêş bi dengê e ya berî bermaya bû yê çebûye. Vekêş ji yek dengê pêk hatiye. Dibe vekêşa yekdengî.

72 Min dil hebû te dil h*e*bû

Keskî malê haj me n*e*bû

Kuro gede çi bêbextî h*e*bû

Li alyê t*e*bû

**2.1.1.2.4. Vekêşa Dudengî**

Ger vekêş ji du dengan pêk hatibe, dibe vekêşa dudengî. Ji van herdu dengan, yek dengdar e yek jî dengdêr. Di vê heyranokê de vekêş bi dengên i û n ya berî bermaya e yê çêbûye. Vekêş ji du dengan pêk hatiye. Vekêşa dudengî heye.

42 Mêrga mala bavê min mez***in*** e

Pala girtye serob***in*** e

Serhonazî lawkê m***in*** e

**2.1.1.2.5. Vekêşa Pirrdengî**

Ger vekêş herî kêm ji sê dengan pêk hatibe, dibe vekêşa pirrdengî. Di vê heyranokê de vekêş bi dengên a, t û î yê çêbûye. Vekêş ji duyan zêdetir dengan, ji sê dengan pêk hatiye. Dibe vekêşa pirrdengî.

23 Kuro gede min qîzxatî te kurx***atî***

Were em ê bibin cote teyrê serber***atî***

Em ê heram bikin naniavê vî wel***atî***

Di vê heyranokê de vekêş bi dengên e, s, t û î yê çêbûye. Vekêş ji çar dengan pêk hatiye. Dibe vekêşa pirrdengî.

17 Çemo çemo mestî m*estî*
Tu 'dçî naçî qe naw*estî*
Te yê goştê mi xar mane h*estî*
Hestyê mi wisa nin bîna darê rizî, pira şk*estî*

**2.1.1.3. Ristina Vekêşê**

Ristina vekêşê ji şiklê kombûna risteyên helbestê pêk tên. Ji bo diyarkirina şiklên nezmê girîng e. Di helbesta kurdî ya gelêrî de li gorî sazûmana vekêşan şiklên nezmê xwediyê çend rêzikên taybetmend in.

Dema em li gorî sazûmana vekêşan li heyranokê binêrin, heyranok jî xwediyê çend rêzikên taybetmend e. Li gorî xebatên qadê û kitêbên ber destê me piraniya heyranokan ji çar risteyan pêk tên û ristina vekêşa hayranokan bi piranî "aaxa" ye. Lê di nav heyranokan de yên ristina vekêşa wan bi şêweya "aaaa", hem "aaax", hem jî "abab" çêdibin jî hene. Lê li gorî vekolîna me ev cure kêm in. Ger em van rewşên awarte nehesibînin em dikarin bibêjin ristina vekêşa heyranokan "aaxa" ye. Lê gorî vê agahiyê em nikarin li gorî sazûmana ristina vekêşê bi awayekî teqez heyranokê ji cureyên din cuda bikin. Lê ev yek ji bo diyarkirina şiklê nezmê dibe nîşaneyeke girîng.

**2.1.1.3.1. Vekêşa Tekûz**

Ger hemû risteyên bendê di navbera hev de vekêşî bin, dibe vekêşa tekûz. Bi vî awayî tê nîşandan: (a, a, a).

88 Kerî pezê qijbel*eko*
Girtye zevya zeger*eko*
Pez hezar e şivan y*eko*

58 Ez helîyam bûme ş*ima*
Heval i hogirê dora min ker bûn, ne gotin ç*ima*
Derdê mêrê kotî, xasya t*ima*

Caran risteyek serbest tê honandin; risteya yekem, duyem û ˋçarem di navbera hev de vekêşî dibin û risteya sêyem serbest tê honandin. Bi vî awayî tê nîşandan: (a, a, x, a)

11 Tu kurapê mîn î k*er*o
Malê heft qirala, danzde dûwala xu da s*er*o
Te ne ′z xastim ne ′z revandim
Te dame yekî xelkê xerîb, li heft bavê me jî d*er*o

41 Çi palekî berî b***est***a
Tu yê zorê nede tilyê d***est***a
Xazya ez ê bibama tîreme'rkî
Min ê serê tilya destê te big***est***a

### 2.1.1.3.2. Vekêşa Çeperast

Ger risteya yekem û sêyem di navbera hev de û ya duyem û çarem jî di navbera hev de cuda cuda vekêşî bin, dibe vekêşa çeperast. Bi vî awayî tê nîşandan: (a, b, a, b).

52 Kuro gede te ser min ra girtî ya***r*** e
Heke li min rintir e li te bimb***arek***
Heke li min kotîti***r*** e
Kula Mûşê û Helebê
Mala bavê te da rûnê salê c***arek***

### 2.1.1.4. Qeware (Hecm)

Qewareya helbestê, tê wateya hejmara bendên helbestê. Bi dirêjbûn û kurtbûna helbestê re têkilîdar e. Weke mînak; ger em bibêjin ev helbest ji sê an çar bendan pêk tê wê gavê ev li ser qewareya helbestê dibe nirxandinek. Qeware jî ji bo diyarkirina şiklên nezmê girîng e. Cureyê helbesta gelêrî yên weke sêxiştî û dûrik ji yek yekeyê pêk tên. Wê demê em bibêjin qewareya sêxiştî û dûrikan kurt e, bicî ye. Destan ji gelek bendan pêk tên û dirêjtirîn şiklê nezmê ye. Li gorî vê agahiyê em dikarin bibêjin qewareya destanê di nav şiklên helbesta gelêrî de ya herî dirêj e.

Dema em li heyranokan binêrin em dibînin ku ji yekyekeyê pêk tên. Li gorî xebatên me yên qadê heyranoka herî kurt sêristeye û ya herî dirêj jî nehristeye. Lê belê em di pirtûka Amîdî de rastî heyranokeke sî û yek riste hatin. Lê ev yek îstisnaye. Hema

bêje piraniya heyranokan çarristene. Ango qewareya heyranokan kêm e, ev taybetmendiya, heyranokan ji şiklên nezmê yên weke destan, lawij, dîlokê vediqetîne. Vêga em dikarin bibêjin qeware ji bo diyarkirina şiklên heyranokê diyardeyeke girîng e.

Ev heyranoka jêr ji sê risteyan pêk hatiye. Ji hêla qewareya xwe ve heyranokeke kurt e.

38 Ez ê teyr im teyrtawis im
Li zozana li çîmena dilemisim
Ez ê ser ra qurs im, bin ra diteyîsim

Heyranoka jêrê ji bîst û yek risteyan pêk hatiye. Ji hêla qewareya xwe ve dirêj e.

Herê sîysinê
Rihsipîkêt me çûne zozana
Zozanêt'Ebabekir
Kaniyêt Serhedêt jorî
Li min û bejna bilind bîne şîr û şekir
Sala par û pêrar
Sing û ber û memikêt te'ebdala Xwedê
Koz û pawanêt ber destê min bûn
Kilîla dila li destê min bûn
Evroke keft û min berzekir
Herê guhînê
Dengê te be min deng e
Dengê te be min derman e
Ez dê çime
Ser tenîrkêt sindîyan û evan gulyane
Dê pişta xwe keme xêrî
Berê xwe deme xerîbîyan e
Hingî terka bejûbala
Navtenga zirav çavêt reş û belek bikem
Li ser singê min bibîte
Xirrêna tevrûbêra ne (Amîdî, 768).

### 2.1.1.5. Yekeya Nezmê

Yekeya nezmê taybetmendiyeke şiklî ya helbesta gelêrî ye. Bi kombûna misreyan ango bi hejmara risteyên helbestê re eleqedar e. Riste bi bandora kirinên nêrîtî/adetî bi rewşa yekeyên pendî û birêkûpêk têne cem hev û helbestê pêk tînin. Bi gotineke din helbest, tevahiyeke ku ji yekeyên nezmê pêkhatiye. Yekeya nezmê, perçeya helbestê ya herî piçûk, bihevre û biwate ye. Bi gotineke din helbest, teweke/tûneke ji yekeyên nezmê pêkhatî ye.

Di helbesta kurdî ya gelêrî de yekeya nezmê piranî sêriste û çarriste ne lê ev ne pîvaneke teqez e. Helbestên ji pênc risteyan û heta sî û yek risteyan pêk tên jî hene. Di hinek şiklên nezmê yên weke heyranok û payîzokan de yeke ne birêkûpêk e. Di hinek şiklên nezmê yên weke destan, dîlok û lawij de yeke birêkûpêk in. Yekeyên destanan bi piranî çarriste ne lê yên sêriste û pêncriste jî hene.

Herçiqas di heyranokan de yekeya nezmê nebirêkûpêk be, ji sedî sed çarriste nebin jî, gelekên wan çarriste ne. Herwisa heyranokên ji sê, pênc û heta sî û yek risteyan pêk tên jî hene û hejmara risteyên heyranokan herî kêm sê ye. Lê li gorî heyranokên me li qadê berhevkirî û heyranokên di kitêbên ber destê me de, rêjeya heyranokên çarriste gelek bilind e. Li gorî van agahiyan em dikarin bibêjin yekeya heyranokê çarriste ye. Yekeya nezmê ji bo diyarkirina şiklê heyranokê dibe nîşaneyeke girîng.

#### 2.1.1.5.1. Sêriste

10 Ez ê reş im biha nakim
Ez ê herim ce qelaçî xu qelakim
Ez ê qelenê çîla, çe'vreşa, bedewa 'l ser xu rakim

#### 2.1.1.5.2. Çarriste

28 Çemê Kurrê lemelem e
Kevrê ortê çar kelem e
Kurê kerê durî 'm here
Ez ne sêva devê te me

#### 2.1.1.5.3. Pêncriste

52 Kuro gede te ser min ra girtî yar e
Heke 'j min rintir e li te bimbarek

Heke ′j min kotîtir e
Kula Mûşê û Helebê
Mala bavê te da rûnê salê carek

**2.1.1.5.4. Şeşriste**

33 Ez ê çîyê dinêrim bêhna bê tê
Be'rê dinêrim keştî ′l rê tê
Min go qey esker e ′l eskeryê tê
Min go qey şofêr e ′l şofêryê tê
Min nizanbû gedelawkê min e
Çante dêst e ′l qolordyê tê

**2.1.1.5.5. Heftriste**

Ev şeve were nik me bi mêvanî
Dê ciyê te çêkem li danga malê, li nîva xanî
Dê bo te vekujim, mihê digel beranî
Wextê dayîk û babêt min gote min
Tu ya dîn bûyî, tu nizanî
Dê bêjim bo çi xelk û'alem zewicîn
Mabeyna min û lawkê min bûye kafirstanî (Sadînî, 2011: 110).

**2.1.1.5.6. Heştriste**

76 Berrî berrî sed car berrî
Ez nizanim ji germê ye yan ji sermê ye
Na wele ji mîrata xurbetyê ye
Gedelawkê ′m rengê xu guherîye
Gedelawkê ′m dike bê ye
Be'ra Wanê nade rê ye
Ez ê singê Avzema xu bikme keştî
Bira bide serda bê ye.

**2.1.1.5.7. Nehriste**

34 Bêmaldînê dara hewşa me da dartûyîn e
Xelkê min ra digo wey bêbavê malê lawkê te tunîne

Min go gelî gundîyû cînarê mixenetno
Hûn ê gazin i lomekan li min nekin
Emnîyeta malê dinyayê tune ye li dinyayê dimîne
Di dêrisê gundê me da
Wextê çavê minê bi bejn i bala gedelawkê min dikeve
Minjêwetrê xîmê binê beryanî şewitî
Terş i talanê mala paşê hemû ´j min ra tîne

**2.1.1.5.8. Sîwyekriste**

Û niha em ê li jêr heyranokeke sî û yek riste bidin. Ev heyranoka jêrîn, heyranoka herî dirêj e ku me heta niha bidest xistiye ye.

Sebra dila min ji te ra go
Ez ê navê te nizanim
Ji te ra dibêm pêşmalzerê
Biroj dibêm pêşmalzerî
Bişevê dibêm pêşmalzerê
Gustîl zêrrê qaş elmasê
Navê min li serê
Heb xazila binya mala duh vêçaxî ji vê derê
Tenê navê min û xwe nivîsî
Ser bendê wê mêzerê
Mêzer şûştî havêtî ser darê vê çeperê
Ez ê bêjim besse bêbabê
Pişta xwe bide xênî
Kêleka xwe bide çaxê vê pencerê
Bira kotî miskînî mêrê te
Xwe bide li ser xanî
Ez ê werim hewilkê vê sivderê
Destê xwe bidem nava reşgulîya
Tilîpêçkê xwe têxim ber qaşa vê kemberê
Ramîsanekê ji xalûxetê gerdenê
Xebxebkê bin guhara

Jê keremkim
Bira kotî miskînî mêrê te
Ji dêrda were
Bi çavê serê xwe bibînî
Bira bibêje eşqa dila
Bi gotina Xaliqê'alemê
Rebê di jorîn e
Bira bibêj qîza kerê
Vêca were destê vî camêrî bigre
Ji mala min derê herre (Amîdî, 2010: 861).

**2.1.1.6. Kêş**

Heyranokên bikêş û yên bêkêş hene. Lê piraniya heyranokan bêkêş in ango kêşa piraniya heyranokan serbest e. Di piraniya heyranokan de hejmara kiteyên risteyan di navbera xwe de ne yeksan in. Loma jî li gorî kêşê diyarkirina şiklê heyranokê ne pêkan e. Û di heyranokan de kêşa arûzê qet nehatiye bikaranîn.

Heyranokên jêr xwediyê kêşa kiteyî ne. Herçar risteyên herdu heyranok jî ji heşt kiteyan pêktên. Lê ev awarteyek e. Li gorî xebata qadê û mînakên heyranokên li ber destê me rêjeya heyranokên bikêş gelek kêm e.

5 Kuro gede Kurhesinî (8)
Tu hem gul î hem sosin î (8)
Dinya alem bibêje jî (8)
Tu serdilka dilê min î. (8)

28 Çemê Kurrê lemelem e (8)
Kevrê ortê çar kelem e (8)
Kurê kerê dûrî 'm here (8)
Ez ne sêva devê te me (8)

Di van her du heyranokên jêr de kêşa kiteyî tune ye, lê hejmara kiteyên risteyan ne weke hev bin jî nêzî hev in.

36 Wey eskero wey eskero (8)
Dê 'b axîno bav 'b kesero (9)

Heke hûn gedelawkê min naznakin (10)
Ew eskerê kincê wî zero (9)

23 Kuro gede min qîzxatî te kurxatî (12)
Were em ê bibin cote teyrê serberatî (14)
Em ê heram bikin naniavê vî welatî (14)

Di heyranokên jêrîn de ristina vekêşê bi şiklê (a, a, x, a ) ye ûristeya sêyem risteya serbest e û çawa ristina vekêşê xirab dike herwisa carînan gelek dirêj dibe û kêşa kiteyî jî xirab dike. Ji hêlek din ve em binirxînin, di van cure heyranokan de heyranokbêj hesta xwe ya herî xurt û bingehîn di risteya sêyem de gotiye û loma jî ev riste ji yên din dirêjtir bûye.

24 Gedelawkê min şivanê hûr kavira (12)
Kavir kirin danzde birra (8)
Hûn Xudê kin hûnê gedelawkê min nekin tu nifira (17)
Gedelawkê min piçûk e çaxê min ra (12)

19 Hîv derketye hîva zer e (8)
Minê pêşa mêzera xu da ber e (11)
Heçyê orta herdu dila, herçar çe'va pîs xeberde (16)
Ew ne 'l ometa pêxember e (9)

Û dîsa di hinek mînakan de risteya dawîn ji yên din dirêj tir e. Di van cure heyranokan de heyranokbêj hesta xwe ye herî xurt di risteya dawîn de aniye ziman. Loma ev riste ji yên din dirêjtir bûye.

20 Hîv derketye hîva sava (8)
Hîv xeyîdye naçe av a (8)
Xazî îman i Qur'anê (8)
Gedelawkê mi 'l ser singiberê 'm biba zava (14)

17 Çemo çemo mestî mestî (8)
Tu 'dçî naçî qe nawestî (9)
Te yê goştê min xar mane hestî (10)
Hestyê min wisa nin bîna darê rizî, pira 'şkestî (16)

### 2.1.2. Cureyê Nezmê

Di destnîşankirina cureyê nezmê de sê pîvan hene; mijar, newa û fonksîyon. Li jêr em ê heyranokan li gorî van her sê pîvanan libo libo binirxînin.

#### 2.1.2.1. Mijar (Babet)

Di heyranokê de mijar evîn û evîndarî ye. Ango heyranok li ser eşq û hezkirinê hatine honandin. Naveroka heyranokan li ser eşqê û mijarên bi eşqê re têkilîdar e. Keç û xortên kurdan hestên xwe yên evîniyê, gilî û gazindên xwe, bi rêya heyranokan ristine û ji hevdu re gotine. Di heyranokan de mijara evînê, mijara bingehîn e û mijarên weke evîn, bêrîkirin, xerîbî, êş û kulên ji ber eşq û firqetê, gilî û gazind û hwd. jî bi awayekî bi evînê re têkilîdar derdikevin pêş. Vêga em dikarin heyranokan li gorî mijara wan ji cureyên din veqetînin û weke cureyeke serbixwe diyar bikin.

#### 2.1.2.2. Newa (Awaz/Melodî)

Muzîka her cureyê xasî xwe ye. Loma jî di diyarkirina cureyan de newa piştî mijarê xwediyê roleke mezin e (Oğuz, 2001: 13).

Heyranok kurtehelbestên lîrik in û bi newayekê têne gotin. Wekî her cureyî heyranok jî xwediyê newayeke cuda ne. Hem di navbera cureyên helbesta gelêrî de hem jî di nava xwe de newayên heyranokê yên cihareng hene. Li gorî xebatên qadê em dikarin bibêjin ku her kes li gorî xwe heyranokan dirise û li gorî terza xwe melodiyekê ango newayekê lê dike û wisa distirê. Eşq û evîna herkesî xasî wî kesî ye û li gorî vê jî newaya her heyranokê, xasî ristarê wê heyranokê ye.Lê em nikarin bibêjin heyranok jî dikarin li gorî newaya xwe bêne senifandin. Lê em dikarin bibêjin heyranok li gorî newaya xwe ji cureyên din ên helbesta gelêrî cuda dibin.

#### 2.1.2.3. Fonksiyon (Peywir/Erk)

Folklornasan, li ser fonksiyona berhemên devkî sekinîne. Her cureyê vegotinê, di civaka ku tê de belav e de, xwediyê peywirekê ye. Ev cure li gorî pêdiviyekê, ji bo çareserkirina pirsgirêka ji wê pêdiviyê zaye, ji bo kêmasiyekê tekûz bike xwediyê rolekê/fonksiyonekê ne (Kose, 2000:503).

Gelo heyranok ji bo çi, bi kîjan armancê, ji bo kîjan pêdiviyan têne gotin? Bersiva vê pirsê ji bo me girîng e. Em dê li gorî bikaranîna heyranokê bizanibin ka ev çi cure helbest e.

Dema dilê keçikekî dikeve xortekî an dilê xortekî dikeve keçikekî ew hestên xwe weke heyranokekê dihonin û gilî gazindên xwe bi rêya vê heyranokê ji hezkiriyê xwe re dibêjin. Gilî û gazindên xwe li heyranokê bar dikin. Dîsa dema keç an jî xort ji hezkiriyê xwe dûr ketine, di navbera wan de astengî çêbûne, an jî hezkiriyê wan zewicîne, hestên xwe yên dilsoj ji hêla heyranokê anîne ziman. Vê yekê fonksiyona nameyeke eşqê daye heyranokê. Heyranok bûye tercumanê hestên wan kesan.

Ji ber ku fonksiyona hemû heyranokan yek e; pêywira nameyeke evînê hildaye, em nikarin heyranokan li gorî fonksiyona wan bisenifînin. Lê li gorî foknsîyona xwe ji cureyên helbesta gelêrî vediqete.

## 2.2. HEYRANOK JI HÊLA ZIMAN Û ŞÊWAZÊ VE

Di helbesta gelêrî de gelek unsûr hene ku ziman û şîwazê ava dikin. Em dikarin van unsûran wuha rêz bikin; bikaranîna peyvên herêmî, biwêj û gotinên pêşiyan, peyvên dubare û yên xurtbûnê sazdikin, terza sazkirina îmgeyan, bikaranîna hest, xeyal, motîf û sembolan, ciyawazî û dewlemendiya peyvan, dinêya fikr û mecazê, şixulandina hunerên vegotin û wateyê, ristina vekêş û bermayan, ahenga hundirîn, feraseta estetîkî, tecrubeyên civakî, dorhêla çandî, ol û baweriyên civakê. Ev ûnsur tev ziman û şêwazê diyar dikin (Artun, 2012: 69).

Di heyranokan de bi mebesta coş û kelecanekî sazbike şêwaza xitabê; ji bo civakê û yare/heyranê rexne bike, gilî û gazindên xwe jê re bêje, kêmasiyan bide berçav şêwaza hicîvê têne bikaranîn. Dîsa bi mebesta bûyer di hişê mirovan de zindî bibin, bandorekê bidinê, şêwaza li hember hev axaftinê; ji bo mijarên hestiyar yên weke evîndarî, bextewarî, jiyan, bêrîkirin, hezkirin û hwd. bi awayekî sade, xwerû/tisî, jidil, samimî û siruştî bêne pêşkêşkirin şêwaza lîrikê têne bikaranîn. Û ji bo yarê, heval û hogiran, dê û bavan û hwd. bi hêlên wan yên baş ve derbixe pêş şêwaza pesindayînê, bi mebesta heyberan bi rêya şayeseran vebêje şêwaza teswîrê û li hember rewşeke xirab an jî bêçaretiyê şêwaza lavayê têne bikaranîn.

Ziman, wesfa herî bingehîn e ku mirovî ji mirovên din cuda dike.Dîsa ziman wesfeke ku taybetiyên îmtiyaz û jorbûnê dide mirovî. Her civak zimanekî xwe yê hevpar heye. Dîsa her mirov zimanekî xwe yê taybet heye ku vî dike kesekî taybet. Xuh, mîzac, zewq, dorhêla çanda ku tê de gihîştiye û terza jiyana wî, bisînorî/bêsînoriyên zimanê wî kesî, diyar dike. Di zimanê tê bikaranîn de, bi bandora îmgeyên kes bikartîne,

digel wateya esasî, wateyên mecazî û wateyên arîkar dibine xwediyê taybetmendiyan. Bi têkilî vê yekê zimanekî aîdî kesekî çêdibe û xwe di berhemên wî kesî de raber dike. Di vî zimanî de, bi 'emilandina çand, zewq, zîzî û îmkanên rewşa rûhî ya xwe, qalibên îfadeyên xasî xwe çêdike. Bi vê hêlê ve bê nêrîn, ne tenê di metneke nivîskî de, di heman demê de di berhemeke devkî de jî zimanekî hunermend, yê xasî wî çêdibe û ev taybetî di berhema wî de jî tê pêşkêş kirin. Berhemên edebiyata devkî bi zimanê gel hatine honandin. Ji ber vê yekê ye bi sedan salane wenda nebûne, gêhiştine roja me. Ev rewş di dema me de jî didome. Yên berhemên gelêrî çêdikin, zimanê gel, zimanê herêmê bikartînin, taybetiyên zimanê gel bi hêsanî di berhmenên xwe de pêşkêş dikin (Kardaş, 2013: 127).

Zimanê heyranokan, zimanekî gel jê fêm dike ye. Ji ber ku heyranokbêj keç û xortên civakê ne, di nav gel de mezinbûne, di nav çanda gel de gihîştine; li gorî dorhêla çanda xwe heyranok honandine, peyvên di zimanê gel de cîgirtî bi kar anîne. Ji ber vê yekê jî di heyranokan de peyvên biyanî zêde nehatine şixulandin, hebin jî rêjeya wan gelekî kêm in. Di heyranokan de peyvên ku wateya wan ji hêla herkesî ve têne zanîn hatine tercîh kirin.

Ristarên heyranokan kesên ji gel in û heyranokên xwe bi zimanê gel honandine. Zimanê jiyana rojane bi hemû haybetmendiyên xwe ve di nav heyranokan de heye. Bi bandora vê yekê jî axaftinên rojane, derbirînên jidil, gotinên herêmî, gotinên qalibî, biwêj û gotinên pêşiyan û hwd. gelek hatine bikaranîn. Loma jî zimanê heyranokan nêzî zimanê axaftina rojane ye. Ji ber ku piraniya heyranokbêjan nexwende bûne, zimanê gel yê axaftinê 'emilandine û ev ziman, zimanekî siruştî ye.

Ziman û şêwaza ku di heyranokan de hatiye bikaranîn, li gorî yên heyranok honandine û yên bûne muxatabê heyranokan, ketiye şikl û rengekê. Dundes, vê mijarê wiha rave dike: Her cure ûnsurên vegotinê/devkî, divê li gorî tevn(texture), metn(text) û dorhêl û şertûmercên (context) wê bêne terîf kirin. Ji van hersê tiştan bitenê bi yekî ne mumkun e ku cureyek bikaribe bê terîfkirin. Cureyek tenê bi çavdêriya van hersê tiştan pevre dikare bi awayekî têr û tekûz bê terîfkirin. Dem û wext her û her diguhere û diperise, bi têkilî vê yekê pêdivî û şertûmercên civakê jî duguherin û diperisin. Loma jî cureyekî vegotinê li gorî taybetiyên konteksa/dorhêla ku tê de dijî û belav e, dikare bê

terîf kirin. Berhemek di nava civakekê de, li gorî şertûmercên civakê, dizê, mezin dibe û diperise ( 2014: 41).

Di heyranokan de peyv û gotinên herêmî gelek in. Ango weke helbesta klasîk zimanekî standard nayê 'emilandin. Heyranok li gorî herêmê, li gorî devoka herêmê têne honandin. Ango her heyranok ji hêla zimanî ve xasî herêma xwe ye. Heyranokbêj kesên ji gel in û li gorî dorhêla çanda xwe digîjin. Tiştekî siruştî ye ku peyv û gotinên herêmî, devoka herêmî di heyranokan de hebin.

Heyranoka jêr bi zimanekî herêmî hatiye honandin. Ew kesê ev heyranok ristiye ji herêma Badînî ye. Jixwe ev yek li heyranokê jî diyar e. Di risteya pêncem de "çavêt min kore bin" derbas dibe. Di kurdiya standard de weke "çavên min kor bin" tê gotin. Û dîsa di risteya dawîn de "li kîve ye" derbas dibe. Ev gotin jî gotineke herêmî ye, di devoka Badînî de tê bikaranîn. Standarda vê gotinê weke "li ku ye" an "li ku derê ye", ye. Ji ber ku ev heyranoka li herêma Badînî zaye, bi zimanê herêmê hatiye neqişandin.

Rêka rezî ber qible ye
Tiryê rezî balete ye
Bejna min vê'evdala Xwedê
Çenda bilind e minare ye
Belê çavêt min kore bin
Bejna delalê lawkê min
Ez nizanim li kîve ye (Amîdî, 2010: 440)

Tecrube û çavdêriyên salane bi şiklê gotinên pêşiyan dikevine qalibekî, ew tecrube û zêrevanî di nava xwe de şîret û hukmekî dihewînin. Ji ber ku bi gotinên kêm û kurt, tiştên zehf û dirêj vedibêjin, hem di jiyana rojane de hem jî di berhemên edebiyata gelêrî de têne bikaranîn. Di heyranokan de gotinên pêşiyan derdikevin pêşberî me. Heyranokbêj gotinên qalibî yên gel jê hezdike, raxbetê lê dike bi kar tînin û hetta, peyv û gotinên nû jî diafirînin.

Di edebiyata gelêrî de biwêj, bi mebesta helbest zindîtir be, vegotin çalaktir be têne bikaranîn. Di heyranokan de jî biwêj têne bikaranîn. Ji bilî biwêjên li her derî têne bikaranîn, biwêjên xasî wê herêmê jî têne bikaranîn.

Lava û nifir di ristên heyranokan de bi awayekî belav derdikeve pêşberî me. Ji lavayan bêtir, nifir weke sembolekî cihê xwe heye. Evîndaran, dema berhemberî eşqa

wan pûç derketiye, li hemberî niheqî, bêçaretî, xiyanet û bêsoziyê hestên xwe bi nifiran anîne ziman.

Dîsa heyranokbêjan ji bo derbirinan ji hêla wateyê ve xurtir bikin, bondora wê zêdetir bikin û herheyîna kirinekê nîşan bidin ji dubareyan îstîfade kirine.Di heyranokan de, hem di heman risteyê de, hem jîdi heman bendê de, dubarekirina peyvên hevdeng, hemwate û dijwate hatine bikaranîn.

Di vê heyranoka jêr de gelek bêje û pêvek hatine dubarekirin. Peyvên ez û pêvekên me û ê di hemû risteyan de hatine dubare kirin. Bi vî awayî wate û aheng xurtir bûye.

9 Kuro gede ez girara dewteze *me*
*Ez ê* tijî pûnga Axlece *me*
*Ez ê* ji xelkê ra sed im sedisî *me*
*Ez ê* ji delalyê dilê xu ra bêpol û bêpere *me*

Di heyranokan de hunerên edebî jî di gelek cihan de hatine şixulandin. Di vê heyranoka jêr de gelek cure hunerên edebî hatine bikaranîn. Di risteya duyem de sê peyvên nêzî hev hatine bikaranîn. Bi bikaranîna peyvên gurz, çîmen û zevîyê hunera tenasubê hatiye sazkirin. Di risteya sêyem û ya dawiyê de peyvên dijwate hatine 'emilandin, ango bi peyvên par û îsal hunera tezatê hatiye sazkirin. Dîsa peyva dil du cara di heman risteyêde hatiye dubare kirin. Li vir hunera tekrîrê heye. Û di risteya dawîn de manendin heye. Têkçûna evînê bi daçeka mîna şibandiye wergerana dîzika denê ango dîzika rîs tê de tê boyaxkirin.

8 Kuro gede pezê te hejîya
Avêt gurz i çîmena, dor zevîya
Gede par vî çaxî dilê min te dil bû
Îsal vî çaxî bîna dîza denê wergerîya

Dîsa di helbesta gelêrî de kêşa kiteyî hatiye bikaranîn, lê di kêm cihan de derdikeve hemberî me. Piraniya helbestan bêyî kêşê, bi pîvaneke serbest hatine sazkirin. Ev rêbaz ji bo heyranokan jî derbasdar e, di piraniya heyranokan de kêş tune ye û weke rewşeke awarte, heyranokên bikêş jî hene. Lê herçiqas di heyranokan de kêş tune be jî, ji bilî çend rewşên awarte, di piraniya wan de hejmara kiteyên risteyan nêzî hev in. Li gorî vekolînên me di heyranokan de kêşa arûzê qet nehatiye bikar anîn.

Behremendiya heyranokbêjan, dorhêlên heyranok têne gotin, şikl û terzên vegotina heyranokan, guhdarvanên heyranokan, ziman û şêwaza heyranokan tayîn kirine. Heyranok li gorî asta dorhêla çandî hatine honandin. Di ziman û şêwaza heyranokan de peyvên di zimanê rojane de têne bikaranîn, yên weke; biwêj, gotinên pêşiyan, peyvên dubare, peyvên xurtbûnê sazdikin, taybetiyên şiklên kevneşop, hunerên edebî û terzên vegotinê hene.

## 2.3. HEYRANOK JI HÊLA NAVEROKÊ VE

Di heyranokan de jî gelek tema hene. Temaya bingehîn evîn e û temayên din jî, temayên bi evînê re têkilîdar in. Temaya evînê di edebiya klasîk de jî temayeke bingehîn e û ev evîn, evîna îlahî ye, lê di heyranokan de evîna beşerî hatiye bikaranîn.

Di heyranokan de temayên bi evînê re têkilîdar, weke hezkirin û berîkirinê jî pirr caran hatine bikaranîn. Ne tenê hezkirin û bêrîkirina mirovan di heman demê de ya siruştê jî derdikeve pêşberî me. Di heyranokan de di gelek ciyan de qala bedewbûn û xweşikbûna siruştê tê kirin, bi hezkirin û berîkirina yarê re, ya siruştê jî derdikeve pêş. Di mehên biharê de xweşikiya çiya, deşt, zozan û hewayê, di zivistanê jî barîna berfê, girtina mij û moranê li dora çiyayan, bilindbûna çiyayan û li hember van bûyeran, bêçaretiya evîndaran tê vegotin. Di navbera van de manendin tê sazkirin. Bi kurtî temaya siruştê bi hêlên xwe yên erênî û neyînî ji bo pêşkêşkirina evîn, hezkirin û bêrîkirinê dibe arîkar û rola temayeke eslî hildide.

Me li jor, bi gelemperî qala naveroka heyranokankir ku naverok; mijar, tema û wateyê jî dihewîne. Em ê li jêr libo libo li ser heyranokan bisekinin, ji tema, sembol, îmge, û motîfên di nava risteyên heyranokan de herî zêde derdikevine pêş, mînakan bidin û şîrove bikin da ku mijar safî bibe.

### 2.3.1. Mezmûnên Evîndariyê

#### 2.3.1.1. Ramûsan

Ramûsan di navbera du evîndaran de çêdibe, sembola hevşabûnê, gihêştinê ye. Di heyranokan de ev alegorî gelek cihan derdikevin pêşberî me. Heyran ramûsanê weke diyariyekê dibîne, dixwaze yara xwe ramûse. Hetta, ji ramûsanê re rêyekê dibîne ku ramûsana evîndaran ne guneh e.

57 Te keçikê zozanîyê
Tu keremke were ser kanîyê
Ez ê ramûsankî ´j te keremkim
Seva muhiba dila cînarîyê

Kuko dîno
Darkêd di hewşa me da darberrî ne
Bêhnekê were dev min rûne
Min pisyar kir ji şêx û mela got
Ramûsanêt kiça di helal in çi guneh tê'da nîne (Amîdî, 2010: 66).

Keçkê dînê, te çavreşê birî ser da
Kezî û bisk keftine ser qutkê qedîfe da
Ramûsanêt min û te xoştir in
Ji hemî war û hemî'erda (Amîdî, 2010: 66).

### 2.3.1.2. Gilî û Gazind

Di nav ristên heyranokan de hestên weke şikyat û gazincan gelek cihan derdikevin pêş. Ev gilî û gazind, caran ji yara bêwefa, caran ji qederê, carînan ji dêwbavan tê kirin. Ev hest hemû ji ber negihêştina hevdu ne. Dema jev veqetin, dûrî hev bin, negihêjine hev, gilî û gazind dibine tercimanê hestên wan.

45 Sîyarê bozê boza kewê
Kuro gede tu tu dera neke xewê
Xudê xirabike xastina te ez dixastim
Dayîna mala bavê min pê ra bû derewê

72 Min dil hebû te dil hebû
Keskî malê haj me nebû
Kuro gede çi bêbextî hebû
Li alyê te bû

11 Tu kurapê mîn î kero
Malê heft qirala, danzde dûwala xu da sero
Te ne 'z xastim ne 'z revandim
Dame yekî xelkê xerîb li heft bavê me jî dero

12 Tu qîzapa min kotîyê
Berê berda min gotîyê
Te yê digot ez ê nakim xubxutîyê

**2.3.1.3. Revandin**

Dema keç û xort ji hev hez bikin û ji bo zewaca wan astengî hebin, kurik keçikê direvîne. Di heyranokan de jî revandin gelek caran derdikeve pêş.

25 Min 'l vê taxê te 'l vê taxê
Sûretsorê albûyaxê
Were ez ê te 'brevînim bavêjim mala
Îsmaîlê Temo, Behrîyê Axê

63 Te çe'vreşê kanya kila
Sîwsê gulî nava mila
Ez ê werim te 'brevînim
Bavêjme Seydîbegê dêra fila

**2.3.1.4. Zewaca Bêdil**

Di jiyana rastîn de her wiha di heyranokan de jî zewac, hercar bidilê mêriv çênabe. Ev yek wesîleya xemgîniyê ye. Zewaca bêdil dibe sedem bo gilî û gazindan. Gilî û gazind li sebebkaran, şikyat ji vê rewşê tê kirin.

37 Hilma minê hilma mîhê
Porê min şerîta dor keştîyê
Xudê 'j dêwbavê min ra qebûl neke
Serê min dane ser be'lgîkî xerîbîyê

78 Lo êtîmo min sond xarye ez ê naçim çîya
Naçînim gulan i sosinên çe'vkanîya
Carekî dilê bêdil mutesel bû ez helîyam

Kurko dîno
Ez ne gul im ne bindeq im
Ez xezalek enîdeq im
Ketim ber darê mêrê pîs û çepel
Ne ez dimrim ne ez dipeqim (Amîdî, 2010: 43).

### 2.3.1.5 Evîna Bêsînor

Di heyranokan de sînor tune ye. Evîn li ser her tiştî re ye. Evîndar bo evînê her tiştî hildidin ber çav. Mirin û kuştin jî be, ji bo evîndaran ne xem e.

Kurko dîno
Çi şevşev e şeva min e
Takê lihêfê rake were bine
Kurko dîno yan girtin e yan kuştin e
Yan fermana serê min e (Amîdî, 2010: 61).

### 2.3.1.6. Evîna Bêencam

Her evînek encameke xwe heye. Encama evînê hercarê bi erênî nabe. Carînan evîndar nagihêjine hevdu. Ev jî dibe sedema gilî û gazindan. Carîna yek ji evîndaran li ser soza xwe nasekine, carînan dêwbav nahêlin evîndar bigihêjin hevdu. evîn bi awayekî diçe badilhewa û dibe sedema dilsojî û xemginiyê.

8 Kuro gede pezê te hejîya
Avêt gurz i çîmena, dor zevîya
Gede par vî çaxî dilê min te dil bû
Îsal vî çaxî bîna dîza denê wergerîya

96 Bêje te çe'vreşê heba tirî
Min heft sala qirox kirî
Salka heyşta xelkê ji me der hatî ´j xu ra birî

### 2.3.1.7. Mêvaniya Heyran

Di heyranokan de mijara mêvanbûna heyran gelek belav e. Xwesteka keçikê ew e ku şevekê heyran bibe mêvanê wê. Dê gelek qedrê wî bigire, jê re beranekî serjê bike. dê sing û berê xwe pêşkêşî heyran bike. Lê dê van tiştan bi dizîka bike da ku dêwbavê keçikê nebihîzin.

Kurko dîno
Were mala babê min bi mêvanî
Dê bû te danim mehwîrê Xoresanî
Dê serjêkem şekî digel beranî
Heket dêybabêt min pisyarkir
Dê bêjim gurgî xarin
Ji ber darê seybabê vî şivanî (Amîdî, 2010: 63).

48 Ez nexaş im were ser min
Perrê orxanê bilindke´bkeve ber min
Hekî dêwbavê min hatin gotin
Ez ê bêjim Qasidê Qoca Felekê hatye ser min

### 2.3.1.8. Evîna Veşarî

Li gor civakê kurik û keçikek dema ji hev hez bike, ev eşkere be û paşê keçik û kurik nezewicin, encamên nebaş derdikevin holê. Loma jî bi dizîka, bi awayekî veşarî ji dûr ve ji hev hez dikin. Carînan jî ji bo yek nebe asteng, evîna xwe li herkesî vedişêrin. Ev jî dibe sedema gilî û gazindan.

Hîn e sed car bi min hîn e
Riwê gundê min çendê şîn e
Ramûsanêt xelk û'alemê'elenî bûn
Yêt min û bejna bilind şev tariyê'l ber makînê (Amîdî, 2010: 52).

### 2.3.1.9. Soza Evîndaran

Ger evîn hebe, teqez soz û qirar jî hene. Evîndaran soz dane hevdu da ku ji bo eşqa xwe dilsoz bin, ji bo bigihêjin hevdu têbikoşin, çi ji destê wan were, bikin. Di nav ristên heyranokan de ev mijar gelek cihan de derdikeve pêş. Sozê evêndaran rasterast di

risteyan de cihê xwe digirin. Soza evîndaran ewqas mezin e ku heta dinya xirabe jî ne xema wan e. Şûna peyva sozê peyva ehd û qirar, qewl û qirar jî têne bikaranîn.

32 Min got dengê min dengizê
Ketye koka şîrê şîrhelizê
Ez ê terka qemera xu nakim
Heta Madî rabe, kantir bizê

92 Te qemerê min tev dayê
Zêrxizêma poz kutayê
Ez ê tu car terka qemera xu nakim
Heta zarke kurîn negre pêşê nebê dayê

Kurko dîno
Mîrê Şaxê
Rextûfîşek li ser kemaxê
Sê ehdûqirar li min ketibin
Yan bo te me yan bo axê (Amîdî, 2010: 46).

55 Birre pezê sorêcîn e
Nêryê 'egal pêşyê çûne
Xwedyê qewliqirara poşman bûne

**2.3.1.10. Xwerageriya Keçê**

Di heyranokan de taybetiyeke jina kurd derdikeve pêş. Ew jî xweragerî ye. Keçik jib o evîna xwe sekneke xwebawer nîşan didin. Keçik li pişt evîna xwe disekine. Şert ew e ku dilê wê gotiye. Kê çi bibêje bêfeyde ye. Xwedî li evîna xwe derdikeve.

Kurko dîno
Rêka gelî rêka min û te ye
Deryê rezkê mala babê te balete ye
Şertî dila min û te ye
Gotina fesad û nemana bêfeyde ye (Amîdî, 2010: 54).

5 Kuro gede Kurhesinî
Tu hem glu î hem sosin î
Dinya 'alem bibêje jî
Tu serdilka dilê min î

29 Gede dilê ´m bejna te dirêj e
Mîna takreyhana devê gelya şewq davêjê
Kuro gede bira dilê min te ´b dil be
Bila gundî cînar ji xu ra bêje

**2.3.1.11. Bîranînên Evîndaran**

Bîranînên evîndaran jî gelek caran dibe mijara heyranokan. Evîndar qala rojên berê yên xweş dikin. Tama wan rojan hêj li ser zimanê evîndaran e. Bi qalkirina bîranînan, hesreta rojên pevre borandine tê kirin.

Kurko dîno
Dilkê min çi nema negotî
Malkêt me bar kirin çêne astengê
Kerkêt me deynan mêrgêt sotî
Çi erd neman min û lawkê delal
Xeberkêt xweş lê negotî (Amîdî, 2010: 55).

Kurko dîno
Were were map eve ne
Şwîna reza pirêze ne
Hemî şwîn gevizkêt min û te ne (Amîdî, 2010: 55).

**2.3.1.12. Xatirxwestina Evîndaran**

Çawa bihevrebûna evîndaran sedema şabûnê ye her wisa jevveqetîn jî sedema êş û eleman e. Bi gelemperî jî vegera zozanan dema jevdûrmanê ye. Evîndar bêyî dilê xwe, xatirê xwe li hev dixwazin. Ev di risteyên heyranokan de gelek derdikevin pêş me.

Kurko dîno
Naçme zozana zozanêt xalî
Porra dixwînitin werdeka dinalî

Xelkû'alem ji zozana dizivirin bi dilxweşî
Ez zivirim bi lerzînk û nalî (Amîdî, 2010: 62).

69 Vê tirînê hereket kir
Vê wêranê hereket kir
Xu avête Şam û Heleb, Dîyarbekir
Kuro gede tu yî çûyî, te birîna dilê min teze kir.

### 2.3.1.13.Evîna Qedexe

Carîna jinên bimêr an jî mêrên bijin dikevine nav evîneke qedexe. Vê yekê rengê xwe daye heyranokan jî. Di heyranokan de ev mijar gelek caran derdikeve pêş. Lê ev wekî astengiyekê derdikeve pêş. Ji ber ku yar zewicî ye, gihêştin ne gengaz e.

13 Te qemerê fena çira
Xazî mêrê te bimira
Min ê helalîka Xudê
Tu 'l vî canî helal kira
Keçkê dînê
Ez kewek im ji kewêt nêr im
Ji nizara dihêm û li beroja dinêrim
Xelkû'alem aşiqê kiçka ne
Ez rebena Xwedê
Aşiqê bejna bilind jinabimêr im (Amîdî, 2010: 68).

### 2.3.1.14. Astengî

Di heyranokan de navbera evîndaran de pirrî caran astengî çêdibin. Astengî bi çiya, mij û moran, behrê hatine sembolîze kirin. Çiya, mij û moran, behr nahêlin evîndar bigihêjin hevdu. Lê di rastiyê de astengî ne çiya ne, ne mij û moran, ne jî behr e. Astengî bi van tiştan hatine veşartin. Dibe ku çînên civakî bin, dibe ku yek zewicî be, dibe ku malbat dijminê hevdu bin û hwd. Gilî gazind li van astengiyan têne kirin.

21 Keçê çîya bilind e te nabînim
Ez ê serê gulisosina naqetînim
Tu desmala xwe bavêje ez ê hilînim
Pê xemixîyalên dilê xu 'brevînim

76 Berrî berrî sed car berrî
Ez nizanim ji germê ye yan ji sermê ye
Na wele ji mîrata xurbetyê ye
Gedelawkê ´m rengê xu guherîye.
Gedelawkê ´m dike bê ye
Be'ra Wanê nade rê ye
Ez ê singê Avzema xu bikme keştî
Bira bide ser da bê ye

**2.3.1.15. Nexweşiya Yarê**

Di heyranokan de gelek caran ji evîndaran yek nexweş dikeve. Ev nexweşî ne nexweşiyeke şênber e, ev nexweşî, nexweşiya dilî ye. Xetereyeke mezin e. Nexweş dê ji ber derdê dilî bimire û xwesteka wî ya dawîn jî ew e ku berî mirinê bi cave serê xwe heyranê xwe bibîne.

49 Ez nexaş im pirr helak im
Hûnê gazî lawkê ´m taxa han kin
Hekî hatye jixu hatye
Hekî nehatye bavê wî bikujin
Pezê bavê wî talan kin

105 Ez nexaş im ta digirim
Ez girara bêkundur im
Roj bi rojê xirabtir im
Qenca ez dixastim xiraba ez ji xu ra birim

**2.3.2. Zewac**

**2.3.2.1. Hewî**

Di nav civaka kurdan de zewaca dujinî heta çend salên pêş jî gelek belav bû. Em vê rewşê di nav heyranokan de jî dibînin. Mêr carînan li ser jina xwe re jineke din tînin. Di heyranokan de bi piranî, jina pêşîn gilî û gazindên xwe li mêrê xwe an jî li hewiya xwe dike.

Ji welatî heta welatî
Ma mêr li te bibûne qatî
To li ser mêrê bi nîvî hatî (Amîdî, 2010: 44).

52 Kuro gede te ser min re girtî yar e
Heke li min rintir e li te bimbarek
Heke li min kotîtir e
Kula Mûşê û Helebê
Mala bavê te da rûnê salê carek

### 2.3.2.2. Berdêlî

Berdêlî gelek caran bêyî dilê keçikê çêdibe. Di heyranokan de jî mijara berdêliyê derdikeve pêş.

Kurko dîno
Çi êvar e roj mexreb e
Tasa li serî min ereb e
Ez berdêlîka birakê xwe me
Li hêviya min nebe (Amîdî, 2010: 58).

### 2.3.2.3. Qelen

Di civaka kurdan de qelen standin belav e. Bavê keçikê pereyekî giran pêş keçikê ve ji malbata zavayî dixwaze. Ev yek caran dibe astengî, carînan jî keçik bi zehfbûna buhayê qelenê xwe, xwe qure dikin, pê pesnê xwe didin.

10 Ez ê reş im biha nakim
Ez ê herim ce qelaçî xu qelakim
Ez ê qelenê çîla, çe´vreşa, bedewa ser xu rakim

9 Kuro gede ez girara dewteze me
Ez ê tijî pûnga Axlece me
Ez ê ji xelkê rea sed im sedûsî me
Ez ê ji delalyê dilê xu ra bêpol û bêpere me

#### 2.3.2.4. Şeva Xwazgîniyê

Şeva xazginiyê şeva diyarbûna encama evîna salane ye. Heyran tê keçikê bixwaze, ew şev bo evîndaran gelek şeveke dirêj e, tirsa negihîştinê jî gelek e. Dibe ku bavê keçikê bêje na. Ev yek di heyranokan de, bo evîndaran weke mirinê hatiye îfadekirin.

Çi şev e çi şev e
Şeva xazgîna
Ez ya nesax im ya li nav nivîna
Heke babê min ez dam jixwe ez dam
Heke ez nedam gazî melayî ken
Da 'l min bixwînin dewr û yasîna (Amîdî, 2010: 65).

#### 2.3.2.5. Çarenûs

Qeder û felek di heyranokan de gelek derdikevin pêş me. Evîn hebe, du encamên wê hene, yan erênî yan neyînî ye. Ger erênî be, cihê şanaziyê ye. Lê neyînî be, divê tiştek bibe sedem, ev jî feleka xayîn e. Di heyranokan de baweriyeke xurt li çarenûsê/ʻenînûsê heye. Caran evîndar ji hev re dibêjin; Xwedê ez bo te nivîsîme, ew nivîs nayê jêbirin. Ger hatibe nivîsîn dê wisa jî bigihêje encamê.

74 Wele navê min Seher e
Bille navê min Seher e
Singê min defter e,
Zimanê min qelem e,
Tûka min hibr e
Yazî muqeder e,
Etîmo gede navê te li ser e

### 2.3.3. Tema

#### 2.3.3.1. Xerîbî

Di heyranokan de temaya xerîbiyê cihekî girîng digire. Di nav ristan de ev tema gelek belav e. Evîndar ji hev dûr in, di navbera wan de gelek asteng hene. Carînan yar çûye eskeriyê, carînan çûye xebatê. Carînan jî çiya û behr rê nadinê da ku bigihêjine hevdu.

76 Berrî berrî sed car berrî
Ez nizanim ji germê ye yan ji sermê ye
Na wele ji mîrata xurbetyê ye
Gedelawkê ´m rengê xu guherîye.
Gedelawkê min dike bê ye
Be'ra Wanê nade rê ye
Ez ê singê Avzema xwe bikme keştî
Bila'bide serda bê ye

4 Kuro gede
Laçka serê ´m qîçik e
Zêrê hustuyê ´m çar niçik e
Wextê gedelawkê ´m li welatê xerîbyê tê
Tu divê beranekî heft gurçik e

**2.3.3.2. Mirin**

Di heyranokan de temaya mirinê jî heye. Mirin sembola negihêştinê ye. Mirin jevveqetînê çêtir e. Di dema saxiyê de qedirnezanîna yarê, bi mirinê re çê dibe. Evîndara dixwazin piştî mirinê jî evîna wan bidome.

50 Ez dimirim roja înê
Hûnê kevrê min bînin li Selîmê
Hûnê gîyayê min bînin ´l Gîhadînê
Hûne ava min bînin li Mêrdînê
Wextê ez ê mirim hûn ê destê gedelawkê min bigirin bînin nava şînê

51. Gede ez dimirim tu sebebî
Bila turba min derê mala bavê te bî
Wextê ez ê mirim tu yê bêje
Wey mirîyo rihme´l te bî

### 2.3.4. Sembol

#### 2.3.4.1. Çûna Leşkeriyê

Çûna yarê bo leşkeriyê bûye mijara gelek heyranokan. Çûna lêşkeriyê sembola jevdûrketinê ye. Leşkerî astengek e di navbera evîndaran de. Ne tenê bo keçikê her wiha ji bo dêwbavê kurik jî wesîleya xemginiyê ye.

26 Hîv derketîye hîva kerî
Hîvê xu da ser tabûra vî eskerî
Gotne min da gedelawkê te yê were îznê
Mi nebawer î

36 Wey eskero wey eskero
Dê ′b axîno bav′b kesero
Heke hûn gedelawkê min naznakin
Ew eskerê kincê wî zero

#### 2.3.4.2. Tirên

Di heyranokan de gelek caran em rastî peyva tirênê tên. Tirên semboleke; caran temsîla jevveqetînê ye carînan temsîla gihîştinê ye. Tirên yarê hildide dibe cihekî dûr, hestên xerîbiyê nîşan dide.

102 Tirên hato minare kir
Lawêm borî min nas nekir
Heyla′l minê min rebenê
Tirên hato′l alyê xetê
Bihar e eskerê xelkê hato bi xêr û şahî
Eskerê min'evdala xwedê hatî bi dilmayî

69 Vê tirînê hereket kir
Vê wêranê hereket kir
Xwe avête Şam û Heleb, Dîyarbekir
Kuro gede tu yî çûyî, te birîna dilê min teze kir

### 2.3.4.3. Xwesî

Di heyranokan de fîgûrên bûk û xwesiyê gelek derdikevin pêşberî me. Têkiliya bûk û xwesiyê heye û ev têkilî caran têkiliyeke nebaş e, bûk li xwesiyê nexaş e. Lê car caran jî bûk ji xwesiya xwe hez dike. Xwesî, ji ber ku dayîka hayran e, qîmetdar e.

54 Kuro tu nebêje dayka min ra metê
Kuro gede dayîka min dewsa xasya te tê
Kuro´j min re ‘eybe
´J te ra çiqas bêjî guneh jê tê

58 Ez helîyam bûme şima
Heval i hogirê dora min, ker bûn negotin çima
Derdê mêrê kotî, xasya tima

Kurko dîno
Ez li gund î ti ´l bajêr î
Bergîzê şîn te ´l berkirî
Ez gorî wê daykê bim
Ya tu bo min xwedan kirî (Amîdî, 2010: 66).

### 2.3.4.4. Hîv

Dîsa gelek heyranok li ser hîvê hatine honandin. Hîv ronahiyê temsîl dike, sembola ronahiyê ye. Çawa hîv tariya şevê bela dike, her wiha tarîtî û geloyên di navbera evîndaran de jî ronî dike.

19 Hîv derketye hîva zer e
Minê pêşa mêzera xu da ber e
Heçyê orta her du dila, her çar çava da pîs xeberde
Ew ne ´l ometa Pêxember e

77 Hîv derketye hîva sava
Hîv xeyîdye naçe ava
Xazî îman i Qur’anê
Gedelawkê mi ´l ser sing i berê ´m biba zava

### 2.3.4.5. Bekotî

Wekî tê zanîn Beko di destana Memê Alan de yekî fesad e û sembola fesadî û neyariyê ye. Di nav heyranokan de jî ev sembol gelek ciyan tê bikaranîn. Hewqas belav e ku navê fesadiyê bûye bekotî û navê fesadan jî bûye bekirok. Bekirok; fesad in, bêbext û derewîn in. Di navbera evîndaran de tiştên nebaş dikin. Dixwazin wan jev veqetînin.

Lawkê mino
Kanîkêt gundê me çid şîn in
Li rex û bera hemî sîsin û beybwîn in
Kuro dîno li mabeyna me Bekirok û fesad gelek in
Tu bi gotina kesê neke
Xird bêbext in direwîn in (Amîdî, 2010: 284).

19 Hîv derketye hîva zer e
Minê pêşa mêzera xu da ber e
Heçyê orta her du dila, her çar çe'va da pîs xeberde
Ew ne'l ometa Pêxember e

Hurmet xwîşka Tahir î
Ji wêne têt wekî koremar î
Fitna mezin wê helkirî
Dî çite cehnemê nav agirî (Amîdî, 2010: 52).

### 2.3.4.6. Çûna ser Kaniyê

Çûna keçikê ya ser kaniyê sembola hevdîtinê ye. Di jiyana rojane ya gundan de li nava gund kaniyek heye û keçikê gund diçin li kaniyê avê tînin û keç û xort wiha hev nas dikin, hev dibînin û dilê wan dikeve hevdu. Ger bixwazin hev bibînin çûna ser kaniyê dibe behaneyekî. Ev sembol di nav risteyên heyranokan de gelek belav e.

35 Sibe ye sura sibê bêna bê tê
Kanî dûr e muhiba dilê 'm li avê tê
Bejna zirav, kembera zîvîn, qolê zêra çawa lê tê

57 Te keçikê zozanîyê
Tu keremke were ser kanîyê
Ez ê ramûsankî ´j te keremkim
Seva muhiba dila cînarîyê

### 2.3.5. Motîf

#### 2.3.5.1. Cilûbergên Berê

Di heyranokan de bi her hêlê ve jiyana gel û motîfên wê serdest in. Di nava ristan de gelek cihan qala cilûbergên berê tê kirin. Peyvên weke; dêre, fîstan, kiras, xiftan û hwd. desbas dibin.

47 Dêre çîtê dêre kobe
Bes bigere obe obe
Kuro gede ´j te ra şerm e
´J mi ra tobe

3 Kuro gede min li pîkî te li pîkî
Ava gundê me dikişe heft newala, Suphangolê tev gelîkî
Qîzê mala bavê min dêrê wan e çiftexasê xasçirpîkî
Kuro gede qe kesî dewr i zemanê kevn da nedîtye,
Du serê çê tev biçine ser be'lgîkî
Dosta delal, di ber xanîkê me ra borî
Min nezanî ew çi kes e
Kiçkê dînê te kiras kitan e, fîstan etles e
Xwezî ji xêra xwedê ra
Tu bûka mala babê min ba
Min ji ked û malê dinyayê bes e (Amîdî, 2010: 75).

#### 2.3.5.2. Xizêm

Di heyranokan de xizêma yarê motîfek e, bedewbûna yarê îfade dike. Gelek caran kurik bi xizêma yarê pesnê yarê dide, carînan keçik pesnê xwe û xizêma xwe dide. Heta caran ji bo xizêma yarê mêr jî têne kuştin.

15 Te qemerê tev kutayê
Zêrxizêmê poz hildayê

Ez ê terka qemera xu nakim

Heta dergûş negire pêşê nebê dayê

77 Kuro gede neçe Wanê Wan dudu ne

Serê rêya Wanê mêr kuştine

Seva xizêma pozê min e

**2.3.5.3. Motîfên Kevnare**

Ji ber ku heyranok berhemên folklorîk in, 'urf, 'edet û kevneşopiyên civakê nîşan didin. Di nav ristên heyranokan de gelek motîfên kevnare yên weke, kon, çît, xiftan, teşî, dîza denê û hwd. derdikevin pêş.

Mala bar kir hore hore

Kon vegirtin çît dan dor e

Kin ya rind e xiftan sor e (Amîdî, 2010: 75).

8 Kuro gede pezê te hejîya

Avêt gurz i çîmena, dor zevîya

Gede par vî çaxî dilê min te dil bû

Îsal vî çaxî bîna dîza denê wergerîya

**2.2.5.4. Hesp**

Di heyranokan de motîfeke sereke jî hesp e. Herkes nikare bibe sîyarê hespa boz. Encar heyran dikare lê siyar be. Ev sedemê pesnê ye. Kurik li hespê siyar dibin û keçik li bejn û bala wan dinêrin. Keçik ne tenê pesnê yarê dikin, pesnê hespa yarê jî dikin.

44 Sîyarê bozê boz birçî kir

Şara serê 'm çar qamçî kir

Kuro gede te yê seva derdê dilê rezîl

Herçar malê Kosa ricaçî kir

43 Lawkê min sîyarê cenya qer e

Zînizengî zêrêzer e

Kuro gede 'b min ra bezewice

Ocaxa Sînê Nexel e

### 2.3.5.5.Şivan

Di heyranokan de motîfa şivan gelek cihan derbas dibe. Yar şivan e, li bilûrê dixe, diçe ber nehdeh semerr pez. Şivantî tiştekî baş e. Keçik bi şivantiya yarê şanaz e. Bi vî awayî pesnê yarê dike.

88 Kerî pezê qijbeleko
Girtye zevya zegereko
Pez hezar e şivan yeko

24 Gedelawkê min şivanê hûrkavira
Kavir kirin danzde birr a
Hûn Xudê kin hûn ê gedelawkê min nekin tu nifira
Gedelawkê min piçûk e çaxê min ra

### 2.3.5.6. Pale

Di heyranokan de motîfa pale jî gelek belav e. Keçik bi paletiya yarê dilşad e, bi vî awayî pesnê wî dide. Paletî nîşana jêhatîbûnê ye. Serhonaz jî serokê pala ye û paleyê herî jêhatî ye.

40 Çi palekî gulomilo
Destyê dasa te zengilo
Tu yê were ji mala bavê min ra
Bixebite 'b eşqidilo

42 Mêrga mala bavê min mezin e
Pala girtye serobin e
Serhonazî lawkê min e

### 2.3.5.7. Qemer

Di heyranokan de qemerbûn bi du awayan derdike pêş me. Carînan qemerbûna keçikê tiştekî nebaş e. Ji ber ku qemer e, buhayê wê kêm e lê carînan jî sedemê pesindanê ye. Qemerbûna yarê nîşaneya bedewbûnê ye.

92 Te qemerê min tev dayê
Zêrxizêma poz kutayê

Ez ê tu car terka qemera xu nakim
Heta zarke kurîn negre pêşê nebê dayê

81 Ez ê çûme taxa jêrîn di taxê da
Meşyame taxa jêrîn di taxê da
Xazla mala lawkê qemer tê da
Serê min xulama zendê zerbadayî si'et tê da

### 2.3.6. Hin Nigaşên Din

#### 2.3.6.1. Nifir

Nifir û lava çanda miletî ya daringî û arîşen, baweri û nirxên civakê dide pêş. Di heyranokan de nifir gelek caran derdikevine pêşberî me. Nifir, caran ji kesên di navbera evîndaran de 'ewaniyê/fesadiyê dikin, caran ji yara bêbext û bêsoz û carînan jî nifir ji bilî yarê li herkesî têne kirin.

101 Kanya gundê me lûle ye
Ser de bin de makîne ye
Heçî ara min û gewra min de xeber bide
Xêrê nebîne 'j bedena xwe ye

83 Lo lo gede qurban min te divê te min navê
Ez ê di kavilê gunda da cihabê bişînim ser cihabê
Heger gede hatye jixu hatye
Heger nehatye belkî li bedena wî na bizê tasek ava zer e zerxunavê

62 Şemşedîna di korê da
Sîwsê malê di dorê da
Qir bikevê kul bikevê
Xêncî mala yara 'm tê da

#### 2.3.6.2. Siruşt

Di heyranokan de regezên siruştî gelek belav in. Peyvên weke: Çiya, çem, kanî, mêrg, zozan, zevî, gurz, delav, guher, çîmen, kevir, zinar, gelî, bîr, bihar, zivistan, şev, roj, sube, hîv, stêrka subê, çavkanî, sî, rewnaq, şewq, 'ewr, hindav, cew, aş, kor, kendal û hwd. di nav risteyên heyranokan de derdikevin pêşberî me.

61 Şewityê gundê me Pîrkal e
Xopanê gundê me Pîrkal e
Binî da cewê aşan in
Hustu da korikendal in
Gulsosina li ser hev da nalenal in

8 Kuro gede pezê te hejîya
Avêt gurz i çîmena, dor zevîya
Gede par vî çaxî dilê min te dil bû
Îsal vî çaxî bîna dîza denê wergerîya

### 2.3.6.3. Bûyerên Dîrokî

Heyranok cureyekî helbesta gelêrî ye. Hemû nexş û rastiyên jiyana gel di nav ristên xwe de dihewîne. Her wiha mirov di nava ristan de rastî nimûneyên ji dîroka gel jî tê. Di heyranoka jêr de behsa komkujiya Enfalê hatiye kirin. Dilketyê keçikê li Enfalê şehîd ketiye. Keçik ji hêla vê heyranokê êş û azarên dilê xwe ristiye, gilî û gazindên xwe li bextê xwe û gedelawkê xwe kiriye.

Erê kuro kurêxalê
Li min berze bûy evê salê
Xelk û'alem ji êk şahî bûn
Delalê dilê min bû şehîdê vê Enfalê (Amîdî, 2010: 67)

### 2.3.6.4. 'Erdnîgarî

Di heyranokan de qala 'erdnigariya deverê tê kirin. Navên gelek çiya, gund û bajar, çem, zozan û hwd. derbas dibin. Di heyranokên ku me li qadê berhevkirî de gelek navên 'erdnigariya Kurdistanê yên weke; Behra Wanê, Artemêrt, Suphangol, Axlece, Çemê Payê, Çemê Kurrê, Selîm, Gîhadîn, Mêrdîn, Mûş, Heleb, Rihan, Pîrkal, Seydîbeg, Qerecix, Şemsedîn, Şam, Diyarbekir, Wan û hwd. derbas dibin.

69 Vê tirînê hereket kir
Vê wêranê hereket kir
Xu avête Şam i Heleb, Dîyarbekir
Kuro gede tu yî çûyî, te birîna dilê min teze kir.

70 Ez dimirim roja înê
Hûnê kevrê min bînin li Selîmê
Hûnê gîyayê min bînin 'l Gîhadînê
Hûne ava min bînin li Mêrdînê
Wextê ez ê mirim hûn ê destê gedelawkê min bigrin bînin nava şînê

#### 2.3.6.5. Xwezî

Peyva xwezî, tê serê hevokên daxwazê îfade dikin. Tê watey; daxwaza min ev e ku. Di heyranokan de ev hest gelek belav e. Di gelek ristên heyranokan de derdikeve pêşberî me.

18 Çemo çemo çemê Payê
Çem dikişe bîna bayê
Xazî yekî mizginîke xêrê bida min da
Bigota Gulê bûye bûka Husnayê

103 Dilê'm sîka zinêr kevrê birrî
Sînga sibê lê da ya êvarê lê zivirrî
Xazya min ji wî'evdî hatî
Bi çe'vê xwe dîtî, bi dilê xwe mêrkirî

#### 2.3.6.6. Erotîzm

Erotîzm di heyranokan de gelek tê bikaranîn. Lê erotîzm bi piranî li ser sing û bera ava dibe. Carînan keçik bi bedewbûna sing û berê xwe pesnê xweşikbûna xwe dide. Carînan dixwaze sing û berê xwe pêşkêşî yarê bike. Sing û ber, gihêştina hevdu îfade dike, encama evînê ye.

20 Hîv derketîye hîva sava
Hîv xeyîdye naçe ava
Xazî îman i Qur'anê
Gedelawkê mi 'l ser sing i berê 'm biba zava

70 Kuro gede neçe Wanê tê Wanî bî
Avê gola nexwe tê genîbî
Tu yê were ser sing i berê min razê
Tê cinetî bî

108 Wele navê min Nîgar e
Bile navê min Nîgar e
Sing i berê min kanîka avasar e
Mêrkê Mûskî sala îsal, mi ra derket bêîtbar e

### 2.3.6.7. Flora

Navên dar û ber û gihayan di nav risteyên heyranokan de gelek tê bikaranîn. Ji bo pesnê yarê bê dayîn, gelek caran dibine alavekê. Navê weke: Reyhan, gul, sosin, çîçek, kurdirê bejî, sêv, dartûyîn, piltan, tirî û hwd. derbas dibin. Bejna yarê weke darekê an tayeke reyhanê, çavê yarê weke hebê tiriyê ne. Porê yarê bêhna gul û sosinan dide.

80 Min sond xarye ez ê naçim çîya
Naçînim gulan i sosinên çe'vkanîya
Gede meriv sozê xu bide tixikê fila
Nede van êtîmê jinebîya

29 Gede dilê ´m bejna te dirêj e
Bîna takreyhana devê gelya şewq davêjê
Kuro gede bira dilê min te ´b dil be
Bira gundî cînar ´j xu ra bêje

### 2.3.6.8. Faûna

Di nava heyranokan de navê lawitan/ajalan jî gelek in. Peyvên weke; kevok, quling, pez, kavir, nêrî, bizin, mîh, qantir, gur, tîremar, teyr, teyrê serberatî, teyrtawus, cehnî, boz, bergîr, dîk, minminîk û hwd. Ev her yek xwediyê taybetiyekê ne. Bêxemiya yarê weke bêxemiya gur e, bedewiya wê weke teyrê tawus e, desmala yarê weke perê minminîkê tenik e.

30 Pezê nîvro hate dana
Nêrya pêkutaye ser şivana
Min got ez kurbana tilîpêçkê bilûrvana

23 Kuro gede min qîzxatî te kurxatî
Were em ê bibin cote teyrê serberatî
Em ê heram bikin naniavê vî welatî

#### 2.3.6.9. Çînên Civakê

Dema em heyranokan vedikolin wekî hemû berhemên edebiyata gelêrî, peyamên civakî dide me. Jiyana rojane, rewşa civakê rût û tazî li ber çavan e. Çawa di civaka rastîn de zengîn - kasib, mîr - xulam û hwd. hene, di nava heyranokan de jî ev tev hene. Çînên civakê, asta di navbera kesên civakê de, bi awayekî eşkere rû didin.

28 Çemê Kurrê lemelem e
Kevrê ortê çarkelem e
Kurê kerê durî ´m here
Ez ne sêva devê te me

Kurko dîno
Ji malêt mîra
Heneka neke li kiçkêt feqîra
Malbata te ji malbata me gelek dûra (Amîdî, 2010: 42).

#### 2.3.6.10. Navên Şexsan

Dîsa di heyranokan de gelek navên taybet hatine bikaranîn. Dema heyranok ji kesan bo kesan veguhêzîne, navên di nav heyranokan de ji hêla wan kesan ve hatine guherîn û li gorî rewşa xwe nav hatine bikaranîn.

66 Sîyek hate ser kulekê
Rewneqê xu da bejna çe'vbelekê
Min dît eva sîya Şîyar Begê

74 Wele navê min Seher e
Bille navê min Seher e
Singê min defter e,
Zimanê min qelem e,
Tûka min hibr e
Yazî muqeder e,
Êtîmo gede navê te li ser e

### 2.3.6.11. Dijûn

Di heyranokan de dema keçik an xort ji hev hêrs dibin, ji hev re dijûnan dibêjin, ev yek di gelek heyranokan de tê dîtin.

28 Çemê Kurrê lemelem e
Kevrê ortê çarkelem e
Kurê kerê durî ′m here
Ez ne sêva devê te me

### 2.3.6.12. Sond

Di heyranokan de sond jî gelek ciyan derdikevin pêş. Evîndar kesan didine sondê da ku tiştên nebaş nebêjine yarê, nifiran li yarê nekin.

24 Gedelawkê min şivanê hûrkavira
Kavir kirin danzde birr a
Hûn Xudê kin hûn ê gedelawkê min nekin tu nifira
Gedelawkê min piçûk e çaxê min ra

31 Çûme Enqera şewitî qûma şîn e
Hemû usteymen in yuzbaşî ne
Hûn Xudê kin hûn ê gedelawkê min nexin neêşînin
Gedelawkê min nazik e nazenîn e.

### 2.3.6.13. Pesin

Meth û pesin di gelek heyranokan de derdikevin ber me. Ji ber ku mijara heyranokan evîn û evîndarî ye, evîndar bi her hêlê ve hem pesnê xwe didin hem jî pesnê heyranê didin. Pesnê yarê bi gelek hêlan ve tê dayîn. Caran behsa bedewbûnê, rindbûna bejnûbalê, çav û biriya tê kirin, carînan jî behsa jêhatîbûnê heye.

35 Sibe ye sura sibê bêna bê tê
Kanî dûr e muhiba dilê ′m li avê tê
Bejna zirav, kembera zîvîn, qolê zêra çawa lê tê

38 Ez ê teyr im teyrtawis im
Li zozana li çîmena dilemisim
Ez ê ser ra qurs im, bin ra diteyîsim

74 Wele navê min Seher e
Bille navê min Seher e
Singê min defter e,
Zimanê min qelem e,
Tûka min hibr e
Yazî muqeder e,
Êtîmo gede navê te li ser e

98 Bêje te çe'vreşê heba tirî
Min heft sala qirox kirî
Sala heyşta miskînê mêra 'j xu ra birî
Kiçkê dînê
Kezîzerê, bejnbilindê, navteng'zravê, reşesmerê
Ez xulama wan kezî û biska
Yêt şor bîne kêleka wê kemerê (Amîdî, 2010: 35).

### 2.3.6.14. 'Edetên Xirab

Mixabin wekî hemû civakan ''urf û 'edetên neqenc li cem kurdan jî hene.Yek ji wan jî ev e ku keçikeke ciwan didine mêrekî pîr. Ev ne bi dilê keçikê ye lê qewimînên bi vî awayî kêm jî bin çêdibin. Ev 'edetên xirab bûne mijara heyranokan jî.

Weyla li minê li vî'edetî
Çi êqbal e rebena Xwedê ketî
Min nezanî dê min dene
Êkî sersipî û didanketî (Amîdî, 2010: 59).

## 2.4. HEYRANOK JI HÊLA HUNERÊN EDEBÎ VE

Bi gelemperî edebiyat, lê bi taybetî jî helbest hunera bikaranîna gotinê ya karîger, bibandor, tîr û xweşik e. Mirovan bi sedan salan ziman şixulandine û bi vî awayî dewlemend kirine. Xwestine zimanî bikine amûrekê ku ragihandinê bîne asteke xweşiktir. Bi borîna demê re wêjevanan bi saya şixulandina zimên, ziman ji şêweyeke yekdîmenî û yekwateyiyê derxistine û kirine teşeyeke ji yekî zêdetir wate û dîmenan dihewîne. Bi vî awayî ziman, amûreke ragihandinê ya hişk û tazî wêdetir, bûye

kompozîsyoneke bi dengê xwe biaheng, bi wateya xwe kûr û dewlemend, bi naveroka xwe tîr û bi dîmena xwe xweşik (Çetin, 2012: 203).

### 2.4.1. Hunerên Edebî

Hunerên edebî, bi armanca ezimandina hemû cure wateyên zimanî yên rastîn û sembolîk, bi gotineke kêm, îfadekirina gelek tiştan, sazkirina têkiliyên wate û bibîrxistinê, ji hêla şiklî ve sûdwergirtina ji herf û bêjeyan û îstîfadekirina nirxên dengî hatine çêkirin. Weke berhemên hestên tenik û nazik, jîrekiyên xurt û zîziyên estetîk derketine meydanê. Di edebiyata kurdî de nemaze ya klasîk de ji rojên pêş heya vê rojê hunerên edebî xwediyê roleke girîng in. Hunerên edebî di nav risteyên heyranokan de jî gelek belav in.

#### 2.4.1.1. Manendin (Teşbîh)

Ji bo wate bihêztir û xurtir be, hunera manendina herî kêm du ûnsuran e. Divê di navbera wan ûnsuran de ji hêla hin taybetiyan ve têkiliyên rastîn an jî mecazî hebin û ji wan ûnsuran ya ji hêla wesfê ve lewaz, manendî ya bihêz dibe. Di hunera manedinê de bi piranî daçekên weke; mîna, wek, fena, nolanî, nota/notila, hafî, mîtanê têne bikaranîn. Di hunera manendinê de çar ûnsur hene. Manende, lêmanende, daçek û hêla manendinê. Divê manende û lêmanende teqez hebin û hebûna daçek û hêla manendinê ne pêwist e, hebe jî dibe tunebe jî (Öcek, 2016: 71).

Di vê heyranoka jêr de hunera manendinê heye. Heyranokbêj daçeka mîna(bîna) yê bi kar aniye û bejna yara xwe ye kin şibandiye tayê kulîlka reyhanê.

1 Gede dilê 'm bejna te kinik e
Bîna takreyhana devê gelya sergupik e
Kuro gede were bira dilê min te 'b dil be
Bira gundî cîran xu ra bike kînirik e

Di vê heyranoka jêr de jî hunera manendinê heye. Çavê yarê ji hêla reşbûnê manendî kaniya kilî kiriye.

63 Te çe'vreşê kanya kila
Sîwsê gulî nava mila
Tu yê were mi 'brevîne,
Bavêje Seydîbegê dêra fila

Di heyranoka jêrîn de heyranokbêj pesnê xwe daye û hunera manendinê bi gelek awayan ve bi kar aniye. Singê xwe manendî defterê, zimanê xwe manendî pênûsê û tûka xwe manendî hibrê kiriye.

74 Wele navê min Seher e
Bille navê min Seher e
Singê min defter e,
Zimanê min qelem e
Tûka min hibr e
Yazî muqedder e
Etîmo gede navê te li ser e

Li jêr hunera manendinê hatiye bikaranîn. Heyranokbêj keçik e û sing û berê xwe bî hêla xweşikbûnê şibandiye kaniyeke ku ava sar lê dizê.

108 Wele navî min Nîgar e
Bile navê min Nîgar e
Sing i berê min kanîka ava sar e
Mêrkê Mûskî sala îsa, mi ra derket bêîtbar e

### 2.4.1.2. Îstî'are

Dema peyvek ji bo şibandinê di şûna peyveke din de tê'emilandin, dibe îstî'are. Kakilê vê hunerê mecaz û manendin e. Di îstî'areyê de ji manende û lêmanendeyê bi tenê yek tê gotin. Di îstî'areyê de divê; peyv derveyî wateya xwe ye rastîn bibe navê maddeyekê an têgehekê, tu rê tunebe ku peyv di şûna wateya xwe de bê bikaranîn û mebesta manendinê hebe (Çetin, 2012: 203).

Di vê heyranoka jêr de hunera îstî'areyê hatiye bikaranîn. Di vir de mebest bi gulê yar e û sosin jî porê yarê ye. Yar weke gulê bedew e û porê yarê mîna sosinan xweşbêhn e. Mebesta manendinê heye.

21 Keçê çiya bilind e te nabînim
Ez ê serê gulisosina naqetînim
Tu desmala xu bavêje ez ê hilînim
Pê xemixîyalên dilê xu birevînim

Di heyranoka jêr de jî hunera îstî'areyê hatiye'emilandin. Li vir mebest bi bayê bûyerek an qewimîneke nebaş e. Ew bûyer weke bayekî hatiye zerar daye evînê. Bejna yarê weke darekê xweşik û bedew e. Mebesta şibandinê heye.

Bejna te xoxika xemlandî
Bakek hat û pelik jê werandî
Înşela Xwedê mala sebeb û sebebkaran xirab bike
Hekû em ji êk qatandî (Amîdî, 2010: 296).

#### 2.4.1.3. Kînaye

Bikaranîna peyvekê bi mebesta wateya wê ya mecazî bê fêmkirin e, lê dibe ku wateya wê ya eslî jî bê fêmkirin. Ango ji gotina bi awayekî sergirtî û neyekser, meqseda eslî îfade dike re kînaye tê gotin. Lê mebesta bingehîn weteya mecazî ye. Dema mirov nexwaze mebesta xwe rasterast eşkere bike, tê bikaranîn (Soldan, 2013:68).

Di vê heyranoka jêrîn de hunera kînayeyê hatiye bikaranîn. Di risteya pêşîn de bilindbûna çiya hem di wateya xwe ye eslî de hem jî di wateya mecazî de hatiye bikaranîn. Çiya birastî jî bilind in û eger navbera du kesan de çiyayek hebe dibe asteng ku hevdu bibînin. Hem jî wateyeke mecazî dihewîne. Dibe ku astengî ne çiya be. dibe ku li hev dûrbûn, an astengiyeke civakî be. Çiya li vir bi wateyeke macazî şûna astengiyan hatiye bikaranîn.

21 Keçê çiya bilind e te nabînim
Ez ê serê gulisosina naqetînim
Tu desmala xu bavêje ez ê hilînim
Pê xem I xîyalên dilê xu 'brevînim

Di heyranoka jêr, risteya dawîn de bi gotina ez ne sêva devê te me du wate têne fêm kirin. Wateya eslî; keçikê xwe şibandiye sêvekê û ev sêv ne para wî kesê bang lê dike ye. Wateya mecazî; li gorî çînên civakî asta di navbera herduyan de ye. Ango qeysa wan ne yek e. Dibe ku yek zengîn û yek jî feqîr be an yek bedew be, yek kirêt be. Keçik xwe ji kurik bilintir dibîne. Di vir de hunera kînayeyê heye.

28 Çemê Kurrê lemelem e
Kevrê ortê çar kelem e

Kurê kerê durî 'm here

Ez ne sêva devê te me

Di vê heyranoka jêr de hunera kînaye hatiye bikaranîn. Di risteya dawîn de heram kirina nan û ava welêt tê du wateyan. Yek rasterast nan û ava welat heram kirin e û ya duyan mebest koçkirin û neveger e.

23 Kuro gede min qîzxatî te kurxatî

Were em ê bibin cote teyrê serberatî

Em ê heram bikin naniavê vî welatî

**2.4.1.4. Kesandin û Axivandin (Teşxîs û Întaq)**

Teşhis; kesandin, intak; axivandin e. Hunera ku heyberên zindî û nezindî weke însanan tesfîr dike ye. Di vê hunerê de ev heyber weke însanan difikirin, diaxivin, tevdigerin. Ango wesfên însanan li van heyberan hatiye barkirin. Dema ev huner tê çêkirin ji hunerên weke manendin û îstî'areyê jî tê îstîfadekirin. Întak hebe, teqez kesandin jî heye (Öcek, 2016: 84).

Di heyranoka jêr de hunera teşxîsê hatiye'emilandin. Xeyîdîn û bertek nîşandan wesfeke mirovî ye û hêmanên nezindî nikarin bixeyîdin û bertekê nîşan bidin. Ev taybetî xasî mirovan e. Di risteya duyem de qala xeyîdina hîvê têkirin, li gorî risteyê hîv, xeyîdiye û bertekê nîşan bide û naçe ava. Bi rastî ev negengaz e, di vir de kesandin heye.

20 Hîv derketye hîva sava

Hîv xeyîdye naçe av a

Xazî îman i Qur'anê

Gedelawkê mi 'l ser sing i berê 'm biba zava

Di heyranoka jêr de jî hunera kesandinê hatiye bikaranîn. Dilê mirovan nikare bifire. Tenê ajalên firinde dikarin bifirin. Dil weke çûkekî kesandiye û qabiliyeta firdanê lê bar kiriye.

6 Gede mala me jî mala we jî

Tev çandine gîyayê sor e kundirê bejî

Kuro gede were bira muhiba dilê min bifire,

Ser muhiba dilê te jî

#### 2.4.1.5. Tenasub

Di nava risteyekê an jî beytekê de lêrasthatinî, bikaranîna herî kêm du peyv, têgeh an biwêjên bi curbicur hêlan ve têkilîdar re, tenasub tê gotin. Encax divê têkiliyeke dijberî hev tune be (Soldan, 2013:76).

Di heyranoka jêr de hunera tenasub heye. Peyvên bi hev re têkilîdar hatine bikaranîn. Şivan, kavir û birr peyvên nêzî hev in. Ev peyv peyvên ajal û ajalvaniyê ne.

24 Gedelawkê min şivanê hûr kavira
Kavir kirin danzde birra
Hûn Xudê kin hûnê gedelawkê min nekin tu nifira
Gedelawkê min piçûk e çaxê min ra

Di vê heyranoka jêrîn de peyvên weke pez, nêrî, şivan û bilûrvan hatine bikaranîn. Di vir de hunera tenasûbê heye. Tekiliyek ji hêla ajal û ajalvaniyê ve di navbera van pevan de heye.

30 Pezê nîvro hate dana
Nêrya pêkutaye ser şivana
Min go ez kurbana tilîpêçkê bilûrvana

Li jêr mirin, mirî û turbe hatine bikaranîn. Têkileyek di navbera van peyvan de heye. Di vir de hunera tenasubê hatiye bikaranîn.

51 Gede ez dimirim tu sebebî
Bira turba min derê mala bavê te bî
Wextê ez ê mirim tu yê bêje
Wey mirîyo rehme 'l te bî

Di vê heyranoka jêr de jî tenasub heye. Peyvên çiya, gul û sosin peyvên nêzî hev in. Tekiliyek de navbera van peyvan de heye. Gul û sosin kulîlk in û li çiyan hêşîn dibin.

80 Min sond xarye ez ê maçim çiya
Naçînim gulan i sosinên çe'vkaniya
Gede meriv sozê xwu bide tixikê fila
Nede van êtîmê jinebîya

### 2.4.1.6. Bibîranîn (Telmîh)

Hunera bi mebesta işaretî buyerekê, kesekî navdar, baweriyekê, gotineke pêşiyan a belav bike û wê bi bîr bîne tê bikaranîn ku jê re telmîh tê gotin. Telmîh bi awayekî kurt îşaretî wan tiştan dike (Öcek, 2016: 117). Di vê heyranoka jêr de hunera telmîhê hatiye bikaranîn. Di risteya dawîn de navê du navdarên herêmê, Îsmaîlê Temo û Behriyê Axê derbas dibe. Bi tenê bi navê wan kesên navdar, bi awayekî kurt, bal kişandiye ser dewlemendî, axatî, navdariya wan. Dema mirov keçekî direvîne mirov xwe davêje mala yekî navdar, qedirzan û dewlemend da ku ji mirov re bibe arîkar.

25 Min 'l vê taxê te 'l vê taxê
Sûretsorê albûyaxê
Were ez ê te 'brevînim bavêjim mala
Îsmaîlê Temo, Behrîyê Axê

Li jêr bi Qasidê Qoca Felekê mebest ferîşte Ezraîl e. Di vir de bi vê yekê hunera telmîh hatiye sazkirin.

48 Ez nexaş im were ser min
Perrê orxanê bilindke 'bkeve ber min
Hekî dêwbavê min hatin gotin
Ez ê bêjim Kasidê Qoca Felekê hatye ser min

Di vê heyranoka jêr de hunera telmîhê hatiye bikaranîn. Di risteya dawîn de navê du evîndarên navdar. Navê Memê Alan û Xatûn Zînê[5] derbas dibe. Bi navê wan kesên navdar, bi awayekî kurt, bal kişandiye ser eşq û evîna wan a navdar û dilsoj.

Dînê, li min dînê
Cîkê lawê xwe rakim
Danime li ber pencerê li şaneşînê
Ewa hatiye serê min û lawê heval
Nehatiye serê
Memê Alan, Xatûn Zînê (Amîdî, 2010: 272).

---

[5] Memê Alan û Xatûn Zîn: Navê her du aşiqên destaneke kurdan a kevnare ye. Qala evîna Memê û Zînê dike. Ehmedê Xanî ev destan cara pêşîn di şiklê mesnewiyekê de nivîsiye.

#### 2.4.1.7. Leff û Neşr

Bi gelemperî di nava bendekê de di risteyêde herî kêm du tişt têne gotin û di risteyeke binî de manende û dijeyatiya bi van du tiştan re têkilîdar, tê dayîn. Ev huner, bi hunerên manendin û îstî'are re têkilîdar e (Çetin, 2012: 212).

Di vê heyranoka jêr de di navbera hatin û Behra Wanê û çûyîn û teltê xwînê de dijayetî û manendin hatiye dayîn. Hatina yarê dilê heyran weke Behra Wanê fireh dike, çûyîna yarê jî dilê heyranî dike teltê xwînê. Bi vî awayî hunera Leff û Neşr hatiye bikaranîn.

2 Kuro gede ne 'l hatinê ne 'l çûyînê
Te yê dilê 'm kiriyê Be'ra Wanê, teltê xûnê
Tu yê were sûretê min ê te ra wusan in
Bîna sêvê Artemêrta xal ketinê

Di vê heyranoka jêr de di navbera Bekirok û bêbext û fesad û direwîn de dijayetî û manendin heye. Bekirok bêbext in, bekotiyê dikin û fesad jî direwîn in, derewan dikin. Bi vî awayî hunera leff û neşr hatiye sazkirin

Lawkê mino
Kanîkêt gundê me çid şîn in
Li rex û bera hemî sîsin û beybwîn in
Kuro dîno li mabeyna me Bekirok û fesad gelek in
Tu bi gotina kesê neke
Xird bêbext in direwîn in (Amîdî, 2010: 284).

#### 2.4.1.8. Mibalexe

Ji bo bandora gotinekê xurtir bike, nîşandayîna tiştekî, ji hedê wê zêde an kêm e. Lê divê bi awayekî narîn ev huner bê bikaranîn (Öcek, 2016: 94).

Li jêr hunera mibalexeyê hatiye'emilandin. Li vir ji hedê wê zêdetir wesfek daye evîna xwe û heyranê xwe. Evîna wan ewqas bihêz e ku li li bera bikeve dê bera bihelîne, li dara bikeve dê qira daran bîne, li avê bikeve dê avê bisekinîne û li şêx û mela bikeve

dê wana li rêya heq derxe û bixirifîne. Dîsa di vir dehunera telmîhê jî heye. Di risteya dawîn de îşaretî Şêxê Sen'an[6] dike.

Evînê li min evînê
Evîna min û lawê delal bi bera bikevît, dê helînît
Bi dara bikevît dê qirînît
Bi avê bikeve dê rawestînit
Bi şêxa bikevît, bi mela bikevît dê xirrînît (Amîdî, 2010: 273).

Herê qulingo qulingê deştê
Tu êvariya vedimînî spêda xweş tê
Çavêt şengedosta min behr in
Belê tejî dermanê reş tê (Amîdî, 2010: 280).

**2.4.1.9. Dijayetî (Tezat)**

Di heman malikê an risteyê de, bikaranîna peyvên dijwate ye. Divê ev dijberî ne tenê li ser wateyê be, herwiha divê dijberî di navbera hest, xeyal, fikr û raman û têgehê de jî hebe (Soldan, 2013:74). Li jêr, di risteya yekem de du peyvên dijwate hatine bikaranîn. Duh û îro. Bi vê jî hunera tezatê hatiye sazkirin.

7 Gede duh li vir bû îro 'l vir çû
Bi meşa quling, xema gur çû
Min nizanbû meraqlî bû
'J derdê dil çû

[6]Şêxê Sen'an: Şêxekî bi ilm û'emelê xwe bi nav û deng bûye. Rojekê di xewna xwe de dibîne ku li welatê romiyan li ber pûtekî diçe sicdê. Paşê ji mirîdên xwe re dibêje ez ê herim welatê romiyan da ku wateya xewna xwe bizanibim. Bi çend mirîdan re dikeve rê, welatê romiyan li serî heta binî digere. Di dawiya gera xwe de keçikeke romî dibîne û dilê wî dikevê. Şêx bi rojan ber deriyê keçikê dimîne, piştî çend rojan xwe nîşanî keçika romî dide. Keçik dibêje Şêx; rêya işqê ji kafirbûnê re derbas dibe. Şerabê dide Şêx, Şêx dike şivanê berazan, zunnarê li Şêx dike. Şêx ji yekî re jî dengê xwe nake. Ji yên ku jê re dibêjin; divê tu ji Xwedê fedî bikî re dibêje; Xwedê ez avêtime nava vî agirî ez ê çawa xwe jê xilaş bikim. Mirîdên Şêx ji vê rewşê gelek aciz dibin, vedigerin Mekê, diçin cem dostekî Şêx, jê re qala meselê dikin. Dostê şêx ji mirîdan re dike şer, dibêje hûn çima di rêya Şêxê xwe de neçûn. Paşê dibêje mirîdan; herin bi rojan ji Şêxê xwe re dia bikin. Bi saya dia û niyazên mirîdan Xwedê şêx·'efû dike, Şêx tê hidayetê. Mirîd diçin Şêxê xwe tînin. Piştî vegera Şêx keçik wesfên Şêx di xewna xwe de dibîne, tê cem Şêx, dibe misilman û li wir can dide, dimire.

Di vê heyranoka jêr de hunera tezatê heye. Di risteya dawîn de peyvên qenc û xirab hatine bikaranîn. Ev herdu peyv peyvên dijwate ne.

105 Ez nexaş im ta digirim
Ez girara bêkundur im
Roj bi rojê xirabtir im
Qenca ez dixastim xiraba ez 'j xu ra birim

Li jêr di risteya dawîn de peyvên ser û bin hatine bikaranîn. Ev herdu peyv peyvên dijwate ne. Di vê heyranokê de jî hunera tezatê heye.

38 Ez ê teyr im teyrtawis im
Li zozana li çîmena dilemis im
Ez ê ser ra qurs im, bin ra diteyîsi

**2.4.1.10. Dubare (Tekrîr)**

Bi mebesta xurtkirina bandora gotinê, dubarekirina peyvan re tê gotin. Ger wateya pirsê hebe dibe Îstîfham, ger wateya bangê hebe dibe Nîda. Di nîdayê de divê baneşan hebe (Çetin, 2012: 215).

Di vê heyranoka jêr de hunera dubareyê heye. Peyvên heke, li, min di risteyên cuda de hatine dubarekirin. Peyva min sê caran, rêzepeyva heke li min du caran hatiye dubare kirin.

52 Kuro gede te ser min rea girtî yar e
Heke li min rintir e li te bimbarek
Heke li min kotîtir e
Kula Mûşê û Helebê
Mala bavê te da rûnê salê carek

Di vê heyranoka jêrîn de hunera dubareyê heye. rêzepeyvên heyfa minê û bêjeyên ser, li û heyfê di risteyên bin hev de hatine dubarekirin.

87 Te şivano çerxa xêvo
Pez kişyaye ser delêvo
Heyfa minê nayê li wê heyfê
Heyfa minê tê li vê heyfê

Tuncka sor e sortarî
Derketye ser xuckê kulê birî

**2.4.1.11. Îrsalê Mesel**

Bi mebesta hêzdarkirina fikrekê, bikaranîna gotineke pêşiyan an jî gotineke navdar e. Ji bo xwe bide bawerkirin, bo îqnakirinê tê'emilandin (Çetin, 2012: 218).

Di vê heyranoka jêr de hunera îrsalê mesel heye. Di risteya dawîn de gotineke qalibî hatiye bikar anîn. Bi du serê çê tev naçine ser belgîkî, dixwaze bibêje yên qayîlî hev nazewicin, zewaca bi dilê xwe zehmet e û dîrok jî şahîdê vê yekê ye, qet kesî nedîtiye di dewr û zemanên kevn de du kesên çê bigihêne hevdu.

3 Kuro gede min li pîkî te li pîkî
Ava gundê me dikişe heft newala, Suphangolê tev gelîkî
Qîzê mala bavê min dêrê wan e çiftexasê xas çirpîkî
Kuro gede qe kesî dewr i zemanê kevn de nedîtiye,
Du serê çê tev biçine ser be'lgîkî

Di vê heyranokê de hunera îrsalê mesel hatiye bikaranîn. Di her sê risteyên dawîn de jî gotinên pêşiyan hatine bikaranîn. Çiyayên bilind bê av nabin, geliyên kûr bê av nabin, keçikên danzde salî meztir bê yar nabin.

Kurko dîno
Çiyakêt bilind bê rê nabin
Gelyêt kûr çu cara bê av nabin
Kiçkêt kiçîn ji danze salî pêve li mala bavê bê yar nabin (Amîdî, 2010: 70).

Li jêr, di her du rêzên pêş de gotineke qalibî heye. Tu dil tune ne ku tê de xem tune be, tu co/cew tune ne ku tê de av tune be. Hunera îrsali mesel hatiye'emilandin.

Çi dil nînin çi xem tê ne
Çi cu nînin çi av tê ne
Xwezî min zanî ba
Piştî lawkê delal ez bo kê me (Amîdî, 2010: 45).

#### 2.4.1.12. Cînas

Bikaranîna du peyvên bilêvkirin û nivîsandina wan yek lê wateyên wan jev cuda hunera cînasê ye (Soldan, 2013:79).

Li jêr, di risteya dawîn de hunera cînasê heye. Peyva qol bi du wateyên cuda de hatiye bikaranîn. Qol hem tê wateya jêkirî, kurtkirî hem jî peyveke tirkî ye tê wateya mil. Heyranokbêj lava kiriye ku bibe marekî kurtkirî û bibe bazinekî bikeve qolê ango milê/zendê yara xwe.

22 Min dîwarê pincarçina
Te dîwarê pincarçina
Ev çi qîz e tevî jina
Xazî ez bibama tîreme'rkî
Biketama li ber qolê qolbazina

#### 2.4.1.13. Alîterasyon

Di heman beytê de, bi dubarekirina heman dengî, sazkirina ahengê ye (Çetin, 2012: 203). Di herdu heyranokên jêr de dengê "v" û "ê" di gelek cihan de hatine dubare kirin û ji hêla van dengan ve aheng ahtiye sazkirin.

Ev şe*v* şe*v* e nî*v*eşe*v* e
Kuro lawo dê tu were min bixwaze *v*e
Heke bavê min ez nedam
Min bixwe bibe û bire*v*e (Amîdî, 2010: 287).

Her*ê* qulingo
Ez bi te kem tu bi Xwed*ê* ke
Tu h*ê*lîna xwe li ser dar*ê* şengebiyek*ê*
Li welat*ê* jorî ç*ê*ke
Heku delal*ê* dilê min dimeşîte ser kaniya
Cotek*ê* silava ji zar*ê* dev*ê* min p*ê*şk*ê*şî v*ê* ke (Amîdî, 2010: 280).

**2.4.1.14. Sec'**

Ev huner bi pirranî di pexşanê de tê bikaranîn. Lê ji ber ku di heyranokan de zêde zêde heye, me ji bo heyranokê ango helbestê bi kar anî. Di vê hunerê de peyvên vekêşê saz dikin di heman demê de kêşeyî ne.

Di vê heyranoka jêr de bêjeyên şima, çima û tima di nav hev de vekêşê saz dikin. Ev hersê peyv di heman demê de xwediyê heman kêşa kiteyî ne. Ango pîvana wan yek e. Vêga hunera sec' derdikeve meydanê.

58 Ez helîyam bûme şima
Heval i hogirê dora min ker bûn, negotin çima
Derdê mêrê kotî, xasya tima

Û dîsa di vê heyranokê de bêjeyên heneka, teneka û kuleka di nav hev de vekêşê saz dikin. Ev hersê peyv di heman demê de xwediyê heman kêşa kiteyî ne. Hersê bêje jî ji sê kiteyan pêk tên. Vêga hunera sec' derdikeve meydanê.

84 Lo lo gede
Min soz daye wextê yarî û heneka
Em ê çira û fenera daynin ser teneka
Em ê yarê teze bigrin
Bira yarê kevn bibne qerewilê ser kuleka

## 2.5. HEYRANOK JI HÊLA VARYANTÊ VE

Peyva "varyant" ji hêla koka xwe ve peyveke latînî ye. Dema di qada muzîkê de bê bikaranîn, guherînê, çêşîtdarbûnê îfade dike. Ev têgeh weke têgeheke edebiyatê; şiklekî cuda yê çîrok, fesane, mamik, lîstik, kevneşopî û hwd. yên kêmek ji eslê xwe veqetiyayî îfade dike. Varyant, ji her yek şiklekî berhemeke edebiyata devkî ya ku ji hinek hêlan ve piçekî ji hev cuda re tê gotin (Güven, 2013: 145).

Keresteyên folklorê di nava demê de wextê ji kesan bo kesan, ji deveran bo deveran vediguhêzin, her dem bi devkî vediguhêzin. Di van veguhastinan de, di keresteyan de, carînan veguherînên ciyawaz çêdibin. Ji vê halê berhemên folklorî re varyant tê gotin. Weke mînak; li Botan şiklên cihêreng yên çîrokekê dibe varyanta wê çîrokê.

Berhemên folklorê, wekê zindiyekê xwe li gorî rewş û guherînên civakê, li gorî bûyerên di civakê de diqewimin, tevdigerin. Gelek caran bêyî bê ferqkirin, bi hemdê xwe, xwebixwe dikarin biguherin. Gelekî berhemên folklorî, bi saya van wesfan domdar in. Berhemên edebiyata gelêrî jî ji ber van taybetiyan bi awayekî hêzdartir, pêşve diçin, diguherin; rû didin, geş dibin û li gorî dorhêla xwe jiyana xwe didomînin.

Wekî hemû berhemên folklorê, heyranok jî berhemeke zindî ye. Li gorî rewşa civakê xwediyê pozîsyonekê ye. Heyranok jî bi devkî ji nifşan derbasî nifşên nû dibin. Bivê nevê guherînên piçûk tê de çêdibin. Ango varyantên heyranokan jî hene. Di xebata ku me li qadê kirî de, me çend varyantên heyranokan bi dest xistin. Em ê li jêr heyranokên xwedî varyant, bi varyantên wan re rêz bikin û rave bikin.

Herdu heyranokên jêr varyantên hev in. Ji du cavkaniyên cuda[7], lê li heman herêmê[8] hatine berhev kirin. Hersê risteyên pêş de guherîn çênebûye lê risteyên dawîn ciyawaz in. Bi saya vê guherînê heyranokek bûye du heyranokên cuda.

98 Bêje te çe'vreşê heba tirî
Min heft sala qirox kirî
Sala heyşta miskînê mêra ´j xu ra birî

96 Bêje te çe'vreşê heba tirî
Min heft sala qirox kirî
Salka heyşta xelkê ji me der hatî'´j xu ra birî

Herdu heyranokên li jêr, varyantên hev in. Ji du cavkaniyên cuda[9] û herêmên cuda hatine berhev kirin. Heyranoka hejmara wê 75 ji hêla Payîzavayê, di nav 'eşîra Hertoşiyan, ya hejmara wê 52 li aliyê Qelqeliyê, di nav'eşîra Milîyan hatiye berhev kirin. Hem herêm, hem jî'eşîr bi gelek hêlan ve xwediyê devokên cuda ne. Ew kesê ev heyranok honandiye li gorî ziman û dorhêla çanda xwe rengekî ciyawaz daye heman heyranokê û du varyantên heyranokê çêbûne.

---

[7] k.ç 1. û k.ç 5.

[8] Qelqelî

[9] k.ç 1. û k.ç 2.

75 Kurko carek te carek
Min wê bihîstî te girtî yarek
Heke ji min çêtir bît, te pîrozî bît û mubarek
Heke ji min çêtir nebît pêtevedet reşkoremarek

52 Kuro gede te ser min ra girtî yar e
Heke li min rintir e li te bimbarek
Heke li min kotîtir e
Kula Mûşê û Helebê
Mala bavê te da rûnê salê carek

Ev herdu heyranokên jêr, varyantên hev in. Ji du cavkaniyên cuda, lê di heman herêmê, heman gundî, heman malbatê hatine berhev kirin. Heyranokbêjên van herdu heyranokan xwîşkên hev bûn. Di hersê risteyên pêş de guherîn çê nebûye lê risteyên dawîn ciyawaz in. Di risteyên dawîn de yekî gotiye Îsmaîlê Temo, yekî jî gotiye Qubê Wero. Li gorî vekolîna me ev herdu kes jî li wî gundî kesên navdar bûne. Dema heyranokbêj ev heyranok ristiye li gorî xwe nav diyar kiriye. Bi saya vê guherînê heyranokek bûye du heyranokên cuda.

27 Min 'l vê taxê te 'l vê taxê
Sûretsorê albûyaxê
Were ez ê te 'brevînim bavêjim
Mala Qubê Qero, Behriîyê Axê

25 Min'l vê taxê te'l vê taxê
Sûretsorê albûyaxê
Were ez ê te birevînim, bavêjim mala
Îsmaîlê Temo, Behrîyê Axê

Dîsa herdu heyranokên jêr, varyantên hev in. Ji du cavkaniyên cuda û herêmên cuda hatine berhev kirin. Heyranoka hejmara wê 97 ji hêla Payîzavayê[10], di nav'eşîra Hertoşiyan, ya hejmara wê 10 li aliyê Qelqeliyê[11], di nav'eşîra Milî hatiye berhev kirin.

10 Payîzava: Navênavçeyeke Wanêye.

11 Qelqelî: Navênavçeyeke Wanêye.

Hem herêm, hem jî’eşîr bi gelek hêlan ve xwediyê devokên cuda ne. Ew kesê ev heyranok honandiye li gorî ziman û dorhêla çanda xwe rengekî ciyawaz daye heman heyranokê û du varyantên heyranokê çêbûne.

10 Ez ê reş im biha nakim
Ez ê herim ce qelaçî xu qelakim
Ez ê qelenê çîla, çe’vreşa, bedewa ser xu rakim

97 Çi’ewrekî pirtîmirtî
Donmardorê dinê girtî
Heyla reşo ′j min reştiro
Ez ê reş im biha nakim
Ez ê herme cem qelaçî xwe qela kim
Ez ê qelenê çîlan û rindan ser xwe rakim

Weke hemû cureyên edebiyata gelêr, heyranok jî bi devkî vediguhêzin. Her kes li gorî dorhêla çanda xwe rengekî dide heyranokê. Her heyranok li gorî herêm û kesan kêm zêde diguherin ku ev yek jî dibe sedema varyantên cuda yên heyranokan bêne meydanê.

## ENCAM

Me di vê xebata xwe de heyranok dane ber xwe, li gelek cî û kesên cuda heyranok guhdar kirin, dengên wan qeyd kirin, ew qeyd veguhastin ser kaxizê. Mê lêgerîneke lîteratûrî kir û pirtûk, berhevkarî, gotar û agahiyên berî niha li ser heyranokan hatine kirin kom kirin. Piştî van herdu karan me dîna xwe dayê ku hema bêje heyranokên hemû deverên Kurdistanê li ber destê me hene. Me li gorî van çavkaniyan heyranok dane nasîn û bi pênc hêlan ve heyranok analîz kirin. Me heyranokên ku me li qadê berhevkiribûn weke pêvek danî pişt xebata xwe û her wiha di dawiyê de me ferhengokek jî pêşkêş kir. Piştî vê vekolîna xwe em gihiştin van encamên jêrîn:

1. Ji ber sedemên siyasî, civakî û aborî rêjeya xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî gellek kêm e. Ji ber vê yekê ye dorhêla çanda devkî ya kurdan gelek dewlemend e. Heyranok jî berhemên vê çandê ne, di vê dorhêla çandê de dizên, mezin dibin û ji nifşan bo nifşan vediguhêzin. Hat dîtin ku ev çand ji hêla heyranokan ve jî gelek dewlemend e. Lê hêj xebatên berhevkarîya van berhemên folklorî nemaze yên heyranokan bi têra xwe nehatine kirin. Divê bi awayekî zanistî, bi rê û rêbazên akademiyê ev berhem bêne berhevkirin, tomarkirin, senifandin, nivîsîn û vekolîn da ku wenda nebin.

2. Di zimanê kurdî de ji bo folklorê bi zaravayê kurmancî "zanista gel", "kelepor" û "zargotin", bi zaravayê soranî, "xelknasî - edeba millî", bi zaravayê kirmanckî "zanistiya şarî" tê gotin. Lê gelek zanyarên kurdan peyva folklorê bi kar anîne, navê pirtûkên xwe bi vê têgehê danîne. Li gorî van agahiyan me tespît kir ku peyva folkor di zimanê kurdî de cihê xwe girtiye. Folklor ji bo hemû zaravayên kurdî jî peyveke hevpar e û bikaranîna vê têgehê kêrhatîtir e.

3. Dema em ji hêla teşeyî û ruxsarî ve li heyranokan binêrin, derdikeve meydanê ku heyranok kurtehelbest in. Ristarê heyranokan ne diyar in, ango mexlas tuneye, anonîm in.Ne malê tekakesekî ye, berhemeke kolektîf e. Belê cara yekem kesekî ew heyranok honandine lê bi demê re di nav gel de berbelav bûye, koç kiriye, ji kesan bo kesan, ji deveran bo deveran veguhêzîye, bûye milkê gel. Ji ber van sedeman, heyranok berhemeke helbesta gelêrî ye. Gelek lêkolîneran

heyranok weke berhemên edebiyata dengbêjiyê nîşandabin jî ev agahî ne rast e. Heyranok ne berhemên edebiyata dengbêjiyê ne.

4. Piştî vê xebatê em têgihiştin ku bi gelek cureyên helbesta gelêrî hene. Her yek li gorî herêma xwe xwediyê navekî cuda ye. Û gellek cure hene ku hêj nehatine keşfkirin. Me tenê bîst û neh cureyên sereke destnîşan kirin û rêz kirin.

5. Me tespît kir ku heyranok ji peyva heyran çêbûye. Heyran yar e û heyranok jî kurtehelbestên lîrik in û ji bo yarê/î ango heyranê/î têne gotin. Ji bo vê cureyê navên curbicur hene û ev nav li gorî herêman diguherin. Têgehên weke "heyranok", "miqam", "lawjê keçik û kurikan", "kilamên qîz û xortan", "qaydê qîzkan" têne bikaranîn. Xebatên heta niha hatine kirin jî bi navê "heyranok" hatine kirin. Me pesend kir ku heyranok navekî berbelavtir e û li gorî diyarkirina cureyê di cî de ye.

6. Xebatên heta niha li ser heyranokan hatine kirin, xebatên berhevkariyê ne û xebateke vekolînî heta niha nehatiye kirin. Derkete holê ku xebata me yekem xebata akademîk e ku li ser heyranokan hatiye kirin.

7. Heyranok berhemên rojane yên wêjeyî ne ku bi piranî jinên kurdan dema ku dicivin û têne cem hev, dibêjin. Derkete meydanê ku berhemên devkî yên di derbarê edebiyata kurdî de, di folklor û jiyana kurdan de bi piranî bi saya serê jinên kurd hatine vê rojê û winda nebûne. Ji bo edebiyata me destkeftiyên jinan gelek girîng in.

8. Li ser şikl û cureyên berhemên helbesta gelêrî heta niha kêm xebat hatine kirin. Li gorî vekolîna me heyranok hem ji hêla teşeyî ve hem jî ji hêla ruxsarî ve xwediyê taybetiyên xasî xwe ye. Li gorî gelekan heyranok cureyeke stranan e û hinek kes jî dibêjin heyranok dûrik in. Lê piştî xebata me, me destnîşan kir ku heyranok ne stran e ne jî dûrik e, heyranok berhemeke bi tena serê xwe ye. Hem li gorî ristina vekêşê, yekeya nezmê, qeware û kêşa xwe taybetiyên wê yên xweser hene û hem jî li gorî naveroka xwe li cureyên din vediqete.

9. Piraniya heyranokan ji çar risteyan pêk tên û şêweya ristina vekêşa hayranokan bi piranî "aaxa" ye. Lê di nav heyranokan de yên ristina vekêşa wan bi şêweya "aaaa", hem "aaax", hem jî "abab" çê dibin jî hene. Lê li gorî vekolîna

me, me destnîşan kir ku ev cure kêm in. Ger em van rewşên awarte nehesibînin em dikarin bibêjin şêweya ristina vekêşa heyranokan "aaxa" ye.

10. Dema em ji hêla dirêjbûn û kurtbûnê ve li heyranokan binêrin em dibînin ku bi yek yekeyê pêk tên. Li gorî xebatên me yên qadê û pirtûkên ber destê me, heyranoka herî kurt sêriste ye û ya herî dirêj jî sî û yek riste ye. Lê ev yek awarte ye. Me tespît kir ku piraniya heyranokan çarristene û qewareya heyranokan kêm e.

11. Hat dîtin ku di heyranokan de yeke ne sabît e. Lê herçiqas yekeya nezmê nebirêkûpêk be jî, ji sedî sed çarriste nebin jî, gelekên wan çarriste ne. Her wisa heyranokên ji sê, pênc û heta sî û yek risteyan pêk tên jî hene û hejmara risteyên heyranokan herî kêm sê ye. Lê li gorî heyranokên me li qadê berhevkirî û heyranokên di kitêbên ber destê me de rêjeya heyranokên çarriste gelek bilind e. Li gorî van agahiyan hasil bû ku yekeya heyranokê çarriste ye.

12. Me destnîşankir ku heyranokên bikêş û yên bêkêş hene. Lê piraniya heyranokan bêkêş in ango kêşa piraniya heyranokan serbest e. Di piraniya heyranokan de hejmara kiteyên risteyan di navbera xwe de ne yeksan in.

13. Derkete holê ku mijara heyranokan evîn û evîndarî ye. Evîn, mijara bingehîn e û mijarên weke hezkirin, bêrîkirin, xerîbî, êş û kulên ji ber eşq û firqetê, gilî û gazind û hwd. jî bi awayekî bi evînê re têkilîdar derdikevin pêş.

14. Hat dîtin ku hemû heyranok bi newayekê têne gotin. Hem di navbera cureyên helbesta gelêrî de hem jî di navbera xwe de newayên heyranokê yên cihareng hene. Li gorî xebatên qadê em dikarin bibêjin ku her kes li gorî xwe heyranokan dirise û li gorî terza xwe melodiyekê ango newayekî lê dike û wisa distirê. Eşq û evîna herkesî xasî xwe ye û li gorî vê jî hasil bû ku newaya her heyranokê jî, xasî ristarê wê heyranokê ye.

15. Dema dilê keçekî ketiye xortekî an dilê xortekî ketiye keçekî, hestên xwe weke heyranokekê honandine û gilî gazindên xwe bi rêya vê heyranokê ji hezkiriyê xwe re gotine. Hat dîtin ku evîndaran fonksiyona/peywira nameyeke eşqê dane heyranokan.

16. Zimanê heyranokan, zimanekî gel jê fêm dike ye. Ji ber ku heyranokbêjan li gorî dorhêla çanda xwe heyranok honandine, peyvên ji zimanê gel bi kar anîne. Zimanê jiyana rojane bi hemû haybetmendiyên xwe ve di nav heyranokan de 'emilandine. Ji ber vê yekê jî axaftinên rojane, gotinên herêmî, biwêj û gotinên pêşiyan û hwd. hatine bikaranîn. Loma jî zimanê heyranokan nêzî zimanê axaftina rojane ye. Dîsa ji ber ku piraniya heyranokbêjan nexwende bûne, zimanê gel yê axaftinê 'emilandine. Dîsa di heyranokan de, dubarekirina peyvên hevdeng, hemwate û dijwate hatine bikaranîn.

17. Me tespît kir ku di heyranokan de evîn, ne evîna îlahî ye, ya beşerî ye. Dîsa di heyranokan de ji bilî temayan gelek motîf, îmge, sembol yên weke; nifir, siruşt, flora, faûna, gilî û gazind, ramûsan, dîrok, revandin, berdêlî, hêwî, mirin, sond, tirên, pesin, qelen, şivan, çarenûs û hwd. derdikevin pêş.

18. Hat dîtin ku heyranok ji hêla hunerên edebî ve jî gelek dewlemend in. Di nav risteyên xwe de hema bêje her cure huneran dihewîne. Me di vê xebatê de çardeh heb cure hunerên edebî tespît kirin.

19. Me dît ku wekî hemû berhemên folklorê, heyranok jî berhemeke zindî ye. Li gorî rewşa civakê xwediyê pozîsyonekê ye. Heyranok jî bi devkî ji nifşan derbasî nifşên nû debin. Bivê nevê guherînên piçûk tê de çê dibin. Ango varyanên heyranokan jî hene. Me gelek varyantên heyranokan tespît kirin.

Di vê xebatê de me hewl da ku em heyranokê bidine nasîn, ji hêlên curbicur ve, bi rê û rêbazên zanistên çand, folklor û edebiyatê vekolin. Rê li ber akademîsyen û vekolîneran vekin. Ji ber ku folklor neynoka civakê ye, mirov dikaregelek agahiyên civakê jê derxe. Bajarvanî rojbiroj zêde dibe û pê re gund û jiyana gundewar jî hêdî hêdî li holê radibin. Folklor,'urf û'edet, çand jî ji ber van yekan diguhere, wenda dibe, şûna xwe ji tiştên nûjen re dihêle û bi gotineke din; dimire. Nifşên nû ji çand û jiyana bab û kalên xwe bêpar,bi awayekî sinî mezin dibin. Çand û kultura kurdewar tenê ji hêla kesên temenê wan mezin ve tê zanîn. Ger bi awayekî rêkûpêk, bi rê û rêbazên akademiyê neyêne berhevkirin, tomarkirin, dabeşkirin, nivîsîn û vekolîn, ew çanda qedîm jî bi wan re dimire. Divê kurd berî hertiştî, bi awayekî lez dest bi berhevkirin, tomarkirin, senifandin, nivîsîn û analîzkirina berhemên folklorîk bikin da ku ji mirinê xilas bibin. Divê di serî de zaningeh, paşê sazî, komele, rêxistin û şaredariyên kurdan

giraniyê bidin xebatên folklorîk. Bi proje û xebatên nû pişgiriyê bidine van xebatan. Da ku ev nirxên girabuha bigihêjine nifşên nû.

# ÇAVKANÎ

## ÇAVKANIYÊN NIVÎSKÎ


Abdallah, A. (2005). *Heyranok û Nameyên Evîndaran.* Hewlêr: Weşanxaneya Spîrez.

Alakom, R. (2009). *Di Folklora Kurdî de Serdestiyeke Jinan.* İstanbul: Weşanxaneya Avesta.

Allison, C. (2010). *Oral Literature of İranian Languages.* (33-69). Kreyenbroek P. G. û Marzolph U. (ed.). New York: Weşanxaneya Columbia University.

Amîdî, R. (2010). *Heyranokêt Kurdî.* Hewlêr: Weşanxaneya Spîrez.

Amêdî, S. B. (2013). *Folklora Kurdî.* Ziya Avci (t.g.z.). Ankara: Weşanxaneya Lîs.

Anter, M. (2010). *Qimil.* İstanbul: Weşanxaneya Med.

Artun, E. (2012). *Türk Halk Edebiyatına Giriş.* Adana: Karahan Yayınları.

Aykaç, Y. (2012). "Di Edebiyata Kurdî ya Devkî de cureyek: Klamên Meşkê". *Nûpelda.* j. 11.

Bedirxan, C. A. (2012). "Ferhengok".*Hawar.* J. 30. Diyarbakır: Weşanxaneya Belkî.

Botanî, B. (1995). *Heyranok; Gilî û Gazindên Evînê.* Stocholm: Weşanxaneya Apec.

Ce'fer, H. (1989). *Heyranok Ji Keleporê Kurdî.* Hewlêr: Weşanxaneya Roşenbîrî Lavan.

Celîl, O û C. Celîl. (1978). *Zargotina Kurda I-II.* Moskova: Weşanxaneya Naûka.

Celîl, C. û G. Schadkam, (2012). *Sêxiştîyên Kurmancî, Xorasan.* Wien: Weşanxaneya Înstîtûta Kurdzanîyê.

Celîl. Casimê û E. Celalî. (2011).*Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn.* İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.

Cewerî, F. H. (amd.) (2009). *Folklora Kurda.* Yerevan: Weşanxaneya Limûş.

Cigerxwîn. (1988). *Folklora Kurdî.* Stockholm: Weşanxaneya Roja Nû.

Cindî, H. û E. Evdal. (2008). *Folklora Kurmanca.* İstanbul: Weşanxaneya Avesta.

Cizîrî, Ş. (2011). *Edebiyata Devkî û Sosyalîzasyon.* İstanbul: Weşanxaneya Aram.

Çetin, N. (2011). *Edebi Sanatlar, 10. Bölüm.* Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.

Çiftçi, T. (2014). *Kulam û Jin.* İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.

Çiyan, G. (2014). *Stiranên Evîniyê: Heyranok,* http://www.tigrishaber.com/stiranen-eviniye-heyranok-406yy.htm/, (Dîroka Lênêrînê: 30/11/2016).

Çobanoğlu, Ö. (2000). *Âşık Tarzı Kültür Geleneği ve Destan Türü.* Ankara: Akçağ Yayınları.

Çobanoğlu, Ö. (2003). *Türk Dünyası Epik Destan Geleneği*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Çobanoğlu, Ö. (2012). *Halk Edebiyatına Giriş-I*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.

Dorson, R. M. (2014). *Halk biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar-I.* (11-13). Oğuz, M. Ö. û Gürçayır Teke, S. (ed.). Ankara: Geleneksel Yayınları.

Dundes, A. (2014). *Halk biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar-I.* (16-18). Oğuz, M. Ö. Û Gürçayır Teke, S. (ed.). Ankara: Geleneksel Yayınları.

Ellul, J. (1998). *Sözün Düşüşü*. Hüsamettin Arslan (wer.). İstanbul: Paradigma Yayınları.

Farqînî, Z. (2004). *Ferhenga Kurdî-Tirkî*. İstanbul: Weşanxaneya Enstitûya Kurdî ya Stenbolê.

Goody, J. (2011). "Sözlü Kültür". *Milli Folklor Dergisi*. j. 83.

Gökalp Alpaslan G.(2002).*XIX. Yüzyıl Yazılı Anlatılarında Sözlü Kültür Etkileri*. Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları.

Güven, M. (n.d.). "Türlerin Varyantlaşması". *Ankara Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*. j. n.d.

Güvenç, B. (2013). *İnsan ve Kültür*. İstanbul: Boyut Yayınları.

Hamelink, W. (2013). *The Sung HomeNarrative, Morality, and the Kurdish Nation*. (Teza Doktorayê ya Neweşandî). Zanîngeha Leiden Enstîtûya Antroplojiya Çandî û Pêşketina Civaknasiyê.

Kaplan, Y. (2015a). *Kaniya Stranan*. İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.

Kaplan, Y. (2015b). "Strana Kurdî (Kurmancî): Devera Hekaryan wekî Nimûne". *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, j. 2.

Kardaş, C. (2013). *Dengbêjlik Geleneği ve Âşık Edebiyatı ile Karşılaştırılması*. (Teza Doktorayê ya Neweşandî). Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Koçak, A. (2005). "Sözlü Kültür Ortamından Elektronik Kültür Ortamına Menkıbeler: Mehmet Emin Tokadi Örneği", *Türk Kültürü ve Hacı Bektaş Veli Araştırma Dergisi*, j. 35.

Kutlar, M. (2010). "Aşkla Örülmüş Dörtlükler, Heyranok", *Qijika Reş*. j. 2.

Oğuz, M. Ö. (2001). *Halk Şiirinde Tür, Şekil ve Makam*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Ong, W. J. (2011). *Sözlü ve Yazılı Kültür*. İstanbul: Metis Yayınları.

Öcek, N. (2016). *Edebiyata Kurdî*. Ankara: Weşanxaneya Sîtav.

Rojhilat, J. (2015). "Folklor û Belavbûna Folklorê". *Folklora Kurdan*. j. 1.

Sadinî, M. X. (2011). *Heyranokên Kurmancî*. İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.

Sokolov, Y. M. (2009). *Folklor: Tarih ve Kuram*. Yerke Özer (wer.). Ankara: Geleneksel Yayınları.

Soldan, M. M. U. (2013). *Edebiyat Bilgi ve Teorileri*. Ankara: Grafiker Yayınları.

Surûş, E. (2016). *Gilî û Gazindên Evîndaran, Ji Kelepora Kurmancên Îranê*. İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.

Tan, S., R. Önen, û y.d. (2010). *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*. İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları.

Turgut, L. (2010). *Mündliche Literatur der Kurden In den Regionen Botan und Hekarî*. Köln: Weşanên Instîtûta Kurdî.

Yetkiner, R. (2009). *Dengbêj û Stranên Me, Destan û Folklora Me*. Akbal, H. (amd.). Stockholm: weş. n.d.

Yıldırım, D. (1998). *Türk Bitiği Araştırma/İnceleme Yazıları*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Yıldırım, K. û Pertev, R. û M. Aslan. (2014). *Folklora Kurdî*. Mardin: Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Yıldırımçakar, M. (2012). "Çarînên ku bi Evînê Hatine Honandin: Heyranok". *Nûpelda*. j. 11.

Yıldırımçakar, M. (2015). "Heyranok; di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de". *Folklora Kurdan*. j. 2.

Yusif, E. (1985). "Kelepor". Stocholm: *Dengê Me*, J. 2.

Uzun, M. (2009). *Dengbêjlerim*. İstanbul: İthaki Yayınları.

Walerstein, İ. (1993). *Jeopolitik ve Jeokültür*. Mustafa Özel (wer.). İstanbul: İz Yayınları.

Zero, E. E. (1987). *Strana Lîrîkî Heyranok*. Bexda: Weşanxaneya Roşenbîrî Lavan.

## ÇAVKANIYÊN DEVKÎ

1.Koşmaz, K. (Nexwenda) 14ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Qelqelî.

2.Özbek, N. (Nexwenda) 22yê Pûşpera 2013an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Payizava.

3.Yıldırımçakar, B. (Dibistana Seretayî) 18ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Qelqelî.

4.Yıldırımçakar, H. (Nexwenda) 18ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Qelqelî.

5.Yıldırım, Ş. (Nexwenda) 19ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Qelqelî.

6.Çalış, A. (Nexwenda) 20ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Qelqelî.

7.Sayin, H. (Nexwenda) 8ê Avrêla 2015an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Bêgirî.

8.Alkan, H. (Nexwenda) 20 Tîrmeha 1916an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Elbak.

9.Özbek, G. (Nexwenda) 22yê Pûşpera 2013an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Xoşeb.

10.Şeber, S. (Nexwenda) 24ê Pûşpera 2016an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Şax.

11.Sezer, M. (Nexwenda) 25 Pûşpera 2016an, Mijara Hevpeyvînê "*Berhevkariya Heyranokan*", Wan/Miks.

**PÊVEK 1**

1.

Gede dilê ′m bejna te kinik e
Bîna takreyhana devê gelya sergupik e
Kuro gede were bira dilê min te ′b dil be,
Bira gundî cîran xu ra bike kînirik ê

2.

Kuro gede ne ′l hatinê ne ′l çûyînê
Te yê dilê ′m kiryê Behra Wanê, teltê xûnê
Tu yê were sûretê minê te ra wisa nin,
Bîna sêvê Artemêrta[12] xal ketinê

3.

Kuro gede min li pîkî te li pîkî
Ava gundê me dikişe heft newala, Suphangolê[13]ê tev gelîkî
Qîzê mala bavê min dêrê wan e çiftexasê xasçirpîkî
Kuro gede qe kesî dewr i zemanê kevn da nedîtye,
Du serê çê tev biçine ser be'lgîkî

4.

Kuro gede
Laçka serê ′m qîçik e
Zêrê hustûyê ′m çar niçik e
Wextê gedelawkê ′m li welatê xerîbyê tê
Tu dibê beranekî heft gurçik e

---

[12]Artemêrt: Navçeyeke bajarêWanêye.

[13] Subhangol: Gola ser çiyayêSîpanêXelatêye.

5.

Kuro gede Kurhesinî
Tu hem gul î hem sosin î
Dinya ‘alem bibêje jî,
Tu serdilka dilê min î

6.

Gede mala me jî mala we jî
Tev çandine gîyayê sor e kundirê bejî
Kuro gede were bira muhiba dilê min bifire,
Ser muhiba dilê te jî

7.

Gede duh li vir bû îro ′l vir çû
Bi meşa quling, xema gur çû
Min nizanî meraqlî bû ′j derdê dil çû

8.

Kuro gede pezê te hejîya
Avêt gurz i çîmena, dor zevîya
Gede par vî çaxî dilê min te dil bû
Îsal vî çaxî bîna dîza denê wergerîya

9.

Kuro gede ez girara dewteze me
Ez ê tijî pûnga Axlece[14] me
Ez ê ′j xelkê ra sed im sedisî me
Ez ê ′j delalyê dilê xu ra bêpol û bêpere me

---

[14] Axlece: Navêçiyayekîye, dikeve rojhilatê Wanê.

10.

Ez ê reş im biha nakim

Ėz ê herim ce qelaçî xu qelakim

Ez ê qelenê çîla, çe'vreşa, bedewa ser xu rakim

11.

Tu kurapê mîn î kero

Malê heft qirala, danzde dûwala xu da sero

Te ne ′z xastim ne ′z revandim

Te dame yekî xelkê xerîb, li heft bavê me jî dero

12.

Tu qîzapa min kotîyê

Berê berda min gotîyê

Te yê digot ez ê nakim xubxutîyê

13.

Te qemerê fena çira

Xazî mêrê te bimira

Min ê helalîka Xudê tu ′l vî canî helal kira

14.

Qemer li çîla çêtir in

Çe'vê wan ê reş in bijangê wan e gir in

Heçî kesê ev qemer ji xu ra girtin

Minjêwetrê çûne Meka Şerîf[15] tewaf kirin

[15] Meka Şerîf: Bajarekê'Erebistanêye. Ji bo misilmana bajarekîpîroz e. Ḩeciyên misilman dema diçine hec, vîbajarîtewaf dikin.

15.

Te qemerê tev kutayê
Zêrxizêmê poz hildayê
Ez ê terka qemera xu nakim
Heta dergûş negre pêşê nebê dayê

16.

Em cînarê derbider in
Em di bejnê da berhember in
Heçyê orta me herduka da pîs xeberde
Ew ne ometa pêxember in

17.

Çemo çemo mestî mestî
Tu ′dçî naçî qe nawestî
Te yê goştê min xar mane hestî
Hestyê min wisa nin bîna darê rizî, pira ′şkestî

18.

Çemo çemo Çemê Payê[16]
Çem dikişe bîna bayê
Xazî yekî mizginîke xêrê bida min da
Bigota Gulê bûye bûka Hisnayê

19.

Hîv derketye hîva zer e
Minê pêşa mêzera xu da ber e
Heçyê orta herdu dila, herçar çe'va pîs xeberde
Ew ne ′l ometa pêxember e

---

[16]ÇemêPayê: Navêçemekîye, dikeve rojhilatêWanê.

20.

Hîv derketye hîva sava

Hîv xeyîdye naçe ava

Xazî îman i Qur'anê

Gedelawkê mi'l ser sing i berê 'm biba zava

21.

Keçê çîya bilind e te nabînim

Ez ê serê gulisosina naqetînim

Tu desmala xu bavêje ez ê hilînim

Pê xemixîyalên dilê xu birevînim

22.

Min dîwarê pincarçina te dîwarê pincarçina

Ev çi qîze tevî jina?

Xazî ez bibama tîreme'rkî

Biketama li ber qolê qolbazin a

23.

Kuro gede min qîzxatî te kurxatî

Were em ê bibin cote teyrê serberatî

Em ê heram bikin naniavê vî welatî

24.

Gedelawkê min şivanê hûrkavirra

Kavir kirin danzde birra

Hûn Xudê kin hûn ê gedelawkê min nekin tu nifirra

Gedelawkê min piçûk e çaxê mi rra

25.

Min ′l vê taxê te ′l vê taxê
Sûretsorê albûyaxê
Were ez ê te ′brevînim, bavêjim mala
Îsmaîlê Temo, Behrîyê Axê

26.

Hîv derketye hîvakerî
Hîvê xu da ser tabûra vî eskerî
Gotne min da gedelawkê te yê were îznê
Min nebawer î

27.

Min ′l vê taxê te ′l vê taxê
Sûretsorê albûyaxê
Were ez ê te'brevînim bavêjim mala
Qubê Qero, Behrîyê Axê

28.

Çemê Kurrê[17] lemelem e
Kevrê ortê çarkelem e
Kurê kerê durî ′m here
Ez ne sêva devê te me

29.

Gede dilê ′m bejna te dirêj e
Bîna takreyhana devê gelya şewq davêje
Kuro gede bira dilê min te ′b dil be
Bira gundî cînar ′j xu ra bêje

---

[17]ÇemêKurrê: Navê çemekî ye, dikeve rojhilatê Wanê.

30.

Pezê nîvro hate dana

Nêrya pêkutaye ser şivana

Min go ez kurbana tilîpêçkê bilûrvana

31.

Çûme Enqera şewitî qûma şîn e

Hemû usteymen in yuzbaşî ne

Hûn Xudê kin hûn ê gedelawkê min nexin, neêşînin

Gedelawkê min nazik e, nazenîn e.

32.

Min go dengê min dengizê

Ketye koka şîrê şîrhelizê

Ez ê terka qemera xu nakim

Heta Madî rabe, kantirr bizê

33.

Ez ê çîyê dinêrim bêna bê tê

Be'rê dinêrim keştî 'l rê tê

Min go qey esker e 'l eskeryê tê

Min go qey şofêr e 'l şofêryê tê

Min nizanbû gedelawkê min e,

Çante dêst e 'l qolordyê tê

34.

Bêmaldînê dara hewşa me da dartûyîn e

Xelkê mi ra digo wey bêbavê malê lawkê te tunîne

Min go gelî gundîyû cînarê mixenetno

Hûn ê gazin i lomekan li min nekin

Emnîyeta malê dinyayê tune ye li dinyayê dimîne

Di dêrisê gundê me da

Wextê çe'vê minê bi bejnibala gedelawkê min dikeve

Minjêwetrê xîmê binê beryanî şewitî

Terşitalanê mala paşê hemû ′j min ra tîne

35.

Sube ye sura subê bêna bê tê

Kanî dûr e muhiba dilê ′m li avê tê

Bejna zirav, kembera zîvîn, qolê zêra çawa lê tê

36.

Wey eskero wey eskero

Dê ′b axîno bav ′b kesero

Heke hûn gedelawkê min naznakin

Ew eskerê kincê wî zero

37.

Hilma minê hilma mîhê

Porê min şirîta dor keştîyê

Xudê ′j dêwbavê min ra qebûl neke

Serê min dane ser be'lgîkî xerîbîyê

38.

Ez ê teyr im teyrtawis im

Li zozana li çîmena dilemisim

Ez ê ser ra qurs im, bin ra diteyîsim

39.

Çi şeşkina nav hirîyê

Gundî cînar dibê dilê me ketîyê

Ev teresa qîza teresbavê wisa kirye

Milê xortê xelkê nagre kêşa kêlendîyê

40.

Çi palekî gulomilo

Destyê dasa te zengilo

Tu yê were ji mala bavê min ra

Bixebite 'b eşqidilo

41.

Çi palekî berî besta

Tu yê zorê nede tilyê desta

Xazya ez ê bibama tîreme'rkî

Min ê serê tilya destê te bigesta

42.

Mêrga mala bavê min mezin e

Pala girtye serobin e

Serhonazî lawkê min e

43.

Lawkê min sîyarê ce'nya qer e

Zînizengî zêrêzer e

Kuro gede 'b mi ra bizewice

Ocaxa Sînê Nexel[18] e

---

[18]Ocaxa Sînê Nexel: Ji malbavana Şêx 'Abid re têgotin. Şêx 'Abid Şexekî li qundê Qerecixê ye. Çûye ber rihma Xwedê.

44.

Sîyarê bozê boz birçî kir

Şara serê 'm çar qamçî kir

Kuro gede te yê seva derdê dilê rezîl

Herçar malê Kosa[19] ricaçî kir

45.

Sîyarê bozê boza kewê

Kuro gede tu 'l tu dera neke xewê

Xudê xirabike xastina te ez dixastim

Dayîna mala bavê min pê ra bû derewê

46.

Kuro gede

Sîyar nebe li bergîra

Tu yê peya nebe 'l devê bîra

Kuro qîzibûkê mala bavê min

Yê te 'bxapînin bi bertîla

47.

Dêre çîtê dêre kobe

Bes bigere obe obe

Kuro gede 'j te ra şerm e

'J mi ra tobe

48.

Ez nexaş im were ser min

Perrê orxanê bilindke 'bkeve ber min

Hekî dêwbavê min hatin gotin

Ez ê bêjim Qasidê Qoca Felekê[20] hatye ser min

[19] Koseyî: Navê'Eşîrekêye. Girêdayîkonfederasyona Milîne.

49.

Ez nexaş im pirr helak im
Hûnê gazî lawkê 'm taxa han kin
Hekî hatye jixu hatye
Hekî nehatye bavê wî bikujin
Pezê bavê wî talan kin

50.

Ez dimirim roja înê
Hûnê kevrê'm bînin li Selîmê[21]
Hûnê gîhayê'm bînin Gîhadînê[22]
Hûne ava'm bînin li Mêrdînê
Wextê ez ê mirim,
Hûn ê destê gedelawkê min bigrin bînin nava şînê

51.

Gede ez dimirim tu sebebî
Bira turba min derê mala bavê te bî
Wextê ez ê mirim tu yê bêje
Wey mirîyo rihme 'l te bî

52.

Kuro gede te ser min ra girtî yar e
Heke li min rintir e li te bimbarek
Heke li min kotîtir e
Kula Mûşê û Helebê
Mala bavê te da rûnê salê carek

---

[20]QasidêQoca Felekê: Ezraîl.

[21]Selîm: Navênavçeyeke Qersêye.

[22]Gîhadîn: Navênavçeyeke Agiriyêye.

53.

Gede te kurxalo kurê xalê

Tu şekirê nav desmalê

Kuro gede ew çi kul e te kirye

Nava dilê min piçûkê, min tifalê

54.

Kuro tu nebêje dayka mi ra metê

Kuro gede dayka 'm dewsa xasya te tê

Kuro 'j mi ra 'eyb e

'J te ra çiqas bêjî gune jê tê

55.

Birre pezê sorêcîn e

Nêryê 'egal pêşyê çûne

Xayê qewliqiraran poşman bûne

56.

Te keçikê ha keçikê

Pirtî berfa ser pencikê

Te yê mala xortê xelkê xirab kirye

Seva takek têla vê tûncikê

57.

Te keçikê zozanîyê

Tu keremke were ser kanîyê

Ez ê ramûsankî 'j te keremkim

Seva muhiba dila cînarîyê

58.

Ez helîyam bûme şima
Heval i hogirê dora min ker bûn, negotin çima
Derdê mêrê kotî, xasya tima

59.

Ez ê xanîkî çêkim li Rihanê
Ez ê derîkî 'l berxim ji piltanê
Ez û gedelawkê xu em ê tê da rûnên
Heta hersê mehê zivistanê

60.

Ez ê xanîkî çêkim li herd i merda
Ez ê derîkî 'l berxim ji kul i derda
Ez û gedelawkê xu em ê tê da rûnên
Heta stêrka sibê li me ser da

61.

Şewityê gundê me Pîrkal[23] e
Xopanê gundê me Pîrkal e
Binî da cewê aşan in
Hustu da korikendal in
Gulsosina li ser hev da nalenal in

62.

Şemşedîna[24] di korê da
Sîwsê malê di dorê da
Qir bikevê kul bikevê
Xêncî mala yara 'm tê da

---

[23]Pîrkal: NavêgundekîQelqeliyêye.

[24]Şemşedîn: NavêgundekîQelqeliyêye.

63.

Te çe'vreşê kanya kila
Sîwsê gulî nava mila
Ez ê werim te'brevînim
Bavêjme Seydîbegê[25] dêra fila

64.

Lo lo dilo dil çîçeko
Min 'l hezarî girtye yeko
Ewa yeka wisa ne
Li êl û 'eşîra mala bavê min çêtirko

65.

Mingo Qerecixê[26] dengê dîka
Şemşedînê li firîka
Desmala ser destê gedelawkê min wusan e
Notila perrê minminîka

66.

Sîyek hate ser kulekê
Rewneqê xu da bejna çe'vbelekê
Min dît eva sîya Şîyar begê

67.

Derdê dila kula dila
Kuro gede tu rûnenê 'l cem cahila
Xudê zane zemanekî wisa hatye
Şikê dibin xûşk i bira

---

[25]Seydîbeg: GundekîQelqeliyêye.

[26]Qerecix: GundekîQelqeliyêye.

68.

Derdê dila em danîne

Av hêsira em hilanîne

Kuro gede bihar e

Xelkê were em heznî ne

69.

Vê tirînê hereket kir

Vê wêranê hereket kir

Xu avête Şam û Heleb, Dîyarbekir

Kuro gede tu yî çûyî, te birîna dilê min teze kir.

70.

Kuro gede neçe Wanê tê Wanî bî

Avê gola nexwe tê genîbî

Tu yê were ser sing i berê min razê

Tê cinetî bî

71.

Kuro gede neçe Wanê, Wan dudu ne

Serê rêya Wanê mêr kuştine

Seva xizêma pozê min e

72.

Min dil hebû te dil hebû

Keskî malê haj me nebû

Kuro gede çi bêbextî hebû

Li alyê te bû

73.

Kuro gede minê dil kir te dil nekir

Felcî hatibû min ′j xu ra fe'lek vekir

Kuro çi bêbextî hebû dîsa te kir

74.

Wele navê min Seher e

Bille navê min Sehere

Singê min defter e

Zimanê min qelem e

Tûka min hibr e

Yazî muqeder e

Êtîmo gede navê te ′l ser e

75.

Kurko carek te carek

Min wê bihîstî te girtî yarek

Heke ′j min çêtir bît, te pîrozîbît û mubarek

Heke ′j min çêtir nebît pêtevedet reşkoremarek

76.

Berrî berrî sed car berrî

Ez nizanim ji germê ye yan ji sermê ye

Na wele ji mîrata xurbetyê ye

Gedelawkê ′m rengê xu guherîye.

Gedelawkê ′m dike bê ye

Behra Wanê nade rê ye

Ez ê singê Avzema xu bikme keştî

Bira bide ser da bê ye

77.

Ez hiznakim tu pale bî

Sîyarê ce'nya sêsale bî

Kuro gede were çend rojeka

Li ser sing i berê min'evdala Xudê qebale bî

78.

Lo êtîmo min sond xarye ez ê naçim çîya

Naçînim gulan i sosinên çe'vkanîya

Carekî dilê bêdil mutesel bû ez helîyam

79.

Gede sekinî singê odê

Nîşan daye gurzê kodê

Zemanekî wisa hatye

Gede meriv etîm mêtîmê vê heyamê

Biherre mala mele bi Qur'anê bide sondê

80.

Min sond xarye ez ê naçim çîya

Naçînim gulan i sosinên çe'vkanîya

Gede meriv sozê xu bide tixikê fila

Nede van êtîmê jinebîya

81.

Ez ê çûme taxa jêrîn di taxê da

Meşyame taxa jêrîn di taxê da

Xazla mala lawkê qemer tê da

Serê min xulama zendê zerbadayî si'et tê da

82.

Bejna gewra min zirav e tê gotinê

Xazî bihata ber bazarê firotinê

Xelkê bida malûhalê dinê

Minê bida rihê şirînê ber mirinê

83.

Lo lo gede qurban min te divê te min navê

Ez ê di kavilê gunda da cihabê bişînim ser cihabê

Heger gede hatye jixu hatye

Heger nehatye belkî li bedena wî na bizê tasek avazer e zerxunavê

84.

Lo lo gede

Min soz daye wextê yarî û heneka

Em ê çira û fenera daynin ser teneka

Em ê yarê teze bigrin

Bira yarê kevn bibbe qerewilê ser kuleka

85.

Lo lo gede hîv derketye hîva geş e

Şewqê daye koşka bilind kaşmikaş e

Gede hatye min ʹbrevîne

Quzilqurta cenya wî nexaş e

86.

Hîv derketye bilindîya

Şewqê daye koşka bilind guhirra mîya

Gede hatye min ʹbrevîne

Quzilqurta ce'nya wî westîya

87.

Te şivano çerxa xêvo
Pez kişyaye ser delêvo
Heyfa minê nayê li wê heyfê
Heyfa minê tê li vê heyfê
Tuncka sor e sortarî
Derketye ser xuckê kulê birî

88.

Kerî pezê qijbeleko
Girtye zevya zegereko
Qirr bikevê kul bikevê
Pez hezar e şivan yeko

89.

Kerî pezê vê neqebê
Xweyî dike nolanî şîrê şevê
Xazî ez ê bibama tîreme'rkî
Bikişyama binê vê kezebê

90.

Çi palekî li vê navê
Reş qimitî li ber tavê
Xazî ez ê bibama kevokekî reşitarî
Biketama vê hindavê

91.

Çi palekî berîbesta
Tavê lêda pale westya
Em ê xu bavêjne ber bextê serhonazî
Bira zorê nede çe'v i biryê belek, tilyê desta

92.

Te qemerê min tev dayê

Zêrxizêma poz kutayê

Ez ê tu car terka qemera xu nakim

Heta zarkê kurrîn negre pêşê nebê dayê

93.

Te qemerê ajeqorrê

De tu rabe çe'va bişo biska berde hafî porrê

Ez ê tu car terka qemera xu, çe'v i biryê belek nakim

Hetanî min daneynin kêlikberê devê gorrê

94.

Eskero eskerê vê havînê

Esker kişya Çeneqele Gelîbolû ber tirînê

Heyfa min nayê li tu heyfê

Heyfa min tê li wê heyfê

Çûncka gedelawkê min dane ber makînê

95.

Tu eskero tayînbiro

Min sê denga gazî kiro

Min nizanbû dilê esker

Hê li dilê min kultiro

96.

Bêje te çe'vreşê heba tirî

Min heft sala qirox kirî

Salka heyşta xelkê ji me der hatî 'j xu ra birî

97.

Çi'ewrekî pirtîmirtî
Donmardorê dinê girtî
Heyla reşo ′j min reştiro
Ez ê reş im biha nakim
Ez ê herme cem qelaçî xwe qela kim
Ez ê qelenê çîlan û rindan ser xwe rakim

98.

Bêje te çe'vreşê heba tirî
Min heft sala qirox kirî
Sala heyşta miskînê mêra ′j xu ra birî

99.

Heyla kuro kuro gede
Tu yê ji kula dilê min û xwe ra
Sêlek ji sêla hesinî
Tu yê daynî ser da kîloyek donêbizinî
Agirekî bidî ser da yekî binî

100.

Çîya bilind e te nabînim
Xewê şeva te dibînim
Sibê şeveqê radibim te nabînim
Kor im, posîde me, direwîn[27] im

---

[27]derewîn

101.

Kanya gundê me lûle ye
Ser da bin da makîne ye
Heçî ara min û gewra min da xeber bide
Xêrê nebîne ´j bedena xwe ye

102.

Tirên hato minare kir
Lawêm borî min nas nekir
Heyla ´l minê min rebenê
Tirên hato ´l alyê xetê
Bihar e eskerê xelkê hato bi xêr û şahî
Eskerê min'evdala xudê hatî bi dilmayî

103.

Dilê'm sîka zinêr kevrê birrî
Sînga subê lê da ya êvarê lê zivirî
Xazya min ji wî'evdî hatî
Bi çe'vê xu dîtî, bi dilê xu mêrkirî

104.

Dilê'm kanîka dorbiqicî
Qicî ´l ser qicî xericî
Xazîya min ji wî'evdî hatî
Bi çe'vê xu dîtî bi dilê xu zewicî

105.

Ez nexaş im ta digirim
Ez girara bêkundur im
Roj bi rojê xirabtir im
Qenca ez dixastim xiraba ez ´j xu ra birim

106.

Te kurapê min î kero

Malê heft qirala xu da sero

Te çima sala îsal qîza destê xu da dero

107.

Te qîzapa min kotîyê

Rişyê şarê bade bide ber kofîyê

Sala îsal tu herî ser dar'iberê hêwîtîyê

108.

Wele navê min Nîgar e

Bile navê min Nîgar e

Sing i berê min kanîka avasar e

Mêrkê Mûskî[28] sala îsal, mi ra derket bêîtbar

109.

Keleşgewra min derkete derê malê genim tev da

Qîcik ´l xu kir gevez ´d ber da

Keleşgewra ´m bi awirê çe'va, bi qinyatê dila

Bi hukmê destê xu xeber da

110.

Min go Hacê the go Hacê

Dengê ´m kete koka dara qerexacê

Ew kesê ara min û Haca min da pîs xeber de

Belkî Xudê bikuje kurê wî yî ber zewacê

[28] Mûskî: Navê'eşîrekîye. Girêdayîkonfederasyona Milîye.

111.

Ez dîwarê Taştîngolê tu dîwarê Taştîngolê

Ez ê bûme xezal ketme çolê

Heçî kesê ara min û delalya dilê min da pîs xeber de

Di'ayê min ew e belkî here ser dixtorê Îstenbolê

112.

Min dîwarê'eyno xeyno

Gede çûye qirşê beyno

Bira were qe jî neyno

113.

Birre pezê sorêcîn e

Nêryê'egal pêşyê çûne

Cihabke nebxêrê min ra hatye

Gotye xayê qewliqirara poşman bûne

114.

Min dîwarê qermê reşo

Te dîwarê qermê reşo

Cihab hatye law nexaşo

Ez ê heram bikim hina desta, kilê reşo

115.

Hîv derketye danzde rima

Şewqê xu da oda mala bavê min li misîna li gumguma

Êtîmê gede li min xeyîdye nizam çima

116.

Kanî hene li milê ne

Serê kanya binê kanya, bin melekê mewtê lê ne

Heçî tiştê têne serê mêriv

Hemû yazî muqederê di Xudê ne

117.

Min dîwarê Qizilqangê

Te diwarê Qizilqangê

Ez ê bûme xezal ketme zangê

Xudê dêwbavê min ra qebûl neke, qe hilnede

Nehîştin ez i êtîmê gede bikin xewa vê berbangê

118.

Tu kurapo kurê apê

Tu sîyar nebe hêşîn bozê, dêl ser kopê

Hêwyê neyne ser qîzapê

119.

Hey dotmamê lazim lazim

Ez du tişta 'I te dixwazim

Kil û kildank cotek bazin

120.

Min dîwarê Çilkaniya

Te dîwarê Çilkaniya

Bakî lê da gul hejiya


Qe kesî dewr i zemana da nedîtye

Keleşgewra min here ser cotê hêwya

121.

Baqek gulê wan çirîşan
Ez ê têxme nav desmala nav hevirmîşa
Ez ê bişînme welatê xerîbyê
Nav eskera nav çawûşa

PÊVEK 2




**Nexşeya Navçeyên Bajarê Wanê**

**FERHENGOK**

ajeqor: kesêbejnkinik.

bazin: bazing, xeleka ji bo xemlê dikeve zendan.

bejî: dêm, cihê bêav.

ber: kevir.

berbû: berbûk.

bergîr: hespa ji cehniyê mezintir û ji mi'înê biçûktir.

bergîz: kincek e, li ser cilan de tê xwekirin.

berîbest: çol û çolistan.

berkirin: li xwe kirin.

berrî: çol e.

bertîl: ruşwet.

berzebûn: wendabûn.

bişkuj: bişkoj, bişkok, kespik.

çê: baş, rind, sipehî.

çiftexas: cureyekê perçeyê biha ye.

çît: cureyekî perçe ye.

darberrî: nave cureyekî daran e, bi tirkî dibêjinê palamut ağacı.

darmazî: nave cureyekî daran e, bi tirkî dibêjinê meşe ağacı.

dartûyîn: navê dara tûyê ye, bi tirkî dibêjinê dut ağacı.

deboyê kodê: amûra pîvana genim.

delav: cihê heri tenik yê çem e.

den: navê boyaxeke rîs e.

dengiz: kesê gelek dewlemend.

dêris: xirabe, kavil.

dîza denê: dîzika mezin e ku tê de rîs tê boyaxkirin.

dormandor: dorhêl, çarheqal.

etles: cureyekî cilan e, pirr biqîmet e.

fena: mîna, wek, nola, notila.

fend: hîle, fêl.

feqîr: xizan, kasib.

fîstan: dêreyê ku pêşiya wî vekirî ye.

gevez: sor, sorsipî.

gorî: qurban.

gulî: koka keziyan.

gurrî: navê nexweşiyeke cermî ye.

hafî: wek, mîna, nola, notila.

heban: çantê şivanan e, ji çermê gîsk û berxan tê çêkirin.

heliz: navê pincarekê ye.

heyam: wext, serdem.

heznî: şînî.

hêsir: rondik.

hêsû: hember.

hindav: li vê derê.

hurdestêr: pêyr û mêzin.

kalmikaş: bewrar.

kavil: xirabe.

kemax: qorik, qalçe.

kêlik: kevirê ku datînine ser û binê merzêl.

kitan: cureyekî perçe ye, xavik.

kiyale: tûnê milet, tevahiya milet.

kobe: nexş û xemla dêreyan e.

kod: amûra pîvana genim û dexil e.

koremar: marê kor.

kulek: şibakeya li ser banê xaniyan.

lemelem: nermenerm, miremir.

lihêf: orxan.

mabeyn: navber.

madî: mehdî.

mehfîr: mehfûr, xalîçe.

merr: bêr.

mestî mestî: hêdî hêdî.

mexreb: êvar.

minjêwetrê: min got qey.

minminîk: perperok, sîsirk.
mixenetno: xayînno, pexîlno.
muhib: evîndar.
nola: mîna, wekî, notila.
pencik: tilî pêçên bebikan.
piltan: pincareke bi bêhn e.
posîde: melûl, perşikestî, dilşikestî.
qantir: heywaneke guhandar a barkêş e, ji cotbûna ker û hespê tê dinyayê.
qedîfe: mexmer.
qelaçî: kesê amanan qela dike, zer dike.
qerexac: dareke qalikê wê reş e.
qerewil: bekçî, nobedar.
qerm: perçeyê qeşayê, qalibê qeşayê.
qewliqirar: soz.
qeytan: qurdêle.
qijbelek: rengê sor, spi û reş e.
qîçik: navê zerê sayî ye.
qorixkirin: li hewla biharê herkes mêrga xwe qorix dike da ku tu kes neçêrîne.
qurs: pirça çivîkan e, dibiriqe.
qusêsî: serokê pezbiran.
reşmal: kon.
rextû fîşek: fîşegdank, bi çerm tê çêkirin.
sava: zaroka biçûk.
serhonaz: serokê paleyan.
sorêcîn: sorê piştepez.
sortarî: sorê girtî.
şaneşîn: balqon, malê giregire, bernig.
şima: şimaya hingivîn.
temboli: tûncik, kakul, tûnik.
teresbav: qîza kerê.
terşitalan: birra pêz.
teyrê serberatî: teyrekî koçber e ku diçe welatên germ û venagere.

teyrtawis: teyrê tawis.

tifal: zarok.

tîreme'r: marê ji mûmarê mezintir û ji marê biçûktir.

tixik: qeşmer.

tûncik: çûncik, birka por a tê ser netikê/'eniyê.

xalet: xaltî, xaltîk.

xericîn: jê derketin.

xiftan: navê cilekî jinan e, dişibe cubeyê melayan.

xirifîn: ji rê derketin.

xizêm: xizme.

xunav: xûs.

xubixutî: zewaca navmalbatî.

zegerek: navê pincarekêye, dikine birîna guleyan da ku pak bibe.

## KURTEJIYAN

Mehmet YILDIRIMÇAKAR, di 2yê Pûşpera 1987an de li Wanê hat dinyayê. Dibistana seretayî, ya navîn û lîse li Wanê qedand. Di sala 2009an li Zanîngeha Marmarayê Fakulteya Fen û Edebiyatê Beşa Matematîkê mezûn bû. Heman salê li Zanîngeha Maltepeyê, Enstîtûya Zanistên Fenê, Şaxa Makezanista Perwerdehiya Matematikê dest bi Mastirê kir û ev bername di sala 2010an de bi awayekî serkeftî xilas kir. Di sala 2013yan de li Zanîngeha Mûş Alparslanê, Enstîtûya Zanistên Civakî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî dest bi Mastirê kir û niha di asta teznivîsînê de ye. Di sala 2012yan pê ve ye li Wezareta Malbat û Polîtîkayên Civakî weke peywirdar dixebite. Zewicî ye û zarokekî wî heye.

# ÖZGEÇMİŞ

Mehmet YILDIRIMÇAKAR, 2 Haziran 1987 yılında Van'da dünyaya geldi. İlköğretim ve Liseyi Van'da bitirdi. 2009 yılında Marmara Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Matematik Bölümünden mezun oldu. Aynı yıl Maltepe Üniversitesi, Fen Bilimleri Enstitüsü, Matematik Eğitimi Anabilim Dalında Yüksek Lisansa başladı ve bu programdan 2010 yılında başarılı bir şekilde mezun oldu. 2013 yılında Muş Alparslan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında Yüksek Lisansa başladı ve şuan tez yazım aşamasındadır. 2012 yılından beridir Aile ve Sosyal Politikalar Bakanlığında memur olarak çalışıyor. Evli ve bir çocuk babasıdır.